



Arman

Hejmara taybetî

Dawerê rojnameya pêşî ya Kurdî
Miqdad Mîthed Bedîrxan

Hejmar, No: 4

Çiriya Pêşîn-October 1995

Buha-Price: 40 000 TL 20 SKR 4 DM



M. Emîn Bozarşan
"Mem û Zîn
xazîneyek e"
rûpel: 6-13



Mûrad Cıwan
Bîr û baweriyên
Ehmedê Xanî yên
felsefî û tesewufî
rûpel: 4-20



Îzedîn M. Resûl
"Dewra Xanî
dewra zêrîn e"
rûpel: 21-22



Prof. Joyce Blau
Jiyan û berhemên
Ehmedê Xanî
rûpel: 23-25



300 saliya "Mem û Zînê" pîroz be!

Çima yekîtiya Kurdan tune?

Dîtinên hin siyasetvan û rewşenbîrên Kurdan

rûpel: 3-12



Ehmedê Xanî

1651-1706

Ehmedê Xanî di 1651'an de li hêla Hekariyê li gundê Xanê hatîye dinê.

Wî li Cizîrê xwendina xwe temam kirîye, paşê çûye Beyazîdê, li wê derê medreseyek vekirîye û dest bi dersdayînê kirîye.

Ehmedê Xanî di 1706'an de li Beyazîdê mirîye. Gora wî jî her di wê medresa wî de ye ku îro li Beyazîdê wek ziyaretgehekê tê nasîn.

Ehmedê Xanî bi Kurdî, Farisî, Erebî û Tirkî baş zanibûye. Wî gelek kitêb nivîsîne. Kitêbên wî yên Kurdî ev in:

- 1-Mem û Zîn
2-Eqîda Îmanê
3-Nûbara Biçûkan (Ferheng bi Kurdî û Erebî)
4-Eqîda Îslamê (Erkanê Îslamê)

Ev kitêbên wî jî ji bilî çapên destnivîsî, ji sedsala 18'an û vir de heta îro gelek caran hatine çapkirin.

Di kitêba A. Jaba de Ehmedê Xanî

Şairê pêncê jî Ehmedê Xanî ye,

eslê wî jî ji taifeya Hekariyan ji eşîreta Xanîyan e, bi xwe hatiye Bazîdê. Di tarîxa hezarî da tewetun kirîye, di zimanê Kurmancî da Mem û Zîn nav kitêbek aşiq me'sûqan gotiye û kitêbek luxatê jî bi Kurmancî û Erebî gotiye, navê (kitêbê)Nûbihar e û zarokê di Kurdistanê hemû di piştî Qur'anê dixûnin û zehf jî xezaliyan û eş'aran û beyt bi zimanê Kurmancî gotiye û di zimanê Erebî û Farisî û Tirkî jî dîsan xezeliyat û eş'aran û ebyat zehf gotiye û di ulûmê funûnan jî qewî mahir û sahib îrfan e û ji şûerayêd Kurdistanê hemûyan jî meşhûr û faîq e, belkî ji hemû şûeran meqbûl û memduh e û di hezar û şêst û sê da jî merhûm bûye û di nêv Bazîdê da mizgevtêk jî bi navê xwe bîna kirîye û bi xwe jî li kenarê mizgevtê medfûn e, We Allah el alem.

M. Alexandre Jaba, recueil de Notices et Recits Kourdes..1860, St. Petersburg, r. 15

Berhemên Ehmedê Xanî

Mem û Zîn

1898-Mem û Zîn, (wek tefrîqa di rojname Kurdistan, 1898-1902, de hatiye çapkirin)

1919-Mem û Zîn, Îstenbol, Ji neşriyata Jîn, hejmar: 1, Necmî İstikbal Matbaası, 1335 Hicrî, 1337 Rûmî, (1919 Mîladi), 137 rûpel, Kurmancî bi herfên erebî, ebada wê: 15x23 cm., (pêşgotin: Hemze(yê Muksî), li gor ku têde hatiye nivîsîn ev çap jî ber nusxeya destxetî ya Ezîz kurê Şêr Mam Zêdî hatiye girtin ku di 1165'ê Zayînî de hatiye nivîsîn ku ew jî dike 1751)

1932-Mem û Zîn, di kovara Hawarê (1932-1943) de wek tefrîqa bi herfên latînî hatiye çapkirin.

1947-Mem û Zîn, 1947, Weşanên Jîn, hejmar: 2, Heleb, Çapxana Aras, Kurmancî bi herfên latînî, yê ku çapkirîye: Beşîr Hesên Haşimî, 139 rûpel, ebada wê: 14x22 cm.

1954-Mem û Zîn, Hewlêr, 1954, 193 rûpel, buha: 200 filis, ebada wê: 14x21 cm. bi herfên erebî, di her rûpelekê de ferhengoka gotinên giran jî hatiye amadekirin.

1958-Mem û Zîn, 1958, Şam, bi herfên erebî.

1960-Mem û Zîn, "Mem û Zînî Xanî Hejar Kirduwe be Mukriyanî", 1960, Bexdad, Çapxana Necah, 118 rûpel, Soranî bi herfên erebî, ebada wê: 15x22 cm. (Mem û Zîna Ehmedê Xanî ye ku Hejar ji Kurmancî dîsa wek helbestkî wergerandiye ser zaravayê Soranî, Hesên Qizilcî jê re pêşgotinek nivîsiye, her weha tê de li gel pêşgotina Hejar, çend wêne jî hene).

1962-Mem û Zîn, Moskova, 1962, amadekar û wergera rûsî:

M. B. Rûdenko, 197 r. (kurdî, bi herfên erebî)+234 r. (rûsî).

1968-Mem û Zîn, çapa sêyem, Hewlêr, 1968, yê ku çapkirîye: Gîwî Mukriyanî, 224 rûpel, ebada wê: 14x21 cm., buha: 250 Filis, bi herfên erebî

1968-Mem û Zîn, Türkçesi: M. Emin Bozarslan, Gün Yayınları, 1968, İstanbul, 544 r. Kurmancî-Tirkî, bi herfên latînî, ebada wê: 13x20 cm, buha: 20 Lîre.

1975-Mem û Zîn, Çapa duwem, Koral Yayınları, 1975, İstanbul, Türkçesi: M. Emin Bozarslan, 583 rûpel, Kurmancî-Tirkî, bi herfên latînî, ebada wê: 13x19 cm.

1988-Mem û Zîn, Navenda Weşanên Ferheng û Edeba Kurdî, 1988, Ürmîye, yê ku amadekirîye: Perwîz Cihanî

1989-Mem û Zîn, Amadekirin û perawêznivîsîn: Hejar, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Parisê, Paris, 1989, 370+16 (pêşgotin) r., Kurmancî- Soranî bi herfên Erebî, ebada wê: 17x24 cm.

1995-Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latînî û Kurdiya xwerû: M. Emin Bozarslan, Weşanxana Deng, 1995, Uppsala/Swêd, 703 r. (110 r. pêşgotin), Kurmancî, bi herfên Latînî. Ebada wê: 17x25 cm.

Nûbihar

1903-Nûbar, 32 rûpel, destnivîs, binêre: A. Von Le Coq; Kurdische Texte, 1903, Berlin. Di vê kitêbê de her weha Mewluda Melayê Batê, Eqîda Îmanê û Eqîda Îslamê (Erkanî Îslam, Beyana Îmanê) ya Ehmedê Xanî jî hene.

1955-Nûbar, bi destxeta Yusuf Ebdullah hatiye nivîsîn, 1955, Şam, 31 rûpel, Kurmancî bi herfên erebî, ebada wê: 13x20 cm.

1986-Nûbar, Wergera ji herfên Erebî bo Latînî: Z. Kaya, Weşanên Roja Nû, Stockholm/Swêd, 1986, 76 r. (39 r. bi herfên Latînî+37 r. bi herfên Erebî), ebada wê: 13,5x20 cm.

0000(?) -Nûbihar, Kurmancî bi herfên erebî, 37 r., ciyê çap û tarîxê li ser tune ye, ebada wê: 16,5x24 cm. (Ev nusxe pîsma min Hemenûrî li Diyarbekirê li Çarşîya Îspeyîyê jî dikana Mele Şefîqê Hezroyî kirrîye).

Eqîda Îmanê û Eqîda Îslamê

1903-Eqîda Îmanê, binêre: A. Von Le Coq, Kurdische Texte, 1903, Berlin.


1918-Eqîda Îmanê, 1338 (1918), Îstenbol, Ewqafî İslamiye, Kurmancî, bi herfên erebî, 6 r., ebada wê: 14x20 cm.

1357-Eqîda Îmanê, Dar ul Teb'et ul Erebiye, 15 Zulqa'ede 1357, Şam, 6 rûpel, Kurmancî bi herfên erebî, ebada wê: 14x19 cm.

(Ev kitêb jî alî yekî bi navê Mihemmed Kamil li gel Nehcul Enam a Mela Xelîlê Siertî pêkve hatiye nivîsîn û çapkirin, kitêbê giş 30 rûpele, 24 rûpel jê Nehcul Enam e, 6 rûpel jî Eqîda Îmanê ye).

1903-Eqîda Îslamê (Erkanî Îslam û Erkanê Îman), binêre: A. Von Le Coq, Kurdische Texte, 1903, Berlin


Amadekar: Mahmûd Pakdemîr



Mem û Zîn, 1919, İstanbul




Eqîda Îslamê, 1903, Berlin



Mem û Zîn, 1989, Paris



Mem û Zîn, 1968, İstanbul



Nûbar, 1903, Berlin



Eqîda Îmanê, 1357, Şam

Armanç

Rojnameya Kurdî ya Mehane & Aylîk Kürtçe Gazete

Li ser navê Weşanxaneyê Çarçirayê Xwedî û berpirsiyar (Çarçira Basın ve Yayıncılık Ltd. Şti. adına Sahibi ve Yazışleri Müdürü): Nesih Çılgin

Redaktorê Berpirsiyar: Remzî Kerîm

Redaksiyon: Mumtaz Aydın, Faris Can, Mûrad Civan, Nihat Elî

Ehmed Huseynî, Yakûp Karademîr, Mahmûd Lewendî, Hesên Mizgîn, Emîn Narozî

Berpirsiyarê beşê Dimilî: Malmîsanîj

Şertên Abonetiyê

Abonetiya Salekê: Tirkîye: 400.000 TL, Skandinaviya: 250 SKR, Ewrûpa: 60 DM, Derveyî Ewrûpayê: 50 \$

Anons / İlan: Niv-rûpel 5.000 000 TL, 2500 SKR, 500 DM

Hesab No: 0017880 - 6 / BU6 / 01, Yakup Karademir, Akbank T.A.Ş, 142 Aksaray-Ist.

Adres: Guraba Huseyinağa Mah. Dağarcık Sok. Mehmet Han No: 327B, D:23, Aksaray-Istanbul Türkiye

Tel-Faks: 212-6312515

Adresa Ewrûpayê: Box: 152 16, 161 15 Bromma, Sweden


Tel: +46-8-803135, Faks: +46-8-801825

Hesabê Ewrûpayê: Postgiro: 4972255-6, Sweden

Hesabê ji bo aboneyên Almaniyayê: M. Ali Karaaslan, Dresdner Bank, Konto: 8 838 847 00, BLZ: 513 800 40



Ehmedê Xanî û Mem û Zîn di berhemên biyanî de



Gisbert Jänicke ji dibêje, mîna dastana ya Farisî Werqa û Gulşah ku ji aliyê Eyyûqî ve hatiye nivîsîn û mîna ya Wîs û Ramîn ku Fexreddîn Azad Curcanî ew nivîsiye, di nav gel de ji dema nivîsandina xwe pir kevntir e û gelek tê hizkirin.

Nivîsandina bi zimanên biyanî û Mem û Zîn

"Mem û Zîn" hê di sedsala 17'an [1675] de ji aliyê Şa'irê Kurd Ehmedê Xanî ve hatiye nivîsîn. Digel zoriya wê demê ya xweragirtina li ber zimanên Erebi û Farisî ku li herêmê zimanên edebî yê bi pêşketî bûn jî dîsa Ehmed (1650-1-1706-7) tekoşîneke xurt daye ku Kurdî bibe zimanê nivîskî. Wî ji bo venivîsîn û nîşandana dastanên kurdî yê gelêrî û kevn gelek wextê xwe daye. Him Ehmedê Xanî û him jî gelek çîrokbêjên piştî wî hemuyan meseleya xwe li ser bingehê dastana kevn a Memê Alan ava kirine ku rehên wê bi hindikayî xwe berdîdan dawiya salên 1300'î, ji xwe piştî wan jî serpehatiya Memê Alan bi devikî jiyaye û heya roja îro jî hatiye.

Ehmedê Xanî ne nivîserê pêşî ye ku bi zimanê Kurdî nivîsandiye, lê ji ber xatirê Mem û Zîn ew yê herî navdar û jêhizkirî ye. Gelek ji wan nivîsên ku berî wî hatine nivîsîn yan nehatine parastin yan jî ne wek eslê xwe mane, ewên ku piştê li ber wan hatine nivîsîn jî li ser daxwaza dem û viyana rewşa hingê hatine guhartin. Helbestvanê pêşî ji yê girîng ku diwana wî ya softwarî hatiye hefidandin û gihaye destê me Şêx Ehmedê Mîşanî (1407-81) ye ku bi navê Melayê Cizîrî jî tê naskirin [rastiya nasnavê wî Nîşanî ye û ya dema jiyana wî jî 1570-1640 e E. N.]. Îsmailê

Beyazîdî (1654-1709) jî ku di dema Ehmedê Xanî de jiyaye û şagirtiya wî jî kiriye bi ferhenga xwe ya Kurdî-Erebî-Farisî ya helbestkî ku bi navê "Gulzar", baxçeyê gulan, bi nav kiriye, hatiye nasîn.

"Di nav wêjeya Kurdî de ji mêj ve û heyânî ku bigihîje ve dema me jî çî yê olî û çî jî yê dinyewî bin gelek berhemên edebî yê hêja derketine. Ji xwe divê em qet jibîr nekin ku ji ber hin mercên dîrokî û siyasî gelek nivîserên Kurd berhemên xwe bi zimanê Erebi, Farisî û Tirkî nivîsandin. Ew dîroknasên Kurd ên navdar, mîna İbn el-Esîrê Cizîrî, İbn Xellikanê Erbilî û Ebul-Fida'ê ku ji malbata Selaheddîne Eyyûbî ye, hemîyan (dinavbera 1100-1200 de) bi zimanê Erebi nivîsandin. Berhema mezin ya li ser dîroka Kurdan Şerefname bi xwe jî bi zimanê Farisî hatiye nivîsîn. Ji vê dema me jî ew salixdarê mezin ê jiyana û mirina Kurdan û kilaşîkvanê wêjeya nûjen a Tirkî ku nav û dengê wî li cihanê belabûye, Yaşar Kemalê Kurd dikare bê dayîn." Mirov dikare vanên han jî li wan kesên navdar ku ne bi zimanê xwe nivîsandinê zêde bike: İbn 'Hacib yek ji hîmdarê rêzimana Erebi ye, İbn Sela'h, İbn Sîrîn danerê Xewnameyê, Molla Goranî, İbrahim İbn Hasan el-Kuranî (Guranî), xwediyê Tenwîr el-Qulûbê Muhemmed Emîn el-Kurdî, Mele 'Ebdullah beytûşî, İbn el-'Hacc, Ebûbekrê nivîserê Mele Camî (navê kitêbeke rêzê ye) xwediyê kitêba El-E'lam Zerqelî, helbestvanê Erebi yê navdar Ehmed Şewqî, şa'irê Erebi Ressaî, Muhemmed Kurd Elî, Me'hmûd 'Eqqad, Me'hmûd Teymûr, 'Ayşe Teymûr û gelekî din ku pirên wan bi zimanê Erebi nivîsandin, ji

bilî wanên ku bi Tirkî, Farisî û gelek zimanên di nivîsîna û dinivîsînê jî.

(Bazil Nikitin) Firdewsiyê Kurdan Ehmedê Xanî

Bazil Nikitin, Ehmedê Xanî (1651-1706-7) di tayê Firdewsiyê Îranî de dibîne û berhema wî ya Mem û Zînê jî ji aliyê helwestên neteweyî ve mîna Şehnemeya Firdewsî û ji hêla honana helbestan ve jî hempayê Mesneviya Celaleddîne Rûmî qebûl dike.

"Hê di destpêka sedsala 11'an de Elî Herîrî li Şemîna³ bi Kurdî dinivîsand. Diwana wî, bi awayê destnivîsî, gihaye vê ser dema me. Ji dema wî û vir ve medeke dirêj, ta navbera sedsalên 12 û 15'an, em dibînin ku helbestvanên kurd li pey hev derketine holê. Ev şaxvedana han rastî wê pêla bilind a derebegiyê ku di pêşketina neteweyîtiya Kurdan de roleke girîng leyztîye, hatiye. Di nav wan Şa'iran de yê girîng ku ji navên wan pîr hatiye qalkirin evên han in: Mele Ehmedê Cizîrî [Melayê Cizîrî, 1570-1640] yê ku bi şirove û hûnana lîriyên xwe pesindana bi bêhempayîyê heq kiriye, piştê yê ku bi nasnavê Mim-Hc [Mîm û 'Hê] nivîsandiye, Feqiyê Teyran [1590-1660] e û dawî jî Meleyê Bateyî yê Hekarî tê.

Ev Şa'ir hemû ji bo derketina helbestvanê mezin ê ku em dikarin bi navê Firdewsiyê Kurdan bi nav bikin, bûne bingeh û jêzemîn. Me ev nasnav li Ehmedê Xanî ku navê wî di behsa pêla amadehiya hestên neteweyî yê Kurdan de derbas bû, danî. Çiku hazirkirina hîssên netewe-

300 saliya "Mem û Zînê"

Ji pêşgotina Gisbert Jäncke ya li ser Mem Och Zîn (Mem û Zînê)

Ev diramek e ku di sala 1975'an de di radiyoya Fînlândiyayê de bi Sewêdî hatiye weşandin. Ew di sala 1981'ê de ji aliyê weşanxaneyê Revolt Förlaget ve wek piyeseke hatiye çap kirin û di 1992'an de jî weşanxaneyê Sara Förlaget li Stokholmê ew car din çap kiriye. Ev piyasa me li ser bingehê dastana navdar ya Memê Alan ku di sala 1955'an de li Ermenîstanê ji aliyê çîrokbêjê bi nav û deng Etarê Çaro ve hatiye gotin, piştê jî hêla


Heciyê Cindî ve hatiye nivîsîn û di sala 1962'an de li Moskowayê bi navê Dastan û Çîrokbêjê ye, çimkî niha, di vê dema têkçûna eşîretiyê de jî, dîsa ew eşîra milan xwediyê hêzeke xurt e." Yanî ji ber ku hinek nav û cihên di dastanê de tên niha jî hene nexwe bûyîna vê serpehatiyê jî ne karê fantazyên çîrokbêjê ye, ew eseyî qewimîye.

"Çîroka herdu dilketiyên bextreş Mem û Zînê digihîje rêza wan hûnraweyên evîni yê serdema navîn li rojhilatê; mîna dastana Leyla û Mecnûn a Nîzamiyê de Kurd ku te'sîra xwe him daye ser edebiyata evîndarî ya rojhilat û ne raste rast be jî daye ser wêjeya rojava ya evîndariya romantîkî ya hayânî niha jî . . .". Herweha nivîserê me Mem û Zînê bi dastana gelêrî ya Xusro û Şîrîn ku ew jî bi qelma Nîzamiyê hatiye nivîsîn û bi ya Ferhad û Şîrîn jî ku piştê jî ya Xusro û Şîrîn hatiye qetandin û bûye dastaneke serbixwe, dişibihîne. Çawa ku di destpêka dastana Mem û Zînê de jî him qala serpehatiya Leyla û Mecnûn û him jî bahsa bûyera Ferhad û Şîrîn hatiye kirin. Bêguman Mem û Zîn, çawa ku

Herweha di dawiya dastanê de jî gava qala malbata Mîr Zeydîn tê kirin dibêje ku, "Ew

ji eşîra Milan e" û ev yek jî dide eseyî kirin ku ew dastan ne fentazyeye çîrokbêjê ye, çimkî niha, di vê dema têkçûna eşîretiyê de jî, dîsa ew eşîra milan xwediyê hêzeke xurt e." Yanî ji ber ku hinek nav û cihên di dastanê de tên niha jî hene nexwe bûyîna vê serpehatiyê jî ne karê fantazyên çîrokbêjê ye, ew eseyî qewimîye.

"Çîroka herdu dilketiyên bextreş Mem û Zînê digihîje rêza wan hûnraweyên evîni yê serdema navîn li rojhilatê; mîna dastana Leyla û Mecnûn a Nîzamiyê de Kurd ku te'sîra xwe him daye ser edebiyata evîndarî ya rojhilat û ne raste rast be jî daye ser wêjeya rojava ya evîndariya romantîkî ya hayânî niha jî . . .". Herweha nivîserê me Mem û Zînê bi dastana gelêrî ya Xusro û Şîrîn ku ew jî bi qelma Nîzamiyê hatiye nivîsîn û bi ya Ferhad û Şîrîn jî ku piştê jî ya Xusro û Şîrîn hatiye qetandin û bûye dastaneke serbixwe, dişibihîne. Çawa ku di destpêka dastana Mem û Zînê de jî him qala serpehatiya Leyla û Mecnûn û him jî bahsa bûyera Ferhad û Şîrîn hatiye kirin. Bêguman Mem û Zîn, çawa ku



Nacî Kutlay
(Nivîskar)

Belê şa'ir û welatparêzê mezin Ehmedê Xanî wek ronakbîrekî, berî sêsed salan, bi nalîn daxwaziya yekîtiyê kiriye. Lê belê Kurd dîsa jî perçe perçe ne, dibe

"Divê şertên yekîtiyê hebin"

ku ji dema Ehmedê Xanî zêdetir ji hev dûr in. Ev gîrêkeka dîrokî û civakî ye. Di nav niv-rûpelê A4 de em nikarin li ser vî derdê sereke bisekin. Ev xebateka taybetî dixwaze û hewcedariya herî mezin jî ev e.

Gerek em bînin bîra xwe, ji dema Ehmedê Xanî heta nuha pir tişt hatin guhartin lê belê hinek tişt ku bi rengê din û bi tehrekî din dîsa dom dikin. Ya ku dixwazim bibêjim, eşîrtî ye. D nav Kurdan de endustrî û bazirganiya neteweyî pir pêş neçû-

ye. Mora eşîrtiyê hîn li ser jiyana Kurdistanê ye. Civatên ku di hêla aşîrtiyê de ne û nebûne "xelkekî" taybetî jî wê civatê yekîti çênabe.

Di tebîeta jiyana eşîrtiyê de ci-hêbûn heye, yekîti tune ye. Dema ku eşîr tê bîra merivan, pê re dijîtî û belavbûn tê pêş çavên me. Ev kar proseseke dirêj dixwaze. Ev dem dibe ku hîn hewceyî gelek salan e.

Demê Ehmedê Xanî û nuha, di vî warî de pir guhartin nîşan nade. Kurd her di jiyana eşîrtiyê

de ne. Li bajaran xwendin û ronakbîriyê dest pê kiriye, lê hîn jî "mêjî" û "dîtinên" feodalîyê tesîra xwe wînda nekiriye. Dibe ku di nav jiyana de meriv vê nuxteyê ferq nake, lê rastî wisa ye.

Exmedê Xanî dinale, lê şert û şîrûtên civakî bi xwestinan tenê nayên cî. Divê şertên yekîtiyê hebin. eşîr û mêjiyê eşîrtiyê wilo ye. Meriv xemgîn dibe, lê belê dîrok û jiyana ku mamosteyê herî mezin e, ew demê de bê, eşîrtî de ji holê rabe, Kurd dê bibin civat

û neteweyê modern. Yekîti tiştê modern e, ji kevnerabûnê hez nake û nayê cî. Gerek meriv di vî warî de bi xîret xebatê bike, lê gelek tişt jî ne di destê me de ne. Koçkirin, bazirganî, dayîn û stendin û xebatên çandî û siyasî demek dirêj dixwaze.

Bila kes xemgîn nebe, ev tiştêkî ilmî, dîrokî û civakî ye, xwestin faktorek e, lê ne her tişt e. Ehmedê Xanî xwestineke welatparêzî beyan kiriye, ev hêviyêke dilsozî û giranbûya ye. Divê meriv vê daxwaz û hêviyê hertim geş û germ bike.



yî bi awayê herî baş di gotinên helbestkî yê berhemên wî de gihane pêplûka herî bilind. Ehmedê Xanî ku di sala 1592'an de li Hekariyê hatiye dinê û di 1652'an de jî li Beyazîdê alîjiyan bûye⁴, ne tenê aferinendeyê dastana Mem û Zînê ye ku me di gelek cihan de navê wê bihûrand, lê herweha ew ewê ku pirr deverên berhema wî digihîjin tayê hin beşên bêhempa yê dîwana Celaleddînê Rûmî (hîmdarê terîketa derwêşî ya Konyayê û sirûşa tesewwufî) û li nik xwendevanên Kurdan jî yek ji helbestvanên lîrî yê pêşiyê. Ehmedê Xanî jî xwe re wek mînak berhema Celaleddînê rûmî girtiye; wek ku tê zanîn

çawa berhema wî şai'rê Faris a lîrî bi lîriya gelên Asya piçûk re tekel bûye wusa ya Xanî jî bi serkaniyên wan nîşan û dirûvên lîriya xweş ku jiyane didin folklorê Kurdî, hatiye xwedî kirin. Di destên me de hinek beş ji berhemên Xanî yê girêdayî bi toeriya hunera helbestê ve hene. Ya herî taybetî jî ew ferhenaga pêşî û bi tenê ye, ku jî aliyê wî ve li ser kafiye û kêşeya helbesta kurdî hatiye nivîsîn⁵.

Xebata wî ya hertim û bêrawestan a li ser ziman, zanîna wî ya pirr, Kultura wî ya helbestê ya bêmunaqeşe, herweha ew afirandiyên wî yê ku hişk û saxlem bi ziman ve girêdayî ne, ew nîgarî û salixên ku li ser gotinên pêşiyên ên xwediyê xuyekî dilînî û semîmî, hatine avakirin, evên han tev bûne sedem ku Ehmedê Xanî gihîştîye pêplûka helbestvanê Kurdan ê herî jêhizkirî û jî ber vê yekê jî gelek bizarîkarê (teqlîdkarê) wî derketine holê. Ji nav wan wek nimûne em dikarin navê Îsmailê Beyazîdî (1654-1709), Şeref Xanê Colemergî (1682-1748) û Murad Xanê Beyazîdî (1736-1678) bi-

din. Bi rastî ev nivîskar giş û gelek ji helbestvanên hevdem jî çî ji aliyê ziman ve be û çî jî hêla awa û naverokê ve be her edet û hîwuşiyên dibistana Ehmedê Xanî ajotîne⁶.

(M. van Bruinessen)

Axa, Şêx û Dewlet

"Neteweyîtiya Kurdan bi awayekî xurt di nav hêzên civakî de, bûyereke gelekî nû ye. Ev nayê wê maneyê ku berê di nav kurdan de bîr û baweriyên netewî qet çênebûne; bêguman cudahiyên rêzimanî bi zimanên di re eşkere û diyar in, herweha nîşanên ku Kurd bi xwe, xwe jî Turk, Ereb û Eceman cuda dibînin hê zahf ji mêj ve hebûne (ji xwe ne hewce ye ku qala cînarên wan yê ne misilman bêne kirin), lê piştî helbestvanê Kurd Ehmedê Xanî (1651-1706-7) bi navê "Derdê Me" pêşgotinekê li ser dastana xwe ya Mem û Zînê nivîsandiye, di wir de ew gilî û gazin ji wê belavbûna (belawelahiya) Kurdan ku bûye sedem ji bo ketina wan a bin destê Osmanî, Sefewî, yan jî hinekî din, dike:

"Ger dê hebûya me tîrîfaqek
Vêkra bikira me inçiyadek
Rom û Ereb û Ecem tamamî
Hem'yan ji me ra dikir xulamî
Tekmîl-i dikir me dîn û dewlet
Tehsil-i dikir me 'ilm û hikmet"⁷

Xanî berê jî hatiye û niha jî bi berfirihî tê xwendin, berhema Xanî jî aliyê mele û feqîyan ve beş bi beş bi sûretên Qur'anê re, bi Hafiz û S'ediye Şîrazî re dihat xwendin û jiber kirin. Mem û Zîn jî aliyê herkesî ve wek dastana Kurdan a neteweyî hatiye pejirandin, ji ber vê yekê jî gazinên Xanî di van çend sed salên dawî de bûne mîna ayîneya dilnîyên (hîssên) wan Kurdên xwenda. Ev dîtin û hesreta Xanî ya pêşketin û mezinatiya Kurdan, jî aliyê gelek ve hatiye parêvekirin û bawerîya ku tu carî Kurdan dijî neyarên xwe yekîtiyê xurt çênekirine na şaş e. Dijberiya serokeşîran hertim wusa kiriye ku ew dijî hinek Kurdan bi neyarên xwe yê ne Kurd re bûne yek û tu carî wan

M. M. van Bruinessen
AHGA, SHAIKH AND STATE
on the social and political organization of Kurdistan

li dijî nayerên xwe yekîtiyê weha bi rêk û pêk saz nekirîye, ji xwe gazin û lomiyên Xanî jî ji ber vê yekê tîn.

Hêviya Xanî bi xwe ew bû ku padîşahê ji nav Kurdan rabe; bes şahêkî xurt î zana dikaribû vê neyartiya nav Kurdan rake, wan ji bin destê dijmin rizgar bike, wan bi pêşxe û serfiraz bike. Lê em li cem Xanî, dîtinê wusa berbiçav ku tevgerê sernas û popûler raçavî me bike nabînin, ew tu dîtin û fikrên rêçenasî ji bo hizkirin û rastiya bi netewe re şanî me nade.

Ji bo desthilatdariyê û xirakirina vê belawelahiye serokekî xurt î şareza pêwîst e, lê heyani sala 1920'î jî kesên ku piştigiriya bizavên Kurdan kirin tev ji dîlva neteweyê xwe bi serokê xwe re, û jê re rasttir û saxlemtir bûne. Ji hingê ve neteweyîti bûye hêzeke zexmî girîng di nav Kurdan de, lê pirr mixab in ku tu carî hêvî û daxwazên millî zora bawerî û rastiya bi serokî re nebirine⁸.

(V. Minorsky)

Ansîklopediya Îslamê

"Di nav wan helbestvanên Kurd yê serkeftî de ku lîkolînerê hêja A. Jaba ew rêz kirine, nivîserê dastana neteweyê Kurd, Mem û Zînê, Ehmedê Xanî (1650-1-1706-7) ku li bajarê Beyazîdê dima, cihekî girîng digire. Ehmedê Xanî berhema xwe ya ku gelek caran hatiye weşandin li ser bingehê dastana navdar ya Memê Alan ku di sala 1942'an de ji aliyê R. Lescot ve li Beyrûdê û ji aliyê N. Zaza ve jî di sala 1957'an de li Şamê hatiye weşandin, avakiriye. Xanî ew li gor normên wêjeya klasîk, ji nû ve xeyal kiriye, li hev rast kiriye, hinek rewşa îslamî lê zêde kiriye û jî nûve car di ew hûnaye. Ev Hûnraweya ku ji 2655 malikên bi qafiye hatiye

hûnan li ser natewewîtiya Kurdan eyn mîna kitêbeke pîroz a du'ayan e.

Çawa ku ew dastana navdar a Memê Alan bi gelek awayên cihê hatiye gotin û bo gelek zimanan mîna Almanî, Firansî, Rûsî, Îngilîzî, Romanî, Ermenî, Erebî [û Swêdî] hatiye wergerandin wusa hûnraweya kilasîk a Mem û Zînê jî pirr caran li gelek cihên cuda mîna ku di 1920'î de li Îstanbulê, di 1947'an de li Helebê, di 1954'an de li Hewlêrê (Erbîlê), di sala 1960'î de digel wergera xwe ya mukriyanî ji aliyê Hejar ve li Bexdadê, di sala 1962'yan de digel wergera xwe ya Rûsî ji aliyê M. B. Rudenko ve li Moskowayê û di sala 1968'an de digel wergera xwe ya Tirkî ji aliyê M. E. Bozarlan ve di sala li Îstanbulê hatiye weşandin⁹.

Ji bilî hinek helbestên wî ku bi Erebî, Tirkî û Farişî hatine nivîsin Ehmedê Xanî nivîserê Ferhenga Erebî-Kurdî ya helbestkî, Nûbiharê ye jî ku cara pêşî di sala 1310/1892'an de ji aliyê Yûsuf Diyaeddîn ve bi navê el-Hediyye el-'Hemîdiyye fî el-Luxe el-Kurdiyye li Îstanbulê hatiye weşandin¹⁰. Herweha kopiyeke Nûbeharê jî ji aliyê von Le Cok ve di nav Kurdische Texte, Tekstên Kurdî, i, 1-47, de hatiye weşandin. Yek ji wan kesên ku di dibistana Xanî ya Beyazîdê de gihîştîye û li pey rêça wî çûye Îsmailê Beyazîdî (1654-1709) ye, wî li pey xwe gelek helbestên Kurdî û ferhengê Kurmançî-Erebî-Farişî bi navê Gulzar jî hiştîye¹¹.

Amadekar: Emîn Narozî

(1) Wêneya gorra van herdu evîndarên kezebşewîî ku di berhema Ebdulreqîb Yûsuf ya Şairên Klasik ên Kurd de hatiye weşandin ku tarîxeke heye li gor nivîskarî dibe sala koçkirina Mem û Zînê ku Ebdulreqîb bi xwe ew reqem wek 854/1451 daye ji lêbelê erke çavên min, min nexapînin ez bi xwe wê reqemê 844/1440, dibînim. (Abdulreqîb Yûsuf, Şairên Klasik ên Kurd, Jîna Nû, Uppsala, Sweden, 1988, Elî Şêr ji tîpên Erebî guhertiye yê Latinî, r. 103-108)

(2) Hejar, Şerha Dîwana Melayê Cizî-

rî, Sirûş, Tehran 1361, çap 1, pêşgotin r. 5-6. Martin van Bruinessen, lîkolîneke li ser Kurdish 'Ulema And their Indonesian Students, 1992, r. 205-223. Ehmed ibn Mele Muhemmed ez-Zivîngî, El-'Iqd el-Cewherî fî Şer'h Dîwan eş-Şeyx el-Cezerî, Metbe'et es-Sebah cihê çapê tune, 1987, çap 2, pêşgotin r. 11 (3) Ebd ul-Reqîb Yûsuf, dibêje ku, Major Soane Elî Hrîrî ji xelkê Şemîna Hekariyê hisab kiriye, lê li gor Yûsuf dîtina wî şaş e. (Abdulreqîb Yûsuf, Şairên Klasik ên Kurd, Jîna Nû, Uppsala/Swêd, 1988, wergera ji tîpên Erebî Elî Şêr, rûpel 19)

(4) Bêguman ew tarîxa ku li vir hatiye dayin şaş e, çimkî iro eseyî bûye ku Xaniyê Nemir di navbera salên 1950-51 û 1706-7'an de jîyaye. (binêr li pêşkêşîya ku ji aliyê M. E. Bozarlan ve li ser berhema Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Weşanxana Deng, Uppsala/Swêd, 1995, Wergêrê tîpên Latinî û Kurdiya xwerû M. Emîn Bozarlan, r. 9-12)

(5) Pir mixab in ku berhemeke Xanî ya wusa ger hebe jî, negihaye destê me, lê dibe ku şaşamiyek di vir de hebe û mebestê pê ferhenga yekemîn û tek ya helbestkî, Nûbihara Piçûkan be. Çiku wek tê zanîn, di serê her beşeke Nûbiharê de Xanî bi helbestkî hinek şîretan kiriye û piştî hem kêşeya wan û hem jî ya wê beşê li gor qaîdeyê wezna 'erûzê nivîsandiye.

(6) Ev çend rêz ji Berhema Bazil Nikîtin ya Kûrtler Sosyolojik ve tarihi inceleme, Özgürlük Yolu Yayınları n. p. (navê cihê çapê tune) 1986, wergêrê ji Firansî H. D. û A. S., r. 489-90, hatiye wergerandin.

(7) Kurdiya helbestê di dawîya berhema Bruinessen da bû min ew daye ber ya çapa 1995'an ku ji aliyê Bozarlan ve car din digel wergera Kurdiya xwerû li Uppsala hatiye çap kirin. Li jêrenota pênc'an binêre!

(8) Ev jî berhema M. M. van Bruinessen Agha Shakh And State on the social and political organization of Kurdistan, Des Namiddags, Uur Door, 1978, ji rûpelê 356,an hatiye wegerandin.

(9) Di sala 1995'an de tevî wergera xwe ya bi Kurdiya xwerû di sala ji aliyê M. E. Bozarlan ve li Uppsalayê hatiye çap kirin.

(10) Ta niha min wusa dizaniya ku ew berhema han (el-Hediyye el-'Hemîdiyye fî el-Luxe el-Kurdiyye) a Yûsuf Diyaeddîn bi xwe ye, lê va li vir weha dibêje, ez bawer im wê di vir de şaşiyek hebe.

(11) Ev çend rêz ji kitêba The Encyclopaedia of Islam, New Edition, prepared by a number of leading orientalis, teh University of Manchester, Manchester/England, 1982, Beşa Kurd û Kurdistanê, c. 5, r. 482'yan hatiye wergerandin.



Hemreş Reşo
(Serokê PDK-B)

Di pêknehatina yekîtiya Kurdan de bandora sedemên dîrokî, civakî, erdnîgarî, aborî, rêzanî û yê

"Divê berjewendiyên neteweyî li ser yê rêxistinî bin"

navneteweyî destekî pola dileyzin. Di navbera piraniya van sedeman de pêwendî û hevgerîdanên tîkûz û bandora wan ya li ser hev jî hene. Divê ev sedemana yek bi yek bi çakî werî naskirin ku merov bikaribe wan astengên li ber yekîtiyê rake û xwe ji wan şaşî û nexweşiyên biparêze. Lê ji ber ku we doza bersûvek niv-rûpelî kiriye, ezê hewilbidim dîtinên xwe di vê derbarê de bi gelemperî û kurtî pêşkeş bikim.

Wek tete zanîn di sedsala 10'an de li Kurdistanê gelek

Mîrekiyên Kurd (dewletên Kurd) hebûn. Ew dewletên bi ristika (sîstem) feodalî jî eşîr, an jî eşîran hatibûn saz kirin. Ji ber hişkpegiyê eşîrparêziyê Mîrekên Kurd nedikarin rastî û serdestiya hevûdin bipejirînin. Ciyê ku li hember û dijî neyaran hevkarîyê bikin bi vacayî wan ji bo qelskirina hevûdin piştigiriya neyaran dikirin. Ev bû ku di sedsala 16'an de hinek ji van mîrekên Kurd hevalbendiya Sefawîyan û yê din jî yê Osma-


niyan pejirandin. Bi vê kirinê jî mîrekên Kurd, bi destên xwe, hefsarên xwe dan destên herdû Keyserîyan û bûn sedema perçebûna gel û welatê xwe. Osmanî û Sefawîyan ew keysa gelek çak bikar anîn, bi berdana hev mîrekiyên Kurd ji berê bêtir qels kirin û ew ta sedsala 19'an yek bi yek di nav rûpelên dîrokê de wenda kirin. Piştî hilweşîna wan mîrekiyan, eşîrên ku bi wan ve girêdayî dûrî hev ketin. Şûna ristika feodalîyê ya eşîrtiyê

girt û di Kurdistanê de eşîrbaziyê hespa xwe bezand. Ku rêxistina eşîriyê malbatparêziyê jî di xwe de vedîşere, rastiyeke eşkere ye. Ger merov pêvajoya dîrokê dide ber çavan, ciyê ku gelê Kurd wek gelên din gavan ber pêş û yekîtiyê bavêje, ji mîrekiyan dewletên mezin saz bike û bigêhe yekîtiya xwe, bi vacayî her ku çûye parçeparçeyî bûye.

Dagirkerên Kurdistanê bi zanayî, çî ji wan hat kirin ku Kurdistan û gelê Kurd di warê civa-



Çend Şiirên Ehmedê Xanî



Ev çar şiirên Ehmedê Xanî cara pêşin di kovara "Mamostay Kurd" hejmar 11-12 sal, 1991'î de, bi tîpên Erebi hatine çap kirin. Min ew ji wir transkribe kirine. Li gor agahdariya Ferhad Shakely ku sernivîskarê kovarê ye; ev şiir bi alîkariya dostekî wî peyda bûne.

Di gel kitêbên "Tarîxa Qedîm Kurdistan" li Moskovayê 1986'an de di filmekî "Micmî'a Xizlayûd Şû'eraid Kurmanç e" de bi dest ketine. Temamiya şiirên Xanî 25 heb in û bi destnivîsara Mele Mehmûdê Bayezîdî ne. Lê temamiya kopîya film 70 rûpel destnivîsar e.

Min hewil da ku bi vê transkribsiyonê deng wenda nebin, her mîna dengên xwe bimînin. Ji bo gotinên zahmet yên Kurdî, Farisî û Erebi ferhengokek hatiye amedekirin. Maneya van gotinan ya ferhengî ye.

Ev şiirên heta nuha veşartî mane ji didin nîşandan, ku gelek berhemên din yên şaîr û nivîskarên Kurd veşartî mane.

Şefîk Kaya

"Serxweş û mest
û bengiyan"

Ey dil eger bi neqdî can
Cinsê giran behayê zulf
Dê bikirî bizan mecal
Cewher î canfidayê zulf
Her serî mû sazêkî
Cilwe diket bi nazêkî
'Aşiqî îşqbazekî
Bend diket be layê zulf
*Rûm û xedeng, Hindiyan
Xal û nîşanî xemriyan
Xencer û şîr û tîrkiyan
Ceng e li ber liwayê zulf
Tac û tumar û bûn perran
Le'il guhar û guheran
Serxoş û dîn û ebteran
Reqs e li ber humayê zulf
Law û rewal, rîspiyan
Mîr û wezîr û cindiyan
Serxoş û mest û bengiyan
Derd e ji macerayê zulf
Şêx û murid û salîkan
Şah û feqîr û malîkan
Çust û çeleng û çabûkan
Dil kete bendîpayê zulf
'Efa û mar û ejder e
Misk û zîbad û zenber e
Nefxeyî rûhperwer e
Rayîheyî hewayê zulf
Bê mey û bê dewayekê
Bê def û çeng û nayekê
Dîn dikeyin melayekê
Cezbe yî dilrubbayê zulf
Mîr û mela û mahîran
Çendî belîx û şa'îran
Xanî dihinde hazîran
Dade ji dest dewayê zulf

* Xedengê Rûm û Hindiyan

"Ku me hemdestek hebîtin"

Seydê çingala serê zilfa şeha şehbaz im ez
Mestê cama îşweya şehnazî nazik nazim ez
Remz û îcazê di xûban bê îbadet s'edikim
Mûrşîdê kamîl ez im îro hê sahîbraz im ez
Beyteya ez tê ebes bû aşîyana min qefes
Gerçî dil pîrr hewes bû bê perr û perrwaz im ez
Vê heyata îbretê çî bikem beqa nîn e ji bo
Lew şehîdê xemzeya wê dilbera tenaz im ez
Derdmendek min divêtin hemnefes bit (Xanî) ya
Ko me hemdestek hebêtin sazê xweşawaz im ez

"Ji ahûyan me yahû xwest"

Mi (min) dî neqşek ji neqşê neqşebendan
Vebû bendê di min yek yek ji bendan
Guşa da dil ji bo min ra muyyesser
Nebû bê suhbeta suretlewenda
Ji ahûyan me yahû xwest emma
Dilê min ma di nêv muşkinkemen da
Ez îro serxweş im wellellah wa'îz
Li min tayî meke wan w'ez û pendan
Li min kurt bû riya k'eba wesalê
Ji şeklê qameta balabilindan
Kesê giryan bitin pilek bi 'îşqê
Dibîtin aqîbet elbette xendan
Dilê Xanî egerçî bû sincxane
Şukur qet kes nego Xanî bi çendan

"Ne yara te nezer da"

Ji l'el di yarê emin meyvexwara
Bi dil min bibexşî Bidexşan û Buxara
Mudamî di destê xeman da zebûn im
Medamî dixwim mey bikim da ez mudara
Dema ku kirme ezara ewê gul'uzarî
Dibin bêteweluf dilê min uzara
Hinar in ji bo min der axûşperwer
Hinar in di taze hebîba dilara
Ne yara te îro nezer da te Xanî
Ne yaran nima nerahet ne yara

çingal: çengel, toqê seriyar
zulf: bisk, kezî
mest: serxweş
îşwe: naz, cilwe
şehnaz: navê jinan
şehnazî: ifîxar
îcaz: gotinên kurt û pîrrmane
xuban: dilsar
kamîl: bê kêmasî
perrwaz: firr, firrîn
beqa: mayin
tennaz: nazdar, navê jinan

derdemend: xwedîderd, hevderd
awaz: deng
neqşebend: kesê nexçan cêdike
muyesser: pê re rast anîn
sûretlewend: delal (ji bo lawan)
ahû: xezal
yahû: zikrekî derwêşan, cureyek
koter, kevok
pend: şîret
qamet: bejin
giryar: girîn
aqîbet: dawî

xend: qent, şekir
sincxane: odeya teng û tarî,
le'l: kevirêkî bi qîmet e
zebûn: bêçare û feqîr
medamî: daîmî, timî
ezar: êş û jan
bê tekelif: bê dayox
gul'uzar: baxçeyê gulan
axûşperwer: hemêzperwer,
hebîb: dîldar, evîndar, dilketî
dilar: dîlxweşker
nezer: nihertîn

numa: eşkere kir, derxist
xemrî: enûbend
şîr: şûr
bengî: evîndarê xedar
nay: ney
mey: araq
ebter: bêzêdeyî, dunde
bend: temaşekirin
Buxara: bajarek e
Bidexşan: bajarek e
malîk: xwedî milk
bend: girêdanên laşê mirov

derdemend: dilsoz, hevderd
salîk: derwêş
bendîpa: binê pê
'efa: şikleki maran
zîbad: xişîr(zêr û zîw)
rayih: bêhna xweş
dilruba: tiştên ku dil divê
belîx: şarezayê axaftinê
hinde: zor, pîrr
xedeng: tîr
aşîyan: hêlin, ciyê jîyanê

kî û aborî de paş ve bimîne. Ji bo endustrî nekeve nav Kurdistanê, binavahiya aborî çenekirin; ji avahiyên perwerdekirinê bêtir guhdan avakirina girtîgeh û wargehên leşkerî û w.d. Bi vê tunê gelê Kurd di aliyê aborî û perwerdekirinê de paş de ma, pêkhatin û zelalbûna çinan, bi taybetî pêkhatina çîna karker û çîna navî gelekî bi derengî ket. Gelê Kurd, demeke dîr û dirêj ji wan çînên civakî, yên ku dikarin bi rêxistinî dijî paşverûyîyê bicengin, gel hişyar bikin û xwenasîna neteweyî di nav gel de biçinîn bê par ma.

Hebûna gelek ol û mezheban (îslam, Êzîdî, Mesîhî) li Kurdistanê jî keys da destên dagîrkeran ku wan cudabûna bi kar bihênin û riçên neyartiyê di nav gel de bi firehî belav bikin. Ev bûyerên dîrokî dêmena malkambax ya gelê Kurd gelekî vekirî dide ber çavan.

Li gor baweriya min merov dikare îro jî hêj bandora wan nexweşiyên civakî ku di pêvejoya dîrokê de di nav gelê Kurd de hatin çandin, li ser rêxistinên Kurdistanî û serokatiya wan binê.

Di van salên dawiyê de, pira-

niya partî û rêxistinên Kurdistanî, bê ku lêkolîneke baş li ser rewşa gelê xwe bikin, rastiya bindestiya wî ya neteweyî bidin ber çavan, wan destûr û rêbazên rêxistina xwe li gor felsefe û programên biyaniyan çêkir. Ciyê ku pêşekiyê bidin yekîtiyê û rizgariya neteweyî, wan pêşekî dan rewşa civakî û bi hişkî çinparêzî dan ber xwe. Ji ber vê jî partî û rêxistinên nikarin tekevin nav gel û piştgirî û alîkariya wî bistînin. Wan ji gelê xwe bêtir piştî xwe dan alîkariya biyaniyan, bi taybetî jî ya dagîrkerên Kurdistanê. Vê helwesta

wan jî derbeke mezin li yekîtiya neteweyî xist î nexweşîne nû tevî yên kevn kir. Ew girêdan bûn ku wan pir caran nêdikarin rêzaniyeke serbixwe bimeşînin û bêgav dibûn berjewendiya biyaniyên alîkar jî bidin ber çavan.

Ger cudabûna bîrûbaweriyên wek sedem, an jî asteng li ber yekîtiya Kurd tê pêşkêşkirin, ev nerastiyê di ciyê xwe de ye. Ev helwest jî kêmbaweriya bi demokratiyê tê. Ger baweriya me bi demokratiyê hebe û em demokratên xwenas bin, emê piştgiriya cudabûna bîrûbaweriyên û pirdengiyê bikin. Li gor ba-

weriya min, cudabûna bîrûbawerî, an jî ramanan rêya yekîtiyan bêtir û çaktir vedike û zelaltir dike. Çawa ku endamên partî û rêxistinên jî bi tenê di xalên hevpar de tîr ba hev, partiyên Kurdistanî jî dikarin di xalên hevpar de werin ba hev, yekîtiyê û hevkarîyan saz bikin. Bi mercekî ku ewana bikaribin rastiya hev binasin, baweriya xwe bi pirdengiyê bihênin û berjewendiya neteweyî li ser yên rêxistinî re bigrin.

Bi hêviya ku nalîn û hawara hozanê mezin piştî sêsed salan were bihîstin.



M. Emîn Bozarslan:

”Mem û Zîn Xezîneyek e”

Nivîskariya min

Armanç: Pirsaxwe ya yekem em dixwazin ji jiyana te ya nivîskariyê dest pê bikin. Tu dikarî ji bo me piçekî bahsa jiyana nivîskariya xwe bikî. Eger em jiyana we ya 15-20 salên Ewropayê bifikirin negatîv yan jî pozîtîv çi cudahî û guherandin di dîtin û xebatên we yê nivîskariyê de çekirin?

M. E. Bozarslan: Berî ez bersîva pirsê bidim, biryara we ya ku hûnê hejmareke taybetî ya Armançê li ser ”Mem û Zîn”ê derxin, biryareka gelek di cîyê xwe da dibûnim û ez bi wê biryarê pirr kêfxweş û dilşabûm.

Çiroka jiyana nivîskariya min bi kurtayî weha ye: Di sala 1960’î da min dest bi nivîskariyê kir. Berî hingê ez wek kurdekî welatevî di nava hevalan da dixebitîyam, lê min xwe ji nivîskariyê ra amade nekiribû. Demek hat min ev pirs ji xwe kir: ”Gelo çawa ez karim ji doza gelê kurd ra xebatek bikim, xizmetek bikim?” Min bersîv da: ”Belkî bi qelesa xwe ez bikaribim xizmetek û xebatek ji doza gelê kurd ra bikim”, lê min ne dizanî ku bi rastî ez ê bikaribim bibim nivîskar yan na. Di sala 1960’î da min wek bi tecrûbe dest pê kir xwe cerbiand

Ji ber ku zimanê Kurdî li Kurdistanê jorîn ji aliyê rejîma Kemalîst ve hatibû qedexekirin, min nedikarî ez bi Kurdî binivîsim. Pirtûka xwe ya pêşîn wek tecrûbeyek bi Tirkî min nivîsî, navê wê pirtûkê ”Islamiyet

açısından Şeyhlik, Ağalık” bû. (Ji aliyê îslamê ve Şexîti, Axatî). Muessesa şexîti û axatîyê di wê pirtûkê de min vekir, tehlîl kir. Ew pirtûk, di sala 1961’da xelas bû. Piştî ku di sala 1964’an da ew pirtûk derket, hingê piçek bawerîya min jî bi nivîskariya min hat, min fam kir ku ez karim dewam bikim. Ez rûniştim min pirtûka xwe ya diduwan nivîsî, navê wê ”Dogunun Sorunlari” (Pirsên Rojhatê) bû. Di sala 1966’an da li Ankarê çab bû. Ji ber ku navê Kurdistanê qedexekirî bû, me nedikarî em bêjin rewşa Kurdistanê, ji mecbûrî me digot: ”Dogunun Sorunlari”. Di wê pirtûkê da min xwest ku ez rewşa Kurdistanê jorîn ji her alî ve binim ber çavên xwendevanên û ber çavên raya giştî. Êdî rewşa aborî, siyasî, komelî û çandeyî, min dehbeş nivîsî û ji her alî ve min rewşa Kurdistanê girt destê xwe.

Ez karim bêjim pirtûka ”Dogunun Sorunlari” aliyê wê yê girîngtrîn ev bû ku pêşî di wê pirtûkê de min ji zimanê Kurdî ra azadî û serbestî xwest. Min pêşniyaz kir ku di radyoyê da bernameyên Kurdî bînin weşandin. Herweha min pêşniyaz kir ku di dibistanên gundan da bi Kurdî ders bînin dayîn û bi zimanê Kurdî pirtûk, rojname û kovar bînin çapkirin.

Piştî kitêba ”Dogunun Sorunlari” bawerîya min bi nivîskariya min tam çêbû, min zanî ku ez karim dom bikim, lê ez rehet ne bûm, min dizanî ez însanekî kurd im her însanekî heqê wî heye ku bi zimanê xwe binivîse, çawa nivîskarekî Tirk heqê wî heye bi zimanê xwe binivîse, nivîskarekî Ereb, yan Ecem, yan

Fransîz, yan Înglîz heqê wan heye bi zimanê xwe binivîsin, ez jî divê karibim bi zimanê xwe binivîsim. Lê belê zimanê me qedexekirî bû. Ez dikarim bêjim ku min bi xwe ra têkoşînek kir, min got: ”divê ez bi zimanê xwe binivîsim”, lê wextê ez binivîsim bêguman xeter e, bêguman rizk tê de heye, dibe ku ez bêmgirtin dibe ku ez bêmgirtin. Dawiyê min biryara xwe da ku ez xwe bidim ber girtinê jî, berêşandinê jî, divê ez bi Kurdî binivîsim. Ew rewşa ku rejîma Kemalîst li Kurdistanê jorîn çêkiribû, zordestiya ku dabû ser serê gelê Kurd, wek însanekî Kurd min ji xwe ra heqê di ku ez li dijî wê zordestiyê rabim û bi qelesa xwe ez wî heqê bi dest xim.

Êdî min biryar da ku ez bi Kurdî jî binivîsim, pirtûka min a pêşîn bi Kurdî Alfabê bû. Alfabê di sala 1968’an da derket.

Alfabe Kurdî û Mehkema Tirk

Ji aliyê di ve jî min ”Mem û Zîn” amade kiribû ji çapê ra, ew jî digel Alfabê di sala 1968’an da derket. Derketina wan herdu pirtûkan jî li Kurdistanê jî li Turkiyê jî bû bûyereke gellek mezin û denganeke gellek mezin da.

Cara pêşîn bû ku alfabe Kurdî li Kurdistanê jorîn dihat çap kirin. Ji sala 1923’an vir ve wek hûn jî dizanin zimanê Kurdî qedexekirî bû alfabe Kurdî nehatibû çap kirin. Zarûkên Kurdistanê mezinên Kurdistan, kesên ku dixwendin her bi alfabe Tirkî dixwendin. Derketina alfabe bû sebêbê kêfxweşiyeka gellek mezin di nava Kurdistan da, bi tay-

betî jî di nava rewşenbîrên Kurdistan de. Lê piştî derketina alfabe bi du rojan alfabe hat qedexekirin. Derketina alfabe te’sîrek wusa kir ku normal pirtûkek wextê li Turkiyê tê qedexekirin yek mahkemeyek biryar dide û belav dibe li her derê, lê di heqê alfabe da du mahkemeyan biryar dan. Ez jî hatim girtin û çar meh ez di girtîxanê da mam. Piştî çar meh ez hatim azad kirin ji girtîxanê, lê alfabe nehat azad kirin, ew her qedexekirî ma.

Çiroka alfabe bi rastî çiroka gellekî balkêş e, mahkema alfabe heta sala 1974’an dewam kir. Di sala 1974’an da efûyek derket, qanûna lêborînê derket, bi derketina wê qanûnê doza ku li ber dadgehê bû ket. Ew dawê ket lê belê alfabe serbest nebû dîsa, tişteki gellek balkêş e, Dadgeha Bilind ya Temyîzê li Turkiyê biryar da ku ew alfabe aletê suc e, wextê efû derdikeve dawa dikeve lê ew kesê ku dawa lê hatiye vekirin heqê wî tune ku aletê suc bi paş ve bistîne. Bi wî awayî alfabe divê qedexekirî bimîne. Li temamê dinyê yek alfabe ku hatiye qedexekirin alfabe zimanê Kurdî ye. Li tu derî li tu welatekî din alfabe nehatiye qedexekirin. Ew alfabe tenê ye ku li mahkemaka bilind wek aletê suc hatiye qebûl kirin, hê jî ew alfabe qedexekirî ye.

Wergêra Şerefnamê

Piştî ku ew herdu pirtûk bi Kurdî derketin, min xebata xwe ya nivîskariyê domand û hin pirtûk bi Kurdî hin bi Tirkî çap kirin. Min Şerefnamê di sala 1971’î da wergerand zimanê Tirkî û derxist. Çima Şerefnamê?


me? Çunkî îdeolog û nivîskarên rejîma Kemalîst, herweha siyasetkarên wê rejîmê tim û tim îddia dikirin ku milletek bi navê Kurd tune, ew însanên ku ji xwe ra dibêjin ”Kurd” ew ne milletek in. Wan îddiyên xwe jî li ser sê bingehan avadikirin: Yek jê ev bû digotin: ”Zimanê wan tune”, yek jî ev bû digotin: ”Dîroka wan tune”. Wextê komêk însan ku zimanê wan tune be, dîroka wan tune be, edebiyata wan tune be ew nikarin bêjin: ”Em Milletek in” weha îddia dikirin. Bi rastî min jî wek însanekî Kurd min dixwest ez ji aliyek ve heqê xwe bi kar bînim, bi Kurdî binivîsim; ji aliyek di ve jî min dixwest ez hêz bidim xwe ku her sê bingehekan wan ên ve îddiyayê pûç derxînim. Ji xwe heqê gelê Kurd e ku bi alfabe Kurdî bixwîne, lê ji aliyek ve jî min xwest ku ez îsbat bikim ku zimanê Kurdî û alfabe wan heye.

Bi ”Mem û Zîn”ê jî min ji aliyek ve xwest ku ew pirtûk bigihîje destê gelê Kurd û ji aliyê di ve jî ez îsbat bikim ku va edebiyata gelê Kurd heye.

Şerefnamê jî min ji aliyek ve xwest ku wê bigihînim destê xwendevanên Kurd û ji aliyek di ve jî îddia Kemalîstan pûç derxim ku va dîroka gelê Kurd heye.

Girtin û terka welêt

Ji sala 1971’ê heta sala 1974’an wek hûn jî dizanin rejîma eskerî hebû, 12’ê adarê jê re dihat gotin, ez jî wek gellek Kurdên di wek gellek rewşenbî-



Mustafa Aydoğan

(Serokê Federasyona Komeleyên Kurdisatnê li Swêdê)

Gelê Kurd di gellek qonaxên dîroka xwe de herî pirr bi pirsaxwe yekîtiyê ve mijûl bûye. Ger mirov bi tenê li ser qonaxa ji Ahmedê Xanî û vir de bifikire, dê bibîne ku ev pirs tu carî ji rojva gelê Kurd derneketiye. Mirov

Kurd dê ji bo çi bikaribin bibin yek?

dê dîsa bibîne ku Kurd di vî warî de, ji derveyî hin hewildanên mehelli, tu carî bi ser neketine. Ger dîsa mirov ji qonaxa A. Xanî û heta îro bîne ber çavan, dê bigihîje encama ku ev 300 sal in ku Kurd di bin tesîra kultureke ji perçebûnê pêkhatî, tradîsyoneke li dijî yekîtiyê de dijîn. Gelê me ji ber van xusûsiyetên ku di danûstendinên hundurîn de serdest bûn, bi birînen kûr ve her naliyayê û rewş weha xuyaye ku wê ev nalîn demeke dirêj jî dom bike.

Îro divê Kurd di bin ronahiya dersên dîrokî de û li gor tabloya Kurdistanê ya ji êrîş, şerr, qetlîam, dixana ku ji xirbeyên li şûna bi hezaran gundan mane diçe û qêrî-

na dayikan ve pêkhatî, li ser vê pirsê bi awakî ciddî û bi berpirsiyariyeka dîrokî rawestin û sedemên ku Kurd nikarin bibin yekîtiyê, derxîne ortê. Ev sedem çi bin, divê her Kurd ji bo berpirsiyariyên xwe yê neteweyî û dîrokî li dijî van sedeman derkeve û ji bo jiortêrakirina wan, di nava hewildanê de be.

Sedemên ku Kurd nikarin li hember hêzên mêtîngêhar bibin yekîtiyê û şertên temsîliyeka neteweyî, pêk bîne, dikare bi gellek awayan bînin îfadekirin. Hin ji van ku li gor min ên herî girîng in. 1- Sedemên dîrokî 2- musteweya pêşveçûna civakî 3- Musteweya nîzma neteweyîbûnê û şiyarbûna bi ve girêdayî 4- Têkiliyên bi hêzên herêmî û navneteweyî û astengên

ji ber van têkiliyan derdikevin ortê 5- Helwestên hêzan ên li hember hevdu û nemaze li hember bi giştî tevgera rizgarîxwaz a gelê me 6- Hîrs û daxwaza bi serê xwe hakîmbûnê û hwd...

Di vî dema ku ji bo doza neteweyî Kurd li gor demên berê piştigirîyê xurtir a navneteweyî peyde bûye de, ji bo wergirtina encamê, girîngiya têkiliyên hundurîn û nemaze helwestên hêzan ên li hember hevdu û li hember bi giştî tevgera rizgarîxwaz a gelê me û hîrs û daxwaza bi serê xwe hakîmbûnê, ji her demê bêtir derdikevin pêş. Nirxandina wan, ji bo bicîhanîna berpirsiyariyên ku ev pêvajoyê li ser me ferz dike, gellek girîng e.

Yek ji xusûsiyetên têkiliyên

hundurîn, şerrê navxweyî ye; pirsên xwe bi şerr helkirinê ye; şiddeta di navbera hêzên siyasî de ye. Mixabin heta nuha di her şerrê navxweyî de, terefên şerr jî ceasret nedikir û nedigotin, ev şerr baş e û divê bête dewamkirin. Lê îro elhemedûlillah em gîhaştin wê qonaxê jî. Ji berdêla mehkûmkirina şerr, ji bo gurrkirinê li çepikan tê xistin û tu nemaye ku xelat bi şerrkiran ve bê vekirin. Pirsên xwe bi şerr helkirinê, metoda herî hêsan e û dîrokê nîşan daye ku di vî warî de kêma netewe bi qasî Kurdistan serkevtî (!) ne. Dîsa dîrokê nîşan daye ku bi vî metodê tu pirsên Kurdistan hel nebûye. Her ku ev metod wek çareyekê hatiye



300 saliya "Mem û Zînê"

rên Kurd di girtîxana Eskerî ya Diyarbekirê da bûm. Piştî ku em derketin di havîna 1974'an da xebata xwe ya nivîskariyê domand. Carna bi Kurdî carna bi Tirkî min pirtûk nivîsîn, wergerandin heta ku di meha 12'an 1978'an da ez hatim Swêd û ji wê demê vir ve jî ez li Swêdê xebata xwe ya nivîskariyê didomînim.

Berê ez dixwazim vê yekê bi dilekî vekirî bêjim ku di navbera jiyana min a Kurdistanê û Turkiyê û Swêdê de tu ferqek çênebûye. Jiyana min li vir jî wek jiyana Kurdistanê ye, ez li vir jî jiyaneke pirr, pirr sade dijîm û jiyana min li vir di navbera çar diwaran da derbas dibe. Wextê



M. E. Bozarslan: "Dilê min li Kurdistanê ye, bişê min li Kurdistanê ye, bes laşê min li vir dijî ez bi wî awayî li dixwazim xwe tesellî bikim." (Foto: Armanç)

xwe ez bi tevayî li ser xebata nivîskariyê derbas dikim, ji ber wê yekê ez dikarim bêjim ku ez bi dilê xwe bi serê xwe bi hişê xwe li Kurdistanê dijîm, tenê bi laşê xwe ez li Swêdê dijîm, li Ewropayê dijîm. Di dîtînan min da jî wek însanekî nivîskar guhertin çênebûne, berê jî min doza gelê Kurd dozeke rast, heq û rewa didît, îro jî ez wusa dibînim. Berê jî min dixwest ku ez ji doza gelê Kurd ra qasê ku ji destê min tê, qasê ku zanîna min têr dike bi qelesa xwe ez xizmetek bikim, îro jî ez hêz didim xwe ku ez xizmet bikim. Ji aliyên dîtînan ve jî ez dikarim bêjim guhertinek çênebûye, lê di jiyana nivîskariyê da guhertineke gellek mezin çêbû, ew jî ev bû: Li Kurdistanê jî li Turkiyê jî wek min got, pirtûkên me dihatin qedexekirin, rejîma Kemalîst em rehet nedihîştin. Bi kurtî ez dikarim bêjim azadî tunebû, wek însanekî Kurd min nedikariya ez xebata xwe ya nivîskariyê bidomînim. Piştî ku ez hatim li Swêdê bi cî bûm tiştê

giringtirîn ku min qazanc kir û ket destê min û guhertina giringtirîn ku di jiyana min a nivîskariyê da çêbû ev e ku li vir azadî bi destê min ket ew tiştên ku li Kurdistanê, li Turkiyê min nedikarî ez binivîsim, çap bikim û belav bikim, bigihînim destên xwendevanên Kurd. Lê li vir bi azadî ez dikarim binivîsim, ez dikarim wergerînim, ez dikarim amade bikim, çap bikim û bigihînim destê xwendevanên Kurd. Ez vê yekê dixwazim bi taybetî bidim zanîn.

Xebata min a li Swêdê

Piştî ku ez hatim li Swêdê bi cî bûm heta nuha 23 pirtûkên min derketine; hin ji wan bi Kurdî ne, hin ji wan bi Kurdî û Tirkî ne, hin ji wan min bixwe nivîsîne, hin ji wan min wergerandine. Mesela pênc pirtûk rêza meselokên lawuran ku "fabel" ji wan ra dibêjin, meselokên heywanan; pênc pirtûk rêza pêkenokên genî derketin, herweha pênc cild "Jîn" kovara

"Jîn" ku di sala 1918-19'an da derketibû bi Kurdî û Tirkî, min 25 jimareyên wê wergerandin bi tîpên Latînî û di pênc cildan da çap kirin. Rojnameya Kurdî a pêşîn di dîrokê da "Kurdistan" e, di sala 1898'an da ji aliyê Miqdad Mîthat Bedirxan ve hatîye saz kirin, li ser wê ez xebitîm min di du cildan da ew çap kir û herweha li ser "Mem û Zîn" a Xaniyê nemir ez sê sal xebitîm, "Mem û Zîn" ji nû ve min çap kir û gihand destê xwendevanên Kurd. Wek ku min got, li Swêdê ev azadî bi destê min ketiye û ev jî ji bo însanekî nivîskar gelek girîng e. Lê divê ez vê yekê jî bêjim ku, wek însanekî û nivîskarekî Kurd bêguman min dixwest û ez dixwazim ku ev azadî li welatê min bi destê min biketa û ev tiştên ku min li vir hazir kirine û ji niha û pê ve ez dixwazim hazir bikim li welatê min derket, li welatê min bigihîsta destê gelê Kurd. Ev daxwaz di dil da heye lê em çî bikin, rewşa me

weha ye.

Dilê min li Kurdistanê ye

Armanç: Bi vê muhaciriyê ku tu ji welatê xwe derketî çî wek mirovekî û çî wek nivîskar di jiyana xwe de wenda kir? Tu ji Kurdistanê hatî vir te azadî bi dest xist, ji nivîskariya xwe çî li paş xwe hişt?

M. E. Bozarslan: Em dikarin bêjin ku pêwendiya digel gelê Kurd min wenda kir, pêwendiya min digel gelê Kurd nema, ez ji welatê xwe qût bûm, dûr ketim, bêguman ew jî, wendabûneka gellek mezin e. Lê wek min berê jî qal kir tiştê ku tesellî jî dide min ev e ku dilê min li Kurdistanê ye, hişê min li Kurdistanê ye, bes laşê min li vir dijî ez bi wî awayî jî dixwazim xwe tesellî bikim.

Armanç: Baş e mamoste helbet bidestxistina azadiya nivîskariyê tiştêkî gellek xweş e, lê ez bawer dikim xeribî carna bi xwe re tiştên nebaş jî tîne, wek

ku te got, dan û sitandina te ji gelê te qut bû. Gelo ev qutbûn çiqas tesîr li ser nivîskariya te kir.

M. E. Bozarslan: Em dikarin bêjin ku tesîr li ser nivîskariya min nekir, lewra tiştên ku li vir heta nuha min hazir kirine, çap kirine malzeme giş di dest da hebûn. Eger li Kurdistanê azadî ji min ra hebûya, li wir jî ezê rûniştima min ê ev tişt hazir bikira. Ji aliyê nivîskariyê ve ew qutbûna ji gel tesîreka neyîn, tesîreka negatîv li ser nivîskariya min çênekir.

Armanç: Mamoste piştî ku tu ji Kurdistanê dûr ketî û li penaberiyê te jiyana xwe ya nivîskariyê domand, gelo xeribiyê di warê zimên da tesîrek li ser te kir, yanî di zimanê Kurdî da kêmasiyek bi te re çêbû yan na?

M. E. Bozarslan: Ji aliyê zimanê Kurdî ve kêmayî çênebû na xêr, lewra em li malê dîsa bi Kurdî dipeyivin. Wextê em li Kurdistanê bûn çawa em bi Kurdî dipeyivîn, berî ku em bêne Swêdê deh sal em li Îstanbûlê man li wir jî li malê em bi Kurdî dipeyivîn û li vir jî em li mala xwe her bi Kurdî dipeyivîn. Ji ber vê yekê jî kêmayîyek ji aliyê zimanê Kurdî ve çênebû. Çewtê wê ez dikarim bêjim ku ji aliyê zimanê Kurdî ve dewlemendî çêbû, pêşketin çêbû. Lewra ew azadiya ku min qasek berê qal kir ku li Swêdê bi destê min ket, di nava wê azadiyê da ji min ra îmkân çêbû ku ez li ser zimanê Kurdî jî zedetir bixebitim û zedetir bifikirim. Bi wî awayî ez dikarim bêjim ku di zimanê min ê Kurdî da we ya xud di Kurdiya min da pêşketin çêbû lê kêmayî çênebû.

Ferqa di navbera sala 1968 û sala 1995'an

Armanç: Baş e em bî ser pîrsa xwe ya dî, cara pêşî di sa-

bikaranîn, doza gelê Kurd paşdetir ketiye, birînen civakê kurtir bûye, texrîbatên maddî û manewî bêtir bûne. Û ya herî girîngtir bêhêvîtiya gel bêtir bûye û bawerî û şiyana di warê birêvebirina civakê de qelstir bûye.

Baş e, Kurd divê li hember şerrê navxweyî çî bikin? Panzehîra şerrê navxweyî û şiddeta di navbera hêzên siyasî de ku wek metodeke danûstendîne tê bikaranîn, pêşdebirîn û xurtkirina hîs û fikrên yekîtiya neteweyî ne. Ne hîs û fikir bi serê xwe tenê, herweha refartariyê ku di bin ronahiya van hîs û fikran de ku şikil dide hemû awayên pêwendiyên jî şert e.

Helwestên hêzan ên di warê nixandina hevdu de jî gellek caran bi qasî şerrê navxweyî texrîbkar bûye û ev helwest bi xwe gellek caran bûye sedemê

şerrê navxweyî. Ev helwesta negatîv gava bi giştî tevgera rizgarîxwaz a gelê me dide ber xwe, texrîbkarî dibe. Ev di warê îttifaqan de kaniya gelek astengan pêk tîne. Ger mirov ji îttifaqê, ji ortêrakirina hêzên din fahm bike an bidestxistina şertên ku yên din mecbûrî beşdariya hêza xwe bike, fahm bike, ji xwe Kurd dê tu carî nikaribin îttifaqê bikin. Ji ber ku mirov dixwaze ku mirov bi tenê hebe û ji ber ku gava mirov bi tenê hebe, mirov nikare bi xwe re îttifaqê çêbike, wê gavê pêwîstiya gelê Kurd bi îttifaqê namîne. Heta ku ev mantiq serdest be, divê Kurd îttifaqan xeyal jî neke.

Di warê yekîtiyê neteweyî ya di sewiyeya herî bilind de jî ev helwestên li dijî mantiqê yekîtiyê, roleke negatîv dileyizin û

dibin sedemê ku jiyana tradîsyona perçebûnê dirêjtir bibe. Ger her hêz ji xwe re li ser navê neteweyê Kurd bibêje ku ez bi tenê dikarim parlamentoya neteweyî ava bikim, ez bi tenê dikarim kongreya neteweyî ava bikim, ji xwe ne yekîtiyê û ne jî van muesseseyên ku navên wan li jor hatin diyarkirin, dê di maneya xwe ya eslî de tû ji bo fonksiyona ku jê tê hêvîkirin bileyize, tu carî pêk neyên. Ger herkes weha bifikire, wê gavê çend partiyên me hebin, divê ewqas parlamentoyên me û ewqas jî kongreyên me yên neteweyî hebin. Ev jî sewiyeya neteweyîbûna me pirr êşkere derdixîne ortê. Heta ku em pîrsa yekîtiyê, parlemonto û kongreyê, wek pîrseke taktîkî ku divê ji bo xurtkirina hêza me ya taybetî

îmkanan amade bike bibîne, divê Kurd ne parlamento û ne jî kongreyeke neteweyî xeyal bikin. Ji xwe, kongreyeke neteweyî ya ku bikaribe ji bo birêvebirina doza gelê Kurd ku li hemû perçeyan otorîte be, ji ber sedemên li jor diyarkirî -û tew bi ser de jî stratejiyên cuda- heta rewş weha be, ne mûmkun e. Ger mirov ji rewşê hereket bike, ji berdêla kongreyeke neteweyî ya li ser yekîtiya stratejiyê hatiye avakirin, nuha kongreyeke neteweyî ya bi fonksiyoneke îçtihadî, ya herî realist e. Lê ji bo wê jî divê beriya hertiştî, mantiqa serdest a ku nahêle yekîtiyê çêbike, bê terkkirin. Na na, ne yekîtiyê, lê pêkanîna şertên hevkarîyêkê jî pirr zehmet e.

Heta rewşa Kurdan weha be, heta helwesta hêzan a li hember

hevdu hemû hişkahiya xwe biparêze û ev awayê danûstendîne yê serdest ku hertim roleke texrîbkar leyiztiye neyê guhertin, pîrsa ku çima Kurd nabin yek divê pîrseke ne di cîhê xwe de bête hesabandin. Di rewşeke weha de pîrsa herî di cîhê xwe de divê ev be: Ger ev rewşa hanê weha berdewam be, Kurd dê ji bo çî bikaribin bibin yek?

Hêviya min ev e ku Kurd dê guh bidin qêrîna Ahmedê Xanî ya ku ji kûrahiya dîrokê tê bibihîsin û bi munasebeta 300 saliya nivîsandina "Mem û Zîn"ê li ser pîrsa yekîtiya ku pêwîstiya gelê me ji her demên din ên dîrokê bêtir pê heye, ji nû ve û bi awakî hîn ciddîtir bifikirin û sedemên ku dihêlin mirov bipirse; "Gelo Kurd dê ji bo çî bikaribin bibin yek" ji ortê rakin.



la 1968'an de we "Mem û Zîn" ji Kurdî wergerand bo Tirkî û we ew çap kir; niha jî îsal ku sala 1995'an e we careka dî bi Kurdiya xwerû "Mem û Zîn" çap kir. Hem li ser Ehmedê Xanî û hem jî li ser "Mem û Zîn"ê ferqek di navbera dîtînen te yên sala 1968'an û yên sala 1995'-an de heye yan tune?

M. E. Bozarslan: Berî ku ez bersîva vê pirsê bidim ez dixwazim nuqteyek zelal bikim. Te got ku: "Te "Mem û Zîn" di sala 1968'an de wergerand Tirkî", neku bi tenê min ew wergerand Tirkî; "Mem û Zîn" hem min jî tîpên Erebi wergerand

tîpên Latîni herweha min jî Kurdî wergerand Tirkî jî û di sala 1968'an da Kurdiya wê û Tirkiya wê bi hev re çap kir.

Di heqê "Mem û Zîn"ê da û di heqê Ehmedê Xanî da ferqa dîtînen xwe ên 1968'an û 1995'an, ez dikarim weha zelal bikim: Di bingeh da ferq çênebû, wê demê jî min dizanî û ez tê digihîştim ku "Mem û Zîn" dastana neteweyî ya gelê Kurd e, îro jî ez tê gihîştîme ku wusa ye. Wê demê jî min dizanî û baweriya min wusa bû ku Ehmedê Xanî yê nemir pêşrewêkî gellek mezin û qedirbilind e ku jî gelê Kurd ra azadî xwestiye û sazkirina dewleteke Kurdî aniye pêş çavên xwendevanên Kurd, îro jî dîtina min ew e.

Lê belê wek ku hûn jî dizanî li Kurdistana jorîn û li Tirkiyê jî me ra azadiya nivîsînê û lêgerîne tune bû, min dîr û dirêj nedikarî ez li ser "Mem û Zîn"ê lêgerîneka weha zaniyarî bikim û jî kûr ve "Mem û Zîn"ê fam bikim û pirr jî nêzik ve dîtînen

ehmedê Xanî bibînim. Ji aliyê kûrbûn, mane û mesaja ku di "Mem û Zîn"ê da heye dîtînen min li vir pêşdetir çûn, lewra jî ber hebûna azadiyê min mecal dît ku ez sê sal li ser "Mem û Zîn"ê bixebitim, bê ku polês bê li derê min xe, pirtûkên min qedexê bike û bavêje girtîxanan bi serbestî ez li ser xebitîm. Ez dixwazim yek nimûnyek nîşan bidim da ku di heqê azadiyê da û bi taybetî jî însanekî nivîskar ra çawa girîng e. Piştî ku "Mem û Zîn" derketibû ez li Kurdistanê û li Tirkiyê du sal li ser Dîwana Melayê Cizîrî xebitîm, min ew jî gişt wergerand tîpên Latîni û min dixwest ku ez wê wergerînim Tirkî û wek "Mem û Zîn"ê ku Kurdiya wê û Tirkiya wê bi hev ra derxim. Carek jî caran polês bi şev avêtin ser mala me, di tûrên şekir de pirtûk, dosya û notên min yên muswede hebûn, hemû polês birin, ew dîwana Melayê Cizîrî ku ez du sal li ser xebitîbûm li ser masê bû ew jî xistin nav wan û birin.

Arman: Gelo aliyekî Ehmedê Xanî heye ku di 68'an de ji te ra ne pirr zelal bû û di sala 95'an de dema tu li ser "Mem û Zîn"ê xebitî ji te ra zelaltir bû?

M. E. Bozarslan: Belê, ne aliyek, gellek aliyên weha hene. Wek min got ez li Swêdê sê sal li ser "Mem û Zîn"ê xebitîm min jî kûr ve ew xwend. Ji gellek aliyan ve min dît ku Ehmedê Xanî, xwestiye komeleka Kurd a dînamîk teswîr bike. Ehmedê Xanî bê ku ji Kurdan ra bêje: "De rabin lê xin, dewletek saz bikin", xwestiye dewleteka Kurd teswîr bike, salixê dewleteka Kurd bide, bine ber çavan, yanî jî aliyê komelî ve, jî aliyê dîrokî ve, jî aliyê mesaja Ehmedê Xanî ve herweha jî aliyê edebî û hunerî ve gellek tiştên weha hebûn ku li Swêdê di vê lêgerîna sê salan da jî nêzik ve min dîtînen û baştir ez tê gihîştim ku Ehmedê

Xanî nivîskarekî çiqas mezin bûye, hozanekî çiqas hunermend bûye û herweha pêşrewêkî çiqas dûrbîn bûye û xwestiye çiqas bide gelê Kurd.

Arman: Mamoste tu dikarî ji aliyê edebî û hunerî ve hinek nimûne ji wan tiştên ku tu vê dawiyê pê hisiyayî bidî me?

M. E. Bozarslan: Belê, di reweşa hunerî û edebî da wextê em li "Mem û Zîn"ê dinêrin; min jî "Mem û Zîn"ê ra pêşgotinek ji 110 rûpelan nivîsiye, di vir da jî min dîr û dirêj qal kiriye. Wextê ku E. Xanî salixê gelê Kurd daye bi edebiyateka wusa salix daye ku ew bi xwe hunerek e;

"Wan girtî bi şîrê şehre şuhret Tesxîrî kirin biladê himmet"

Wextê em van herdu malikan digirin destê xwe, em dinêrin ku Ehmedê Xanî di vir da hunereka pirr mezin aniye meydanê. Bi hunermendiyeka mezin pesnê mîrxasiya gelê Kurd daye, yanî dikarî bi gota: "Kurd pirr mîr in, pirr mîrxas in, pirr şerkar in, pirr jêhatî ne". Lêbelê şuhret û navdariyê kiriye wek bajarek û gelê Kurd jî şibandiye bi wan şerkarên ku diçin wî bajarî bi şûrê xwe dagir dikin, ev hunereka gellek mezin e. Herweha Ehmedê Xanî bi van gotînen xwe himmet û xîretê û mîrxasiyê kiriye wek welatek.


Arman: Di Adara 95'an de "Mem û Zîn" jî aliyê we ve carek din hat çap kirin, di vê çapê de we "Mem û Zîn" jî Kurdiya Ehmedê Xanî wergerandiye Kurdiya xwerû, yan jî hinek dibêjin Kurdiya îro, we ev pêwîstî çima dît?

M. E. bozarslan: Di pêşkêşiya "Mem û Zîn"ê da jî min ev mesele nivîsiye bi dîtina min divê ku gelê Kurd dastana xwe ya

neteweyî nas bike, herkes dizane, dibîne û dibêje ku "Mem û Zîn" dastana neteweyî ye ji bo gelê Kurd. Divê ku gelê Kurd dastana xwe nas bike, bizanibe tê de çiqas heye, navaoka wê çiqas ye, jî aliyê hunerî û siyasî ve nas bike. Di zemanên berê da, di dema Ahmedê Xanî û berî wî da jî gellek mixab in toreyek adetek di nava nivîskar û hozanên gelên musulmanên ne Erebi da çêbûbû, wan di eserên xwe da di helbestên xwe da gellek peyvîkên Erebi bikar tanîn. Herweha di nava hozan û nivîskarên Kurd, Tirk û Osmanî da jî, bûbû toreyek, li tenişt peyvîkên Erebi peyvîkên Farisî jî dihatin bikaranîn. Wê wextê em dikarin bêjin moda wusa bû, adet wusa bû, gellek mixab in, Ahmedê Xanî jî li gora wê toreyê di "Mem û Zîn"ê da gellek peyvên Erebi û Farisî bikar anîne û bi wî awayî "Mem û Zîn" bi awayekî giran hatiye nivîsin. Li gora rewşên birên wê demê belkî normal bû, ew tê digihîştin lewra hingê çandeyî û zimanê Erebi li ser gelê musulman ên ne Erebi bûbû fermanrewa, rewşên birên wê demê ên Kurd jî ên Ecem jî ên Tirk jî ên Osmanî jî tê digihîştin. Lê li gora mirovên adetî zimanê wê giran bû. Di dema me da ew îmkân ji rewşên birên Kurd ra nemaye bi taybetî jî li Kurdistana jorîn rewşên birên Kurd êdî peyvîkên Erebi û Farisî fam nakin, kesên ne rewşên bir qet û qet fam nakin.

Wek însanekî Kurd amanca min jî ew e ku ez "Mem û Zîn"ê bi însanên Kurd bidim nas kirin. Îmkânê ji mirovên Kurd ra ji rewşên birên Kurd ra çêkim ku bikaribe dastana xwe ya neteweyî bixwîne û fam bike, tê bigîje, naveroka wê fam bike, mesaja ku Ehmedê Xanî xwestiye bi "Mem û Zîn"ê bide gel wê mesajê bigre û fam bike. Ji bo ku ez wê amancê pêk bînim, ez fikîrîm û min biryar da ku divê "Mem û Zîn" bi kurdiya xwerû

bê wergerandin. Bi rastî ev daxwaz ji sala 1968'an ve di dilê min da hebû lêbelê li Tirkiyê li Kurdistanê ev xebat ne mumkun bû. Piştî ez hatim Swêdê min dizanî ku di sala 1995'an da 300 saliya "Mem û Zîn"ê wê bê pîroz kirin. Min bernama xwe li gor wî awayî hazir kir ku ez xebatekê li ser "Mem û Zîn"ê bikim, wergerînim Kurdiya xwerû jî û bi pêşkêşiyeka dîr û dirêj "Mem û Zîn"ê bidim naskirin û di sala 1995'an da bi munasebeta 300 saliya wê "Mem û Zîn"ê bigihînim destê xwendevanên Kurd. Wek ku hûn dizanin min "Mem û Zîn" careke dî jî him wergerand tîpên Latîni, hem jî min wergerand Kurdiya xwerû û Kurdiya wê ya orgînal jî û ya xwerû pêk ve min çap kirin. Bi wî awayî îmkân ji xwendevanên Kurd ra çêbû ku herduwan bide ber hev û qiyas ji bike. Wek min got wek hûn dizanin û herkes jî dizane di çapa 1968'an da me hin malik hin perçe ji beşê pîncanê "Mem û Zîn"ê derxistibû, şûna wan me vale hiştibû. Ez dixwazim li ser wê yekê bêjim ku ew jî nimûneyek e ji bo girîngiya azadiyê. Dema min li Stenbolê "Mem û Zîn" hazir kir min jî çend hevalên xwe yên awuqat rica kir ku li ser vî beşê civînekê çêkin û dîtina xwe bêjin, gelo em bi wî awayî çap bikin wê jî aliyê qanûna Tirkiyê ve zirara wê çibe, fayda wê çiqas be. Yek jî wan hevalên min jî rehmetî Meded Serhad bû ku par bi destên hêzên reş hat şehîd kirin. Evên di ez navên wan nebêjim, bi qasê ku tê bîra min çar awuqat bûn. Li hev civiyan ez jî li wir me gişt li wir bi hev ra xwend û dîr û dirêj çend seet li ser wê munaqesê kirin. Di duwayiya munaqesê da gihîştin vê netîcê û jî min ra jî tewsiye kirin û gotin ku "tu wan jê derxî wê çêtir be". Vêca "Mem û Zîn" di dest da nemabûn, çapa 1919'an kit û mat di destên hin kesan da mabûn wan jî veşartibû. Gel dizanî "Mem û Zîn" heye lê kesî nedî



Osman Aytar (Nivîskar)

Ger mirov dema berî Ehmedê Xanî bide aliyekî, piştî 300 saliya nivîsandina Mem û Zînê jî aktûelbûna pirs û daxwaza yekîtiya Kurdan, ya girîng jî di vî warî de hebûna hin pirsgerêkên bingehîn ku ev zirareke mezin didin doza Kurd û Kurdistana, divê ji gelek aliyan bînin şirovekirin. Çunkî hin tişt hene ku tenê bi daxwazan nayên çareser kirin û gelek tişt jî girêdayî

Em muhtacî aştîya navxweyî ne

rewş û rastiya dîrokî, civakî, kultûrî, çînayeti û dîni ya Kurdistana ne.

Berê her tiştî di gel xwedînebûna tecrûbeyê civateke azad û li ser vê bingehê pêknehatina yekîtiya neteweyî, perçebûna welêt û civatê, ji gelek aliyan bûne sebeb ku zemîna yekîtiyê her dem zêf be û xesaret mezin be. Ev aliyekî girîng e pirsê ye.

Ya din jî girêdayî tiştên ku ji çewtî û kêmasiyên me Kurdan bixwe hatine pêş û bûne sebebên pirs û pirsgerêkan e. Ji bo serrastkirina çewtî û kêmasiyên weha jî, ne pêwîst e ku Kurd bendeya civateke azad û welateke serbixwe bimînin. Herweha ev aliyê pirsê, ji bo pêşveçûna tîkoşîna îroyîn û pêşerojê, gelek girîng e. Bê şik statûya ku Kurd tê de dijîn, tesîreke mezin li ser helwest û nêrînan dike. Lê ev statû, pirsê bi

temamî zelal nake. Ji holê rakin, an jî qet ne be kêmkirina çewtîyên ku li pêşiya pêvajoya bîdestxistina destketînen neteweyî jî astengên pir girîng in, vatîniyêke bingehîn e. Ger ev vatîni bi biryardarî neyê bicihanîn, weke mînaka Dewleta Federe ya Kurdistana Başûr, bîdestxistina hin maf û dezgehên neteweyî jî nikare rê li ber şerê xwekujîyê bigre. Lihevhatin, hevkarî û biratî-xwişkîtiya nav Kurdan bixwe, ji bo vê yekê gelek pêwîst e.

Yekîti berpirsiyariyêke dîrokî ye jî. Lê pir mixabin di vî warî de birîna civata Kurdan kur e, her dem keliyayê û dikele. Wexta mirov li gotinan dinêre, yên ku şerê hevdu dikin jî tê de hemû behsa yekîti û hevkarîyê dikin. Hetta hin caran bi navê "pêkanîna yekîtiyê", pa-

rastvaniya şerê xwekujîyê tê kirin. Hesasiyet, hetta nermbûna ku li hember dewletên dagirker tê nîşandan, li hember hêzên Kurdistana nayê nîşandan û îddiyên gelek giran û ne di cî de tî holê. Di hin helwestên ku li ser şerê YNK-PDK'ê û şerê PKK-PDK'ê ku bi êrişên PKK'ê dest pê kiribû, hatin eşkerekirin de, çewt pîvanî û dijhevîbûna nêrînan bi her awayî li ber çavan e.

"Ezîtiya" rêxistinî û pêşhukûma (önyargi) heyî carnan wusa dike ku çav kor, guh kerr û ziman lal dibin. Wasite bi hêsani dikevin şûna armancan. Serxosîya bi hêzbûna kîtlewî û biçûk dîtînen an jî reşbîniya (pesîmîst) hin aliyan jî li pêşiya kultûra yekîtiyê roj bi roj astengên nû ava dike. Di rewşeke weha de gav û dezgeh êdî ne li gor aliyên xwe yên baş û nebaş, bi

rengên "reş" û "sipî" tînen morkirin. Di şûna jî fakta û argûmentan ber bi encaman çûyîne de, pêşî biryara dawîn tê dayin û piştî jî tê xwestin ku li gor vê biryarê "fakta" û "argûment" bînin dîtînen.

Di eslê xwe de helwestên weha nîşanên malwêraniyê ne û jî dîrokî ders ne standîne ne. Halbikî Kurd îro jî hemû deman pirtir muhtacî yekîtiyê ne. Gelek tişt rasterast girêdayî yekîtiyê ne. Ji bo vê jî, divê berê her tiştî hêzên Kurdistana li ser bingeha parastina berjewendiyên neteweyî, aştîya navxweyî bê qeyd û şert îlan bikin û li gor pêwîstiyên ve gavan bavêjin. Çunkî, çiqas yên dîrokî bin çiqas yên rojane bin, hemû tecrûbeyên Kurdistana û navneteweyî, bi eşkereyî nîşan didin ku, riya avakirina civateke azad û parastina destketînen neteweyî, ji vê aştîyê derbas dibe.



tibû "Mem û Zîn" bûbû wek teyrê Enqa navê wê hebû ew bi xwe tunebû. Li ba hin meleyên Kurdan hin nusxeyên destnivîsar hebûn li wî alî wî alî ew jî mirov dikare bêje: "li her herêmê dido-sisê bûn".

Amanç û daxwaza me ew bû ku berî hertiştî em "Mem û Zîn"ê binin ser kaxid "Mem û Zîn" bila ji wendabûnê xilas bibe carek. Îcar li gora tewsiya wan hevalên awuqat ku gotin: eger tu van malikan jê derxî belkî qedexa nebe, lê ku tu dernexî ji sedî sed wê qedexa bibe. Me ew malik jê derxistin jî lê paşî disa qedexa bû, bi rastî sê hezar girtin li qamyonek barkirin birin şewitandin, lê sê hezarên dî di nav gel de belavbû. Lê di mehke-mê da di duwayî da beraet

kirin di sala 1975'an da li gora çapa berê disa careke dî hate çap kirin.

Herweha min nedikarî ez pêşkêşiyeka weha dîr û dirêj binivîsim û "Mem û Zîn"ê tam bidim naskirin. Di destê min da hingê du nusxeyên "Mem û Zîn"ê hebûn yek jê nusxeya bavê minê rehmîti ku bi destê xwe nivîsî bû, navê bavê min Mele Mehmûd bû, yek jî ji çapa 1919'an hebû min ew herdu dan ber hev ez li ser xebitîm. Bi wî awayî yanî xebateka teng bû, wek min got, çapa Stanbolê ya 1968'an du nusxe di destê min da hebûn ku ez li ser wan xebitîm. Lê li Swêdê min sê sal wextê xwe ji bo "Mem û Zîn"ê veqetand, pênc nusxên "Mem û Zîn"ê min dan ber hev: yek jê çapa 1919'an ku çapa "Mem û Zîn"ê ya pêşîn ew e di dîrokê da, yek jê çapa 1968'an, yek jê çapa Mamoste Hejar ku di 1960'î da li Bexdayê çap kiriye, paşê Enstîtuya Parisê jî nû ve ew çap kir, yek jê çapa Margeretta Rudenko ku di sala 1962'an da li Moskowayê çap ki-

riye, yek jî çapa Urmiyê ku di sala 1988'an da nivîskarekî Kurd Perwîz Cihanî, li Kurdisatana rojhilatê, çap kiriye. Ew herpênc nusxe di destê min da hebûn min herpênc nusxe dan ber hev û wextê min nivîsî ez li ser xebitîm.

Di navbera hin nusxan da hin cudayî jî hebûn min ew cudayî jî giş bi jêrenotan îzah kirin. Bi wî awayî ez dikarim bêjim çerçewa xebata min a li ser çapa Stanbolê ya 1968'an çiqas teng bû wiusa a li Swêdê ku sê sal dewam kir ew-qas fire bû.

Kurmanciya klasîk û Kurmanciya modern

Armanç: Baş e, her bi vê pirs-a berê ve girêdayî pirsêka me hebû, belkî bala we jî kişandiye gelek caran mirov di rojname û kovarên Kurdan de pêrgî gotina Kurmanciya klasîk yan Kurmanciya modern tê; heta di hin kovar û rojnameyan de, di warê edebiyat û ziman de behsa rone-sansa Kurmanciyê tê kirin. Bi ya we Kurmanciya nivîskî ji dewra Ehmedê Xanî û heta sala 1995'an, bi qalibên giştî jî be eger, di kîjan qonaxan re derbas bûye û niha rewşa wê çi ye?

M. E. Bozarlan: Bê guman di heqê zimanê Kurdî de hin gotinên weha ku bi cî dibin mirov dikare li ser wan dîr û dirêj bi-peyive. Lê dîtina min ne ew e ku zimanekî Kurdî yê klasîk heye û zimanekî Kurdî yê modern heye. Zimanekî Kurdî heye yek zima-nek e û ji mêjedemê ve hatiye bikaranîn û niha jî tê bikaranîn, di pêşedemê da jî em hêvîdar in ku tim û tim bê bikaranîn. Wek berê jî min îzah kir, di dewra Ehmedê Xanî da di dewra Mela-yê Cizîrî da yanî hozanên me yên ku em ji edebiyata wan ra, dibêjn edebiyata Kurdiya klasîk mirov dikare ferqek di navbera wê edebiyatê û zimanê gel da bi-bîne. Lê bi vê yekê em nikarin bêjin ku zimanê Kurdî ji gihane-

kek gihaye gi-hanekeka dî. Em dibînin ku di wan dewrên berê da hozanên Kurd gellek peyvîkên Farisî û Erebi di ese-rên xwe da bi- kar anîne. Ji bo rewşenbîrên îroyîn û ji bo gel çi wê wextê û çi îro gellek zor e ku wan peyvikan fam bikin. Îcar em nikarin bêjin ku ew zimanekî ki-lasîk bû û gelê Kurd jî wê dewrê hat gihişt vê dewrê, lew-ra di wê demê da jî ew ziman ne zimanê gel bû ziman zima-nê edebiyatê bû. Rewşenbî-ran jê fam diki-rin rewşenbîr tê digihîştin, lê zi-manê gel zima-nê gundiyê Kurdistanê disa Kurdiya îroyîn bû. Loma jî wek min got dî-tina min ne ew e ku zimanekî me yê klasîk hebûye û zima-nekî me yê mo-dern jî îro heye. Herweha em divê rewşa zi-manê xwe li gora rewşa Kurdis-tanê jî bidin ber çavê xwe. Beşê mezintirînê Kurdistanê ku di bin zordestiya rejima Kemalîst da hatiye perçiqandin, zimanê Kur-dî di wî beşî da qedexekirî maye heye niha. Vêca em nikarin zi-manê xwe bi zimanekî serbest ra, qiyas bikin ku di nava pêş-

MEM
û
ZÎN

EHMEDÊ XANÎ



Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû:
M. EMÎN BOZARSLAN

ketina tabîî da bi pêş ve çûye û guhertin tê da çêbûye. Em bêjin em li Îngilîzî wextê binêrin kesên îngilîzîzan kesên bispor di-zanin tesbît kirine ku di navbera Îngilîziya dewra Şekspîr (shaks-pear) û Îngilîziya îroyîn da cu-dayî heye. Îngilîzî ne ku qedexa bûye, îngilîzî serbest bûye lêbelê bi guhertina aborî, siyasî, civakî

û teknîkî bi îcadên nû ziman bi pêş ve çûye bi pêş ve çûye bi wî awayî di ziman da guhertin çê-bûye. Em dikarin bêjin ziman kemiliye yanî ji dewra Şekspîr ziman kemiliye bi pêş ve çûye gihaştîye dewra îroyîn.

Kurd nabin yek

Ahmed Rêbaz
(Siyasetvan)

Ez bawer dikim du şikil se-bebê bingehîn li pêşîya ye-kîtîyê astengin. Sebebê derveyî ne bi Kurdan ve girêdayî ne û sebebên navxweyî yên ji kêmaqilî, xweperestî û bêberpir-siyarî û carna jî ji casûsiya sero-katîya rêxistinên siyasî peyda di-bin.

Kurd miletekî xedirlêbûyî ye, hatiye parçekirin û teslîmê mer-hemeta cîranên xwe yên hov û ne mirov bûne. Welatên mezin yên xwedî desthilat Kurd mec-bûrê neyar û pêwendiyên gemarî kirine. Ji ber van şertên dijwar Kurd jî tifaqên navxwe-yî bi tirsîn û xwe vedigrin.

Astengên navxweyî bi tema-mî bi rêberiya Kurd ve girêdayî

ye. Kêmaqilî û bêmesûliyetî role-ke mezin heye, lê rola esasî des-tên neyaran e ku di nava kurdan de kaniya bêtifaqî û pevçûnê ye.

Ji bo yekîtîyê çi pêwîst e? Bi bawerîya min du tiştên biçûk:

1- Divê rêxistinên Kurd hebin û ne ji teref casûs û nokerên dij-minên Kurdan, lê ji teref kesên niştimanperwer ve bèn meşandin.

2- Divê kesên rêxistinên kur-dan îdare dikin dîrbîn bin, ji welat û gelê xwe hez bikin û ber-jewendiyên welêt û gelê xwe di ser berjewendî û ihtirasên xwe yên siyasî û şexsî re bigrin.

Heger ev herdu nuxte serast bin tiştên din bi rehetî tên helki-rin. Lê mixabin ev şert tune ne. Şertên yekîtîyê biçûkin lê tune ne. Loma jî di van şertan de yekî-tî xeyalek vala ye. Bêyî pêkanîna şertan, tenê li pey gotina yekîtîyê bezîn ji yekîtîyê re ne xizmet e. Kurd ketine çembera kêmaqil û casûsan. Divê Kurd jî vê bêne riz-

garkirin. Berbi yekîtîyê gava pê-şîn dorlêgirtina casûs û kêmaqi-lan e.

Kêmaqil û casûs, yanî nokerên dijmin kî nin û ferqa wan çîye? Ev di niv rûpelî de hilnayê. Lê ezê çend tiştan destnîşan bikim:

1- **Kurdên başûr bi saya serê gelê Kurd yê belengaz û xelkên xerîb bûn dewlet.** Li şûna mesûlî-yeta xwe zanibin û rêberîya millet bikin, YNK û PDKê şerê hevdu kirin. Ev li himber millet û dîrokê kêmaqilî û bêmesûliyetîyek pirr mezin e.

Ji bo PKK li himber PDKê bi kar bîne çi ji destê Celal hat kir. Wextekê PDKê jî xwest PKK li himber Kurdên bakur bi kar bîne û çî ji desta hat jî kir. Netîce li ber çavaye, li her hêlê zarokên me, keç û xortên me tên kuştin. Vê siyaseta kor zirarek mezin da têkoşîna gel.

Serokatîya Kurdên başûr tu demê li nava perçeyên Kurdistanê li heval û dostan negerîyan, li pe-

yên xwe gerîyan. Ev sebebek asa-sî ye ku bi peyên dijmin re ketin têkiliyan. Nimûne pirr in û yek jî jê têkiliyên wan yên bi PKK'ê re ne.

Ev siyaseten hatine meşandin û berdewam in nabin sebe-bê yekîtîyê lê dibin sebebê ji hev bêbawerîyê û dîrketinê. Ev êşkere ye. Loma jî ji bêtêvdîrî û bê tifaqiya Kurdan bi tevayî PDK û YNK mesûl in.

2-Li Kurdistanê Bakur PKK xurt bûye. Serokê PKK Abdul-lah Öcalan'ê û ji bo wî gelek car hatiye gotin ku ew casûsê MIT'ê bûye. A. Öcalan nabêje ev de-rew e, dibêje min MIT li nava guhê hevûdû xist. Dibêje ew pir jêhatî ye û MIT bi hostayî bikar anîye. Dibêje min destpêkê de ev kar bi dijmin re dest pê kir. Ev gotinên A. Öcalan rast in.

Garantîya kesî tune ye ku A. Öcalan têkiliyên xwe qut kirine. Paşê A. Öcalan li Sûriyeyê ye û

di emrê îstixbarata Sûriyeyê de ye. Divê ev tişt na ji rêxistinên niştimanperwer re bi mane bin. Bi qeneeta min rêxistinên li dijî Kurdkujî û zulma PKK'ê derne-kevin, casûsiya A. Öcalan nerici-mînin heqê wan tune ye qala ye-kîtîyê û niştimanperwerîyê bikin. Ew li ser navê yekîtîyê, bi kuştî-na Kurdan, valakirina Kurdistana gemarî dibin. Yekîtî, lê bi kê re û çawa? Bi casûsan re yekîtî bêmkan e. Casûs ne ji bo yekîtî-ya Kurdan pêk bînin bûne casûs. Bi raya min meriv vêya fam neke bi bêaqilîyê îzah nabe û ewj î li pêşîya yekîtîyê astengek gelekî mezin e.

Bi kurtî, Kurd li ku şerê he-vûdû dikin, li ku bêtifaqî di nava wande heye li wê derê li kêmaqil û casûsan bigerin. Hûnê mutleqa wan bibînin. Çi wextê pêşîya wan hate girtin wê çaxê yekîtîya Kurdan gelek bi rehetî pêk tê.

Bi hêviya yekîtîya niştimanper-werên Kurd.



300 saliya "Mem û Zînê"

nê li Ewropayê gelek rewşenbîrên Kurd gihastine hev, azadî jî bê guman ji ber ku heye, zimanê Kurdî hinek bi pêş ve çûye. Herwisa pêwendiyên Kurdên jêrîn û jorîn, rojhilat û rojava çêbûne, xebat jî li ser ziman heye. Ev xebat eger di wextê xwe da li Kurdistanê bihata çêkirin ev pêşdaçûn zêdetir wê li Kurdistanê çêbûbûya. Lê wek min go yanî dîtina min ne ev e ku ziman didu ne: Klasîk û modern, ez vê dîtîne qebûl nakim, baweriya min ne ev e.

Armanç: Wergera "Mem û Zînê" ya ji bo Kurdiya xwerû disa bi nezm e ne nesr e, wek adet emê bêjin piraniya berhemên weha yên wek "Mem û Zînê" bi nesr tîn şirove kirin, yan wergerandin. We çima disa ew wek nezm hiştiye? Bêguman divê em îtiraf bikin ku ev hostatiyeka mezin e.

M. E. Bozarslan: Belê carek din bêjim spas ji bo ku hûn hostatî qebûl dikin vî tiştî. Wek ku di pêşkêşiyê da jî min îzah kir-

riye, amanca min a bingehîn ew bû ku ez "Mem û Zînê" bi gel bidim naskirin û îmkân çêkim ku xwendevanê Kurd naveroka "Mem û Zînê" nas bike. Lê li teniştê vî karî min xwest ku ez di wergeranê da rengê edebî jî biparêzim. Vêca min li wir du tişt dan ber çavên xwe: yek jê ew bû ku wezn ya xud kêşe gelo tê da hebe tunebe ew gellek zore, hatta mirov dikare bêje "ne mumkun e ku mirov "Mem û Zînê" bi awayê 'erûzê ('erûdê) wergerîne û bi dîtina min ne pêwîst e jî. Lewra dewra me êdî ne dewra 'erûzê ye. Ji ber vê yekê min wezna malikên "Mem û Zînê" min serbet hişt, hin malik kut in hin dirêj in. Lê min xwest ku ez rengê wê ye edebî bi lihevanîna qafiyên biparêzim. Îcar min qafiyê li hev anîn li ser wê ez gellek xebitîm. Min xwest ku wextê xwendevan "Mem û Zînê" bixwîne tê bigihîje û naveroka wê fam bike bibîne ku ew esereka edebî ye, di eynî wextê da bizanibe ku ev wergeraneka edebî ye rengê wê ye edebî jî heye ne ku bi tevayî mane tenê ye.

Lewra eger tenê mirov bixwaze maneyê bide û rengê edebî ne parêze hingê wê piçek rijî bihata.

Armanç: Helbesta Ehmedê Xanî wek helbest dikeve kîjan beşa nezmê, kêş û wezna wê çi ye? Wek berhemeke edebî bi ya we cihê "Mem û Zînê" di nav edebiyata cihanê da çi ye? Gelo mirov dikare "Mem û Zînê" wek berhemeke ji berhemên klasîk ên cihanî bihesibîne?

M. E. Bozarslan: Helbestên Ahmedê Xanî bi giştî wek helbestên hozanên wê demê jin Melayê Cizîrî, Eliyê Herîrî, Feqiyê teyran, Melayê Bateyî wek hemî helbestên hozanên wê demê li gora wezna 'erûzê li gora pîveka 'erûzê hatine nivîsîn. Wê wextê adet û tore wusa bû. Ne tenê Kurd hozanên Farisî,

Tirkî û Osmanî jî û hozanên Erebi jî xwe helbestên xwe bi wezna 'erûzê dinivîsîn. Vêca helbestên A. Xanî evên xeyn ji "Mem û Zînê" bi weznên cure cure hatine nivîsîn, yek ji wan helbestan di sala 1919'an da di kovara Jin da derketiye ew bi weznek hatiye nivîsîn:

"Da bizanî herkesek mîmarê dîwarê xwe ye" wezna wê:

Fa'îlatun, fa'îlatun fa'îlatun fa'îlun e. Vêca hin helbestên dî jî hene li ser hin wezn û kêşeyên dî hatine nivîsîn. Lê ku em bî ser "Mem û Zînê" di wê da E. Xanî wezneka wusa bikar aniye ku kêh hozan karîne bi kar binin, ew jî pîrr kurt e: Mustefîlatun mustefîlatun:

"Ez mame di hikmeta Xwedê da": Mustafîlatun mustafîlatun. Vêca di vir da jî hunermendiya Ehmedê Xanî derdikeve meydanê ku bi kêşeyeka weha kurt karîye dastanek çêke, ne ku tenê helbestek, kitêbek, binivîse, ew jî hunermendiya wî a tanga bilindtirîn nîşan dide.

Îcar beşê diduwan jî ew bû ku rûmeta wê di edebiyata cihanê da û ciyê wê çiyê? Divê ku mirov bextreşiya gelê Kurd li vir jî bîne ber çavên xwe ku esereka wek "Mem û Zînê" dastaneka weha ji aliyê hunerî û edebî ve ewqas rûmetbilind bi zimanê dinyayê. Îngilîzî, Fransîzî, Îspanî û Almanî zimanên ku bi sed milyonan pê xeber didin nehatiye wergerandin, nehatiye naskirin û ji aliyê edebiyatanên dinyayê ve rûmeta wê nehatiye pîvan ciyê wê nehatiye kifş kirin gelo ew dikeve kîja katagoriyan, mirov dikare bide ber kîjan eserên klasîk ên dinyayê. Ji ber ku gelê Kurd bindest bûye nikariye dastana xwe ya ewqas rûmetbilind bi dinyayê bide naskirin. Ji ber vê yekê tiştê ku em bêjin gellek mixab in tenê dîtînen me ne, em nikarin bêjin ku wek rexnegirên filan milletî jî gotine. Lê em hêvîdar in ku di

pêşdemê da "Mem û Zîn" bi gellek zimanan bê wergerandin û di nava klasîkên dinayayê da ciyê xwe bigre. Lê wek dîtina xwe ez dikarim bêjim ku "Mem û Zîn" di nava klasîkên dinayayê da mirov dikare bide ber Şehname Firdewsiyê Îranî. Bi naveroka xwe mirov dikare bide ber eserên Şekspîr, Romeo û Juljet, Hamlet jî yan Otello jî, lêbelê ew eserên Şekspîr ku em qala wan dikin em dizanin ku nesir in, wezna 'erûzê di wan da tune. Wextê ku em li "Mem û Zînê" dinêrin bi wezna 'erûzê bi hunermendiyeke weha mezin ku hatiye nivîsîn êdî em mecbûr in ne ku tenê ji aliyê naverokê ve bigirin destê xwe lê ji aliyê awa û şeklê ve jî bigirin destê xwe. Em dikarin bi edebiyata rojhilat a klasîk ra qiyas bikin ku di nava edebiyata rojhilata klasîk da jî esera herî naskirî Şehname Firdewsî ye. Mirov dikare "Mem û Zînê" hem bi naveroka xwe û hem jî bi awa û şeklê xwe wek Şehname Firdewsî esereka weha girîng, klasîk û hêja ye bibîne û hêvî bike ku di nava eserên cihanê da ciyê xwe bigire.

Armanç: Mamoste ez cardin dixwazim dagerim ser kêş û weznê, Bazil Nikîtîn di cihêkî pirtûka xwe ya bi navê "Kürtler" de dibêje: "Ehmedê Xanî di berhemeke xwe de ferhengek ji bo bingehê wezn yan kêşeya helbesta Kurdî daniye". Gelo haya te jê heye ku ev berhema wî kîja ye?

M. E. Bozarslan: Ez bawer dikim ku di wir da şaşfamiyek çêbûye, lewra Ehmedê Xanî bingehê kêşeya helbesta Kurdî dananiye. Berî wî Melayê Cizîrî hebûye, berî wî Eliyê Herîrî hebûye, berî wî Feqiyê teyran û gelekî dî hebûne. Yanî bingeh ne ku Ehmedê Xanî daniye, lê Ehmedê Xanî tiştêkî wusa kirî-

ye ku wan nekiriye. Wan tenê helbest nivîsiye lê Ehmedê Xanî dastaneka helbestkî nivîsiye, dastaneka menzûm nivîsiye. Îcar mesela ji ferhengê qesta wî belkî Nûbihara Piçûkan be ku ferhengoka Erebi Kurdî ye.

Kuştina Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî...

Armanç: Mamoste pirsra din bêguman eger wek ku te jî got bextreşiya me tunebûya wê ev pirs jî tunebûya, wê bersîva vê pirsê jî tunebûya. Lê wekî ku tu jî dizanî niha bi Kurmançî bi kêmanî bi sê alfabeyan tê nivîsandin, alfabe ya bi tîpên Latîni bi tîpên Erebi û bi tîpên Kirilî. Dema gotin tê ser van berhemên me yên klasîk yan yên kevîn, hinek dibêjin: "guherandina herfên berhemên klasîk ku bi alfabe ya Erebi hatine nivîsandin hem qetilkirin û kuştina wan berheman bixwe ye û hem jî qetilkirin û kuştina nivîskarên wan e. Li gor wan dema tu Ehmedê Xanî yan Melayê Cizîrî yan Feqiyê Teyran bi herfên Latîni dixwîni hingê neku tu E. Xanî yan M. Cizîrî dixwîni, lê tu, tiştêkî din dixwîni". Dîtina te li ser vê yekê çi ye?

M. E. Bozarslan: Carekê yanî ew tiştê ku dibêjin: "qetilkirin" ew jî xwe nayê qebûl kirin, ev îthameka pîrr giran e.

Vêca divê ku em berî her tiştî realist bin, rastbîn bin, rastiya welatê xwe rastiya gelê xwe bibînin, rastiya me îro ew e ku beşê mezintrîn li Kurdistanê ku Kurdistana jorîn e nikare bi tîpên Erebi bixwîne û binivîse. Yanî di Kurdistana jorîn da kesên ku bi tîpên Erebi bikaribin bixwînin û binivîsin mirov nikare bêje: "ji hezarî jî ne yek in" belkî ji çend hezaran yek bikre binivîse û bixwîne. Eger

"Divê di navbera şexsiyet û hêzên Kurdan de hevkarîyeke baş hebe"



Firat Cewerî (Xwedî û Berpirsiyarê Giştî yê NÜDEMê)

Digel ku 300 sal di ser nivîsandina Mem û Zînê re derbas bûye jî, di rewşa kurdan de ji bilî guhertinên civakî ku ji derveyî îradeya wan bûye, tu guhertinên mezin çênebûne.

Heta mirov dikare bibêje ku piştî avakirina Cumhûriyeta Tirkiyeyê rewşa kurdan xerabtir bûye. Bi riya qedexekirina zimanê kurdî û înkarkirina îdentî-teta kurdan, kurd jî "ezîtiya" xwe hatine bidûrxistin. Ji bilî ku ji bo yekîtiya kurdan nebûna tradisyoneke dewletî roleke mezin û berbiçav dilîze, rola herî mezin ji aliyê dewletên dagirker ve têtê listin. Bêşansiya kurdan ew e ku kurd di navbera çend welatan de perçe bûne û ev yekahî jî ji bo yekîtiya wan

her dem bûye astengeke mezin. Ger em di dîroka nêzîk de li sebebên neyekbûna her perçeyî bi serê xwe bigerin, em ê bibînin ku ji xeynî sîstema feodalîzmê û berberiyên eşîrî, berberiyên îdeolojî jî bo yekîti û hevkarîya kurdan bûye astengeke mezin. Di dema hişyarbûna kurdan ya herî gurr de, pirsên îdeolojîk û çînî derketin pêşiya hîsên milî û menfeetên neteweyî.

Gelo ger 300 saliya Mem û Zînê têketa salên 1970, 75, 79'an wê kurdan mîna

îro Ehmedê Xanî û Mem û Zîna wî pîroz bikirana? Bersîva min bi xwe "na!" ye. Lê ger ku îro kurd li mezinekî xwe û li fikrên wî xwedî derdikevin, tê wê maneyê ku êdî baweriya kurdan bi wan tê û ev baweriya han jî wan dajo ser yekîti û hevkarîyekê. Îro her kurd, her partî û organîzasiyoneke kurdan, nêrîn û îdeolojiya wan çî dibe bila bibe, di bin siya Ehmedê Xanî de dilê wan ji bo eynî dozê lêdide. Ev jî yekîtiyekê wêdetir, nîşana berbihevhatinekê ye, ji hîsên nostalgîk wêdetir, ji bo pêşerojê

rohnî şiyarbûna ramana neteweyî ya modern e. Ancax kurd li ser hîmê nêrîn û ramaneke weha bikaribin werin ba hev. Erê, ez nabêjim "bibin yek". Ji ber ku yekîtiyê nedurust dikare welêt û hemwelatiyan bibe helakê. Lê hevkarîyeke baş ya di navbera şexsiyet û hêzên kurdan de wê hêviya kurdan ya çilmişî geş bike, û hêviya geş dê zincîrên zingargirtî yê koletiya sed salane biqetîne û kurdan bi lez ber bi azadiya wan ve bibe.



300 saliya "Mem û Zîn"

mirov sînor dayne ber wergerandina tîpan, mirov bêje "bila eserên kurdiyên kilasîk ji tîpên Erebi neyên wergerandin bo tîpên Latîni ma- na ev e ku panzede pîst milyon însanên Kurd ji eserên klasîk bê par bimînin, mirov dixwaze nehêle ku ew "Mem û Zîn"ê bixwînin, ew helbestên Melayê Cizîrî bixwînin yan helbestên Feqiyê teyran bixwînin. Berî ku em munaqêşe bikin ka tîpên Erebi li gor zimanê Kurdî ne yan na di vê em li vê rastiya xwe binêrin, îro li Kurdistana jorîn, panzde bîst milyon însanên me îhtiyaca wan heye ku edebiyata xwe ya klasîk bixwînin. Çawa wê bixwînin? Divê ku em wergerînin tîpên

Latîni ku em wê îmkânê ji wan re çêkin, rastiya rewşa me, me mecbûr dike ku em vê wergerandîne çêkin, eger rewşa Kurdistanê, rewşa dused şal sêsed sal berê bûya û tîpên Latîni nehatina qebûl kirin, tîpên Erebi hakim bûna li herderê Kurdistanê, hemî rewşwenbîrên Kurd hemî xwendayên Kurd di dibistanên Kurdistanê da zimanê Kurdî bi tîpên Erebi bixwendana, hingê ji xwe îhtiyacek weha çenedibû, lê belê em dibînin ku rewş ne wusa ye. Ev ji aliyê piratîk ve, ji aliyê zaniyarî ve ji wextê em li meselê dinêrin em dibînin ku zimanê Kurdî zimanek ji Hindûewrûpî ye. Alfaba Erebi ji alfaba zimanekî Samî ye. Nimûneyeka pir ber çav heye, di Jînê da derketiye, di sala 1919'an da di jimareya 20'î da ragîhanek derketiye dibêje ku, hin xwendevanên me peyvika jîn jin dixwînin û ji me dipirsin dibêjin: "We çima ev nav li kovara xwe daniye?" "Em çawa

bikin, eger zimanekî Arî bi kirasekî alfaba Samî bê naskirin û bê nivîsîn ancax ewqas dibe". "îbret bibinin" eynî weha dibêje; Ev jî nîşanî me dide ku di eslê xwe da ji aliyê zaniyarî ve, ji aliyê filolojîk ve mirov li meselê binêre alfaba Erebi li zimanê Kurdî tam nayê. Alfaba Erebi ji bo zimanê Erebi hatiye çêkirin, lê zimanê Kurdî zimanekî Hindûewrûpî ye. Îcar hin peyvîkên Erebi, kelîmên Erebi ku ketine zimanê Kurdî nivîsîna wan bêguman zor e, zehmet e, lê ji bo xatîrê ku ew peyvik bi hêsanî bi zimanê Erebi bîn nivîsîn mirov nikare 15-20 milyon însanên Kurd ji edebiyata wan a klasîk bêpar bihêle. Ji ber vê yekê jî ez wê dîtîne rast nabînim û qebûl jî nayê kirin.

Dewlet; sînor, al, leşker e, yan.....?

Armanç: Mamoste em niha jî li ser "Mem û Zîn"ê bixwe û li ser bîr û baweriyên Ehmedê Xanî mesajên E.Xanî ku xwestiye di "Mem û Zîn"ê de pêşkêşî Kurdan bike, rawestînin. Dîtinêk heye ku dibêje: "Ehmedê Xanî di esasê xwe da ne nasyonalistekî Kurd bûye lê yên li pey E. Xanî hatine ew bi vê mebestê bi kar anîne, wek Hecî Qadirê Koyî Xanî dema dibêje: "dîn û dewlet" mebest ji dîn refaha li dinya dîn e û mebest ji dewletê jî ne dewleteke Kurdî ye, lê refaha li vê dinyayê ye. Baweriya te çi ye li ser vê dîtîne?

M.E. Bozarlan: Dîtina hin însanan li ser "Mem û Zîn"ê weha yan weha ye ew karê wan e, lê di pêşkêşiyê da jî li ser daxwaz û mesaja A. Xanî dîr û dirêj ez sekinî me û min nivîsiye ku E. X. hozanekî Kurdê pêşîn e, herweh Kurdekî pêşîn e ku ji bo gelê Kurd azadî, serxwebûn û dewletek xwestiye. Wextê em li beşê pîncanê "Mem û Zîn"ê dinêrin em vê daxwaza A. Xanî

bi awayekî zelal û vekirî dibînin.

"Ger dê hebûya me padîşahêk Laîq bidiya Xwedê kulabek ta'yîn bubûya ji bo wî textek Zahîr vedibû ji bo me bextek Hasîl bubûya ji bo wî tacek elbette dibû me jî rewacek

Xemxwarî dikir li me yetîman Tînane derê ji dest leîman Xalib nedibû li ser me ev Rûm Ned'büne xirabeyê di dest bûm Mehkûmûelyî û se'alîk Mexlûb û mûtî'ê Tirk û Tacîk"

Van malikan wextê mirov dixwîne, mirov dibîne ku E. Xanî ji gelê Kurd ra padîşahêk xwestiye. Di wê dewrê da rejîmên Komarî hêj nehatibûn sazîkirin. Li her derê dinyayê qîral, hukumdar, padîşah mîr û evên weha li ser kar bûn.. Ji ber wê yekê A. Xanî jî li gora rewşa wê demê û li gora rewşa welatên di jî gelê Kurd ra padîşahêk xwestiye, eger padîşahêk me hebûya, bi wê jî qîma xwe neaniye, eger textekî wî padîşahî jî hebûya, eger tacekî wî padîşahî jî hebûya hingê dibêje: Wê em ji destên leîman ji destê çavbirçiyên, bêeslan derxistina, wê xemxwarî li me yetîman bikira. Di vir da padîşah sîmbolek û nîşanek e ji bo dewletekê. Padîşah dewletekê îdare dike, padîşah li ser çi textî rûdinê? Li ser textê dewletê rûdinê, taca dewletê dide serê xwe. Ev hersê unsur yanî tac û text û padîşah, dewletê temam dikin. E. Xanî di şexsê padîşahêkî li ser textê xwe û xwedî tac jî gelê Kurd ra dewletek xwestiye, dewleteka serbixwe û her weha gelê Kurd jî ber ku bê dewlet bûye. Eger dibêje:

Padîşahêk me hebûya Xalib nedibû li ser me ev Rûm Nedibûna xirabiyê di dest bûm Mehkûmûelyî û se'alîk



M. L. Bozarlan: "Le dîtinêk mi ne ew e ku zimanekî Kurdî ye klasîk be ye u zimanekî Kurdî ye modern be ye." (Foto: Armanç)

Mexlûb û mûtî'ê Tirk û Tacîk" em bûne mûtî'ê wan. Eger padîşahêk me hebûna em ê nebûna mexlûbê wan me yê ji wan re stuyê xwe xwar nekira. Mana vê ev e ku dewleta me jî wê hebûya, dewleta wan nedikarî bihata welatê me bigirta. Ji vê mirov bi awayekî pir vekirî fam dike ku E. Xanî ji Kurdan ra dewleteka serbixwe xwestiye, îro û wê wextê piçek diguhere, lewra îro rejîmên demokratîk hene, rejîmên komarî hene, lê li gora wê dewrê E. Xanî padîşahêk xwestiye û di bin hukmê wî padîşahî da dewleteka serbixwe jî bo gelê Kurd xwestiye. Vêca bi wê jî qîma xwe naniye E. Xanî Kurdê pêşîn e ku sînorê Kurdistanê nîşan daye. mesela dîsa di beşê pîncan da dibêje:

"Bifikir ji Ereba heta ve gurcan Kurmancî ye bûye şubhê burcan" Ji Ereba heta Gurcan, heta Gurcîstanê, yanî ji welatê Ereban heta welatê Gurcan, Mana vê çi ye? Mana wê ev e ku ev welatê Kurdan e, ev ji bo Kurdan welatek e nîştîmanek e. Vêca bi vî awayî hem dewlet xwestiye û hem bala Kurdan kişandîye ser welatê wan. Ey Kurd welatê te ji welatê ereban hata welatê gurcan e, ji Erebiştanê heta Gurcîstanê ye. E. Xanî dewleta bi mana hebûn refah jî bikar aniye E. X. ne ku neaniye. Ew jî lazîm e çunkî, yanî dewletaka mirov hebe, mirov dixaze ku di nava wê dewleta xwe da di refahê da jî bijî.

"Yekîtiya Kurdan jî demên buhurî zêdetir di bin talûkeyê de ye"



İbrahim Guçlu (Siyasetvan)

Di 300 saliya Mem û Zînê de pîrsa li ser yekîtiya Kurdan hatiye pîrsîn, di demek balkêş de tê pîrsîn. Lewra li başûrê Kurdistanê şerê navxwe û êrîşa PKK'ê di yekîtiya Kurdan de wek talûkeyeke mezin dom dike. Ehmedê Xanî, dema ku pirtû-

ka xwe ya qiymetbilind Mem û Zîn nivîsandibû, Kurdistan di navbeyna du împaratoriyan xurt; Osmanî û Sefewî de beş bûbû. Li ser axa Kurdistanê dewletên piçûk piçûk "mîrnişîn" dijiyan.

Ehmedê Xanî di dema Mem û Zînê de hebûna dewleteke Kurd diparêze. Dewleta ku diparêze, dewleteke milî nîne. Lewra di wê gîhaneyekê de pêvajoya dewletên milî li Ewrûpayê jî dest pê nekiribû. Ji bo vê yekê jî, di pirtûka xwe de behsa xulamtiya Ereba, Ecem û Tirakan ji bo Kurdan dike. Ew jî diyar dike ku Ehmedê Xanî dewleteke Kurd ya bi şiklê împaratorî difikire. Ehmedê Xanî, di dewletnebûna Kurdan de

nebûna yekîtiya Kurdan berpirs didît.

Di 300 saliya nivîsandina Mem û Zînê de rewş çi ye?

Kurdistan çar beş e û miletê Kurd xwediyê dewletê nîne. Kurdan hem nikarî ji gîhaneyeke împaratoriye û hem jî gîhaneyeke dewletên milî îstifade bike. Ev yek di pîrsa dewletbûna Kurdan û yekîtiya Kurdan de jî pîrsgirêkeke gelek mezin e.

Sê beşên Kurdistanê di bin hukmê dewletên kolonyalist de ne. Başûrê Kurdistanê, niv azad û rizgar e. Dîsa li vê beşê, yekîtiya Kurdan jî, bi şerê navxwe û bi êrîşa PKK'ê di bin talûkeyeke mezin de ye. Li bakurê Kurdistanê, bi taybetî deh sa-

lên dawiyê ew siyaseta bi destên dewleta Tirk û PKK'ê ve hatiye meşandin, yekîtiya Kurdan hem ji aliyê civatî, hem ji aliyê siyasî û him jî ji aliyê aborî ve, perçe perçe bûye û rewşeke ji berê xirabtir derketiye holê. PKK her demê amade ye ku êrîşî hêzên din yê bakurê Kurdistanê bike. Li başûrê rojavayê Kurdistanê, bi destê PKK'ê û dewleta Sûriyeyê piraniya Kurdan yekîti û xebata xwe ya demokratîk, siyasî û çandî ji bîr kirine, berê xwe dane xeyalan. Li rojavayê Kurdistanê jî, di nav Kurdan de yekîti û lihevkiirineke maqûl, dostane û siyasî nîne.

Di encamê de mirov dikare bibêje ku bîr û raya îdeolojîk jî, ji bo ku yekîtiya Kurdan pêk

neye. bûye sedemeke girîng.

Yanê tablo qet xweş xuya nake. Sedemên vê tabloyê zêdetir girêdayî Kurdan e. Ew jî di kultûra me ya civatî û siyasî de bi cîh bûne. Pêwûste kultûra me ya siyasî û civatî bê muhasebekerin.

Ji bo yekîtiya Kurdan, bi giştî utopya û xeyalên xweş pêwîst in. Lê belê ev utopya û xeyal, divê Kurdan ji realizmê dûr nexe. Ev dem dema dewletên plûralîst, federatîf, demokratîk hevdem e. Divê li gor vê yekê nêrîn, stratejî, helwest û siyaseta bîn diyarkirin.



300 saliya "Mem û Zîn"

yan ji ya bi mana refah?

M. E. Bozarslan: Mirov nikare bêje ku, kîjan ji wan girantir tê. Mirov dikare weha îzah bike, E. Xanî ji gelê Kurd ra dewletek xwstiyê padîshahek xwestiye, serxwebûn xwestiye di nava wê dewletê da ji ji gelê Kurd ra refah xwestiye hebûn xwestiye serwet xwestiye, jiyaneke xweş xwestiye. Ji xwe di "Mem û Zîn"ê da ji ev tê ber çavan; wextê ku di despêka çiroka "Mem û Zîn"ê da salixê "Mem û Zîn"ê dide, bi nasandina mîrê Botan ku dest pê dike di beşê heştan da ji wê heta paşiyê dewleteka serbixwe tîne ber çavan û gelê ku di nava sînorê wê dewletê da ji dijîn gelekî di nava hebûnê di nava dewleta bi mana serwet û refahê da dijîn, taswîr dike. Lê amanc û daxwaza E. Xanî ew bûye ku gelê Kurd ji wek eceman wek Osmanîyan ku ji wan re gotiye Rom, xwedî dewlet be. Vêca tiştêkî di ji ku gellek balkêş e û di pêşkêşiyê da ji min gotiye, em pirr baş dizanin ku di dinyayê da bir û baweriya neteweyî, bir û baweriya milletbûnê cara pêşîn bi şoreşa Firansîzan dest pê kiriye û hatiye dinyayê û berê li Ewropa paşê li welatên di ji belav bûye. Berî 94 sal şorişa Firansîz

"Ez mame di hikmeta Xwedê da Kurmanc di dewleta dinê da

Aya bi çi wechî mane Mehrûm?

Bil-Cumle ji bo çî bûne mehkûm?"

Di vir da dewlet bi mana hebûn e, lewra yek dewleteka dinê tune ku em bêjin di nava wê dewleta dinê da çima mehrûm mane? Kurd çima ji wê hebûn û serweta dinyayê mehrûm mane, çima bêpar mane?

Arman: Bi ya te kîjan daxwaz li ba Ehmedê Xanî girantir e? yanî ya bi mana dewleteke Kurdî ku tu dibêji dewlet di şexsê padîşah û text û takekê da sînor kiriye,

E. Xanî qala milletbûn û fikra neteweyî kiriye û ji gelê Kurd ra dewletek daxwaz kiriye. Yanî însanên Kurd wek milletek qebûl kiriye, mesela sebebê ku kîtêba xwe bi Kurdî nivîsiye di beşê şeşan da îzah dike weha dibêje,

"Da xelk nebêjtin ku Ekrad Bê me'rifet in bê esil û binyad Enwa'ê mîlêl xwedan kitêbin Kurmanc tenê di bîhesêb in".

Yanî ji bo ku xelk nebêje milletên di hemî xwedan kitêb in, Kurd tenê bêpar in, min rabû ev bi Kurdî nivîsî. Di vir da tiştê ku em li ser bifikirin ev e ku gotiye: "enwa'ê mîlele" mîlel peyveke Erebi ye piraniya millet e, yanî milletên di neteweyên di. Wê wextê kesî qala millet nekiriye E. X. li vir kelîma millet bikar aniyê. Ji vir jî em dibînin ku E. X. çiqas pêşiya xwe dîtiye çiqas dûrbîn bûye. Yanî hem di beşê şeşan hem jî di beşê heftan da pirr bi awayekî zelal derdikeve meydanê ku ji Kurdan ra dewletek xwestiye û di nava sînorê wê dewletê da azadî xwestiye hebûn xwestiye refah xwestiye, jiyaneke xweş xwestiye.

Arman: Mamoste "millet" nikare hingê bi mana "ûmmet" be? Çimkî li gor hingê di nav kitêbên Erebi de bi gellek maneyan hatiye, wek ku hinek dibêjin bimana "ummet" e, hinek dibêjin bi mana "millet" e, hinek bi mana neteweyî ku vêga em dibînin, bikar tinin û gelekî din.

M. E. Bozarslan: Belê, li ser maneyê gellek tişt tîne gotin rast e, feqet li vir wextê ku em li vî babetî dinêrin û di vî babetî da em vê peyvikê digirin destê xwe em dibînin ku E. Xanî bi mana netewe bikar aniyê. Yanî dibêje enwa'ê mîlel, eger mexsed jê ûmmet be ûmmeta îslamê yek bû ji xwe, wê bi gota ummeta îslamê kitêbê wê hene çima yê Kurdan tinin, eger mexsed ummet be zaten Kurd jî tabî'ê wê ummetê ne. Nexwe di vir da bi mana millet bi kar aniyê, li vir derdikeve ku mexseda wî neteweyên cure cure, wek Tirk, Ecem, Erebi, Gurcî û evên di ne.

Cizîra Botan paytext e?

Arman: Hê ku em li ser behsa welat û millet û dewlet in ez li vir dixwazim pirsekê bikim. Di pêşgotinê de te nîşan daye ku Xanî hem dewleteke Kurdî salix daye, û hem jî Cizîra Botan wek paytexta wê, qebûl kiriye. Gelo Xanî ji ber ku bûyer li wir qewimiye ew der hilbijartiye yan jî ji ber ku li gor şert û mercên hingê Cizîra Botan ji wan bajarên Kurdistanê yê din hê layiqtir bûye bo paytaxtê loma ew nîşan daye?

M. E. Bozarslan: Bûyer carek bi rastî li wir qewimiye yan neqewimiye ew mirov qutt û birr nikare tiştêkî bêje. Lewra ji ber ku çirokeka efsanehî ye dîtinek heye dibêjin "bi rastî Zîn jî hebûye Memê jî hebûye li cizîrê bûne". Dîtnek jî heye ku dibêjin; "Di eslê xwe da tiştêkî weha ne ku li Cizîrê hebûye, ew çiroka Memê Alan hebûye çirokeka efsanehî ye, Xanî ew çirok aniyê kiriye kirasekî ber çav û li Cizîrê nîşan daye." Lê her çî be jî tiştê girîng ev e ku Xanî Cizîrê di çirokê da û di Kurdistanê da wek merkezek nîşan daye. Bi dîtina min Botan û Cizîr jî berê ve merkezen gellek girîng bûne ji aliyê çandeyî, ticarî, îdarî ve bûne weha wek sembol û nîşan di nava Kurdan da, lewra dewleteka Botan a serbixwe xurt û jêhatî hebûye. Mîrê Botan bûye sembolek ji bo şîyanê, ji bo dewlemendiye, Cizîra Botan jî hem merkezeke çandeyî bûye hem merkezeke siyasî bûye û di eynî wextê da jî ticarî bûye. Îcar cîyê Botan û Cizîrê jî di merkeza Kurdistanê da bûye, yanî tesîra çandeya Ereban, Tirkan, Eceman dîr bûye, ji ber van sedem, li gora dîtina min E. Xanî Cizîr bi zanîn û bi têgihîştin Cizîr wek serbajarê dewleteka Kurdî a xweser bijartiye.

Kurd axa, Kurmanc gundî û şex in

Arman: Tevî ku te berî niha jî piçekî qal kir lê pirseke me ya cihê hebû li ser maneyên

"Kurd" û "Kurmanc" ên di "Mem û Zîn"ê de, hinek dibêjin E. Xanî Kurd tu cara bi maneya netewê Kurd yan milletê Kurd bikar neaniye. Wextê E. Xanî dibêje "Kurd" bi maneya axa, beg, mîr û eşîret bikar aniyê, herweha dema ku gotiye "Kurmanc" jî bi maneya gundî û cotyar bikar aniyê, ne bi maneyeke din. Tu çî dibêji?

M. E. Bozarslan: Dîtina min ne wusa ye, ez wê dîtine rast nabînim û qebûl jî nakim; E. Xanî wextê ku gotiye: "Kurd" û "Kurmanc" qesta wî milletê Kurd e, yanî îro em dibîjin netewe wê wextê "Kurd" hatiye gotin, "Kurmanc" hatiye gotin. E. Xanî ku gotiye milelên di yanî di nava wan milletan da milletê Kurd bûye. Mesela wextê dibêje:

"Da xelk nebêjtin ku Ekrad Bê me'rifet in bê esil û binyad Enwa'ê mîlêl Xwedan kitêbin Kurmanc tenê di bîhesêb in"

Em dibînin ku Kurd wek milletek dane ber milletên di. Bila xelk nebêje ku milletên di bi kitêb in Kurd bêkitêb in, mexsed ji viya ne ev e ku axa û şexên Kurdan bêkitêb in, eger wusa ba wê bigota bila xelk nebêje ku axa û şexên Ereban ya xud axa û şexên milletên di, yan axa û şexên Eceman, Tirkan kitêbên wan hene lê ên me tinin. Yek jî wek min got, dema sînorên Kurdistanê nîşan daye, gotiye:

"Bifikir ji Erebi heta ve Gurcan Kurmancî ye bûye şubhê burcan"

Wextê bêje Kurmancî tenê di vir de axa û şex tinin, millet hemî heye, axa jî hene, şex jî hene lê millet heye. Yanî welatek nabe welatê şexan û axan, welat welatê milletek e. Li cîyek di ji di destpêka beşê 11'an da ku li wir Newrozê dide naskirin, E. Xanî pirr peyveke balkêş bikar aniyê weha dibêje:

"Dastana beyana Newroza Sultanî Tesmiyeyî mewsimê surûr û şadîmanî Bi mersûmê qedîmî Kurdistanî"

Yanî pîrozkirina Newrozê li gora mersûm û adet û toreyên qedîm ên berê ên Kurdistanî. Li

vir Kelîma Kurdistanî bikar aniyê ku di Kurdistanê da Newroz berê çawa hatiye pîroz kirin xwestiye qal bike. Ê di welatek da tenê axa û şex Newrozê pîroz nakin, millet pîroz dike, axa û şex jî dikin lê millet jî dike: Îcar qeste ji kur derdikeve? Yanî eşkera gotiye, Kurd, Kurmanc bi mana millet daye ber milletên di. Gotiye: eger padîshahek me hebûya, padîşahê kê padîşahê milletê Kurd, yanî qest millet e, qest koma însanan e însanên Kurd e, bêguman di nava wan da axa jî hebûne şex jî hebûne, mela jî hebûne, nexwendî jî hebûne, cotkar jî hebûne, şivan û gavan jî hebûne, di nava milletek da her celeb însan hene, Ehmedê Xanî bi tevayî qest kiriye.

Xwenda û nexwenda

Arman: Li gor dîtina hinekan E. Xanî "Mem û Zîn" ji bo grubek elît, mîna mîr, axa, beg, şex, mele û feqiyên wê demê nivîsandiyê. Ji ber ku Cotyar, feqîr û hejarên yan jî Kurmancên wê demê ne xwende bûn, nikaribûn binivîsinin ji ber wê yekê jî "Mem û Zîn" bi tenê ji bo vê tebeqa elît hatiye nivîsandin. Li ser vê yekê dîtina we çiyê? Yanî cihê di "Mem û Zîn"ê de heye ku E. Xanî diyar kiribe ku ez vê "Mem û Zîn"ê bi tenê ji bo axa û beg, mîr, şex û mela dinivîsinim? Cotyar û gundiyên Kurdistanê, neaniye ziman yan daxwazek ji bo wan nekiriye?

M. E. Bozarslan: Ez vê dîtine jî rast nabînim, E. Xanî "Mem û Zîn" ji bo gelê kurd nivîsiye, ji bo hemî Kurdan nivîsiye û ji gotinên wî jî pirr bi awayekî vekirî ev derdikeve meydanê. Mesela wextê ku di beşê pêncan da qala bindestiya Kurdan kiriye pesnê Kurdan jî daye, weha gotiye:

Her mîrekî wan bi bezlê hatem Her mîrekî wan bi rezmê Rustem"

Yanî mîrên Kurdan şibandine bi Hatem ku ewqa cuwamêr in, ewqas çavfire ne, mîrên Kurdan jî giş şibandine bi Rustem. Wextê weha be mexseda wî ne ev bû

Halim Can (Rojnamevan)

"Tîfaqa civakî misogeriya yekîtiya neteweyî ye"

Li gel ku Ehmedê Xanîyê nemir di berhama xwe ya bêhempa "Mem û Zîn" de li ser yekîtiya Kurdan rawestiyaye û piştî 300 salan jî hîn ev yekîtiyê bi ser neketiye. Heta yekîtiya Kurdan çenebe xelasbûna me jî ne mumkun xuya dike.

Sebebê neyekbûna Kurdan divê meriv di strûktûra civata Kurdan, hişarbûna neteweyî û kamilbûna hêz û partiyên Kurdan de bigere.

Ji ber sebebên dîrokî û civakî Kurdan hîn qonaxa

xwe ya netewebûnê temam nekiriye. Ev netemambûna neteweyî û paşdemayin astengên mezin derdixin pêşiya hêz û rêxistinên Kurdan ku ew nikarin yekîtiya xwe ava bikin.

Berî her tiştî yekîtiya Kurdan girêdayî tîfaqa civakî Kurdan e. Îro di navbera terefên cûda yê civaka Kurdan de aşî saz nebûye. Axa li hember gundî, burjûwa li hember karkir, bajarî li hember gundî, eşîrek li hember aşîreke

kin, partiyek li hember partiyekê din, mamoste li hember telebe, bav li hember law in û meriv karê vê listeyê dirêj bike. Di civateke weha bê tolerans û bê demokrasîyê de, tenê bi yekîtiya hêz û partiyên Kurdan yekîtiya Kurdan pêk nayê; çimkî hêz û rêxistinên Kurdan li ser esasekî bingehîn yê civata xwe nehatine avakirin û dîrê civatê ne. Herçiqas ew li ser navê îdeolojiyên cûda hatine damezirandin jî lê rastiya wan ji îdeolojiyên ku ew tîne, dîr in. Ne hêzên sosyalîst bi kar-

kirên Kurdistanê re tîkiliyê xwe hene, ne jî hêzên liberal û muhafezekar tîkiliyên wan bi çîna ku ew jê tîne re hene. Piraniyê wan wek grûbên îdeolojîk mane. Kesên hêz û partiî ava kirine jî piraniya wan telebe û rewşenbîr in ku ew jî temami jî çîna û tebeqeyên gundîtiyê tîne. Ji bo wê jî, ew piranî bî îstîkrar in û di xebatê de berdewamiya wan tune.

Îro piraniya terefên cûda yê civata me hîn jî menfeetên xwe di rizgarbûna Kurdistanê de nedîtin; gelekê wan li derveyî sa-

heya xebatê ne. Heta burjuwaziya me jî ji bo bazara xwe xebatê nake sermiyanê xwe dibe metropolê.

Ji aliyê din jî ber ku stratejiyêke muşterek di navbera hêz û partiyên Kurdan de jî nîne û partiyên ku li Kurdistanê şerê çekdarî didin ji ber jeo-polîtîkiya Kurdistanê tîkiliyên xwe bi dagirkerên Kurdistanê re çêdikin û pir caran ev tîkîlî dibin asteng ku ew yekîtiya xwe ya neteweyî ava bikin.

Ji Civata Kurd û hêz û partiyên Kurdan re tekamul divê.



300 saliya "Mem û Zîn"

ku tenê mîrên wan weha ne, mîr weha ne mêr jî weha ne; qesta wî yanî bi giştî rewşa Kurdan bûye. Îcar mesela ku gundiye Kurdistanê, nexwendî bûne, ew ne di destê E. Xanî da bûye. E. Xanî pirtûka xwe jî gelê Kurd ra nivîsiye, gotiye Kurd, gotiye Kurmanc, gotiye mîrên Kurdan, gotiye, welatê Kurdan jî ereban heta Gurcan Kurmancî ye, gotiye Newroz li gora adetên qedîmên Kurdistanî hatiye pîroz kirin. Di vir da giş hem welêt hem gel û netewe aniye ber çavan, lê li derê îrada wî bûye ku di nava milletê Kurd da hin kesên hindik xwenda bûne û rewşenbîr bûne, rew-

şenbîrên wê wextê jî mela bûne, şêx bûne, feqî bûne hin esilzadeyên Kurdan hebûne. Îro jî em dibînin ku însanên me yên nexwendî hene ku tu "Mem û Zîn"ê bidî wan nikarin bixwînin, tiştê jê fam nakin, lê mirov nikare bêje çima ku rewş weha ye pirtûkek ku bê nivîsîn jî elîtan ra tê nivîsîn. tiştêki wusa tu ne, E. Xanî pirtûka xwe jî gelê Kurd ra nivîsiye.

Em jî karin vî tiştî li ser Şehname Fîrdewsî jî bêjin. Wextê Fîrdewsî Şehname jî gelê Ecem ra, jî gelê Faris ra jî Îrana kevn ra nivîsî gelo di Îrana we demê da jî çendan çendên Farisan dikarin esereka wek Şehnamê bixwînin. Di nava wan de jî tenê elîtek dikaribûn bixwînin, eger mîrov li gora wê mentiqê hereket bike diviya ku Fîrdewsî Şehname nenivîsiya, na wî baş kir ku Şehname jî gelê xwe re nivîsî, êdî li gora pêşketina çandeyî û rêgihaştinê gel zêdetir dikare jê îstîfade bike. Mîrov dikare bişîbîne bi baxçeyek, baxçeyê gundek ku deh kes dikarin jê fêki biçinin binin bixwun, bîst kesên di nikarin biçin. Mana wê ne ew e ku ev baxçe ne e wan e jî, baxçe e wan e jî lê wextê rewşa wan musaîd bû, dest da, ew dê jî biçin para xwe jê binin.

Ehmedê Xanî û zaraveyên Kurdî

Armanç: Mamoste Xanî carna di "Mem û Zîn"ê de peyva Kurd bikar aniye û carna jî ya Kurmanc bi kar aniye. Wek ku tê zanîn vîya peyva "Kurmanc" bi tevayî jî bo beşekî Kurdan ku bi zaravayî Kurmancî diaxivin tê gotin. Gelo Xanî hingê bi çi mebestê di hinek cihan de Kurd û di hinekan de jî Kurmanc bi kar aniye?

M. E. Bozarlan: Bi dîtina min di wê demê da ferqa zarawayan di nav Kurdan de girîng nehatiye dîtin. Peyvika Kurd jî

Kurmanc jî ji bo hemî Kurdan bi kar aniye, carna Kurd gotiye carna Kurmanc gotiye. Lewra jî vir em fam dikin.

"Bifikir ji Ereb hetta ve Gurcan Kurmancî ye bûye şubhê burcan"

Wextê ku jî Ereb heta Gurcan be li jêrê Kurdistanê ew herêmek jî wê û berjor jî herêmek din dibînin, di wê herêma da zarek tê bikar anîn ku Soranî yan Kurdiya Jêrîn jê ra dibêjin, zaravayê jor ra jî Kurdiya Jorîn yan Kurmancî tê gotin. Di dema Xanî da bi dîtina min ferqek weha nehatiye dîtin, yanî Xanî wextê gotiye "Kurd" jî, wextê gotiye "Kurmanc" jî qesta wî temamê Kurdan bûne, jî ber ku gotiye: "ji Ereb hetta Gurcan" Kurmancî ye bûye şubhê burcan". Kurd jî Kurmanc jî bi yek manayek bikar aniye jî bo gelê Kurd û lewe ma jî di serê beşê 11'an da wextê ku qala "Mem û Zîn"ê kiriye gotiye "Mersûmê qedîmê Kurdistanî"

Armanç: Bi helkeftina sêsed saliya "Mem û Zîn"ê di 21 meha nehan ya sala 1993'yan de jî bo hemû vîxistinên Kurdên siyasî çandeyî û komelî re we nameyeke vekirî şandibû. Ew nameya we di hinek kovar û rojnemeyan de çap bû, lê tiştê herî girîng di wê nameya vekirî da ew daxwaza we bû ku we di 21 adara sala 1992'yan de jî UNESCOyê re nameyek nivîsandîye, we daxwaz û pêşniyar kiriye ku UNESCO sala 1995'an wek sala E. Xanî û "Mem û Zîn"ê îlan bike, ragihîne û bi vî awayî jî UNESCO piştgiriya xwe ji bo milletê Kurd û edebiyata Kurdî pêşkêş bike. Niha em di sala 1995'an de ne. Em dixwazin bizanibin we jî bo wê daxwaza xwe ji UNESCO yan jî vîxistinên Kurdan yê siyasî, çandeyî û komelî bersîvek girt yan na?

M. E. Bozarlan: Berê ez li ser nameya UNESCO piçek bipeyvim, wek te jî got û li ser nameyê jî heye, 21'ê adara 1992'yan roja Newrozê min ew ji UNESCO ra nivîsî û min ji UNESCO daxwaz kir ku piştgiriya xwe ji gelê Kurd û çandeya gelê Kurd ra nişan bide û bi wî awayî îbat bike ku UNESCO vîxistinêka çandeyî ya hemî gelan e, ne ku vîxistinêka çandehî ya gelên xwedî dewlet e û min daxwaz kir ku sala 1995'an bi navê sala Ehmedê Xanî û "Mem û Zîn"ê ragihîne. Min qîma xwe tenê bi şandina vî namê neanî, min jî hin vîxistinên nivîskaran û hin sazgehên zaniyarî wek unîversîtan jî tika kir ku ew jî ji UNESCO ra name binivîsin û piştgiriya daxwaza min bikin. Ji hin ciyan name hatin nivîsin. Ji Komela Nivîskarên Swêd, Komela Nivîskarên Norwey, Komela Nivîskarên Danmarkayê, Komela

Nivîskarên Awustralyayê, Unîversîteya Uppsalayê, niha ev tînen bîra min û çendên di jî jî hin welatên di jî ji UNESCO ra name nivîsîn û piştgiriya daxwaza min kirin, lê gelek mixab in UNESCO qet bersîv jî neda. Bi rastî min texmîn dikir ku UNESCO wê bersîveke weha nede lê digel wê yekê jî min xwest ku ez ji UNESCO vî daxwazê bikim. Bi dîtina min sebebê ku UNESCO daxwaza me qebûl nekir û bersîv jî neda ev bû: Ji ber ku dewleteka me Kurdan tine, temsîlkarên me li ba UNESCO tinin, me nedikarî bi riya dîplomatîk em vî pêşniyaza xwe bigînin UNESCO. Herweha herçar dewletên ku Kurdistan dagir kirine, endamên UNESCO ne, bêguman ew dewlet nahêlin ku UNESCO jî bo gelê Kurd biryareka weha bide. Ji aliyekî di ve jî bi dîtina min di ba UNESCO nexwest bersîveka neyîn jî bide lewra eger bigota na diket rewşeka wusa ku dijê çandeya gelê Kurd radiwesta, nexwest xwe tîxe wê reşê jî bi wî awayî hiskut bû bersîv neda. Sal û niv heta 21'ê îlona 1993'yan ez li bend bersîva UNESCO bûm, êdî min hêviya xwe birî min zanî ku wê UNESCO bersîv nede. Min jî vîxistinên Kurdan re nameya vekirî nivîsî û daxwaz ji wan kir ku ew bixwe biryareka weha bidin û sala 1995'an bi navê sala Ehmedê Xanî û "Mem û Zîn"ê ragihînin û pîroz dikin.

Li ser pîrsa ku bersîva min dan yan nedan, jî vîxistinên kurdan min bersîvek nexwestibû, ne pêwîst bû jî ku ez bersîvek bixwazim, lewra min tenê pêşniyaz kir, anî bîra wan ku salvegera nivîsîna "Mem û Zîn"ê bûyereka gellek girîng e, min daxwaz kir ku biryar bidin sala 95'an bi navê sala Ehmedê Xanî û "Mem û Zîn"ê ragihînin û pîroz bikin. Lê digel ku min bersîv nexwestibû jî, yek vîxistinêka Kurd bersîv da, merkeza Komkarê ku li Almanyayê ye, demek paşê bersîv dan gotin li ser daxwaza te me biryar daye ku em sala 95'an bi navê sala E. Xanî û "Mem û Zîn"ê ragihînin û pîroz bikin. Min nexwestibû jî wan bersîv da jî ber vî yekê jî bo hemî vîxistinên Kurdan û jî Komkarê jî spas dikim ku bersîv da û nivîsibûn li gora biryara ku di bersîva xwe da jî sala 95'an bi navê sala E. Xanî û "Mem û Zîn"ê ragihandin. Di meha Nîsanê di wê bernameya pîrozkirinê da, ez çûm Almanyayê li 11 bajarên Almanyayê û li bajarê Swîsrayê li ser "Mem û Zîn"ê min Konferans da û min "Mem û Zîn" da naskirin. Herweha şeva Newroza 1995'an yanî Adara çûyî jî ez hatim vewendin, ez li bajarê Kolnê beşdarî Newrozê bûm.

Armanç: Mamoste gava mirov herdû çapên Mem û Zînê dide berhev ku meriv dibîne ku

TO UNESCO
Place Fontenoy
75007 Paris
France

Mehmed Emin Bozarlan
P O Box 3050
750 03 Uppsala
Sweden

21 March 1992

I am a Kurdish writer from northern Kurdistan (the Turkish part of Kurdistan). I have been in Sweden for 13 years. My field of work, as a Kurdish writer, is the Kurdish language, Kurdish literature, Kurdish folklore, Kurdish history, and reworking ancient Kurdish texts and journals. As it was impossible for me to continue to write and publish my books in Turkey, I was obliged to flee to Sweden. Here in Sweden I have the peace and freedom to write and publish my Kurdish books. To the present I have published 20 books in Sweden. These include 5 books in the traditional Kurdish "fable" series, and 5 in the traditional Kurdish "anecdote" series. In addition I have republished my Kurdish primer, "Alfabe", first published in Istanbul, Turkey in 1968 and immediately banned by the Turkish regime. This is the first Kurdish primer ever published in northern Kurdistan or Turkey.

Besides these books, I have transcribed the famous Kurdish cultural journal "JIN" ("Life") from the Arabic script into the Latin alphabet, and republished it in 5 volumes (with commentary). This journal was published in 1918-1919 in Istanbul, which was at the time the capital of the Ottoman empire.

I have also transcribed and republished the first ever Kurdish journal "KURDISTAN". This journal was first published in 1898 in Cairo, Egypt and continued to appear in Switzerland and England until 1902. I have republished it in 2 volumes (with commentary).

The Kurdish national epic "Mem u Zin"

I am planning to rework and republish the famous Kurdish national epic "MEM U ZIN", meaning "MEM AND ZIN". Like all epics, this epic is an oral, traditional narrative. It was narrated in songs and tales throughout Kurdistan, and particularly in Kurdish villages. The great 17th century Kurdish writer and poet Ahmed-i Khani (pronounced in Kurdish as "Ehmede Xani") collected various versions of the epic among the Kurdish people and was the first to write it down in book form. He completed this in 1695.

My work with "Mem u Zin"

"Mem u Zin" was written in Arabic letters, this script having been used in the Kurdish language. In the contemporary world virtually no-one can read or write texts in this script in northern Kurdistan. This is why I transcribed the entire text of "Mem u Zin" from the Arabic to the Roman script, and published this in Istanbul, Turkey in 1968, along with my Kurdish

pêşgotina Mem û Zîna Kurdiya xwerû hatiye wergerandin gellek dirjîtir e. Gelo çima ev ferq di nav wan de heye?

M. E. Bozarlan: Bi rastî nivîsîna pêşkêşiyeka weha dirêj û fireh ji 1968'an ve jî bo min daxwazek bû. Di çapa 1968'an de ne mumkin bû ez xebateka weha li ser "Mem û Zîn"ê bikim û pêşkêşiyeka weha binivîsim û "Mem û Zîn"ê jî her alî ve bidim naskirin. Di sa em hemî rewşa qanûnên Turkiyê û tewrê rejîma Kemalîst ê di heqê gelê Kurd û zîmanê Kurd û çandeya Kurd da dizanin ku çiqas dijwar e. Ji ber wê yekê ne mumkin bû ku ez li Turkiyê xebateka wusa bikim, pêşkêşiyeka wusa binivîsim. Lê li Swêdê dema ez li ser "Mem û Zîn"ê xebitîm û ev azadiya ku qasek berê jî min qal kir bû li Swêdê min karî ez li vir wê daxwaza xwe bi cî binim. Min xwest ku ez "Mem û Zîn"ê bi xwendevanên Kurd û bi gelê Kurd bidim naskirin. Berî ku Xwendevan dest pê ke bi xwîne, xwendevan bizane "Mem û Zîn" çiyê û di "Mem û Zîn"ê da çi heye. Bi dîtina min "Mem û Zîn" xezîneyek e, lê di cîyekî girtî da ye. Vêca min xwest ku însanên Kurd berî ku têkeve hundurûyê wê xezîne wan mucweherên rûmetbilind ku di xe-

zîne da bi cî bûne bibîne. Yan jî min xwest ku ez rêberek bidimê, qilawuzek bidimê, ku bixwîne bizane çî li kê derê ye. Wextê ku têkeve hundur êdî serwest be, bizanibe di xezîne da ev heye. Bi wî awayî min xwest berî ku xwendevan dest pê bikeve ez pê bidim naskirin, bila di heqê wê da serwest be, bila di heqê wê da şarezê be, bila di heqê wê da rêgihiştî be, wextê ku bixwîne jê re biyanî nê. Êdî jî ber wê yekê min ev pêşkêşî ewqas dirêj kir û ewqas fireh nivîsî. Herweha ez weha fikirîm, herkes belkî nikaribe "Mem û Zîn"ê bixwîne, belkî "Mem û Zîn" negihîje destê her kesî, lê mesela pêşkêşiyeka weha dirêj bê nivîsîn û "Mem û Zîn" tê de bê nasandin dibe ku hin Kovar qala pêşkêşiyê bikin ji pêşkêşiyê parçe bigirin, bi xwendevanê xwe bidin naskirin. Bi wî awayî kesê ku "Mem û Zîn" negihîje destê wan jî bi alîkariya hin kovaran û bi alîkariya pêşkêşiyê wê bikarin, piçek nasbikin. Ji ber van herdu sebebên min pêşkêşî wusa dirêj û fireh nivîsî. Bi rastî "Mem û Zîn" xezîneyek e, pirtûkeka wusa ye ku mirov dikare bi sed rûpelan li ser binivîse.

Hevpeyvîn:

Emîn Narozi, Hesên Mizgîn û Remzî Kerîm



Mûrad Ciwan

Gava meriv li ser berhemên Ahmedê Xanî yên ku heta îro gîhaştine ber destê me radiweste, tê dîtîn ku ew, bi zanyariyeke kûr, bi berfirehî û piralîtiyeke gellek dewlemend û ciddiyeteke giran xwe noqî der-yaya pirs û pirsgrêkên welê dike ku felsefe û tesewwuf bi wan mijûl e.

Di warê felsefî de, dikare bê gotin ku filozof ew e ku di nav medrese'yên(ekolên) felsefî de yan medreseyeke felsefî ya xas bi xwe danîbe ku ji hemî medreseyên dîtir cuda be, yan jî rêberêkî medreseyeke felsefî yê welê be ku bi zanyarî û perspektîfên xwe, reng û dewlemendiyeke nuh anîbe nav wê medresê, ew pêşde biribe. Helbet meriv nikare Ahmedê Xanî filozofekî xwedan medreseyeke felsefî ya nuh hesab bike, hetta ji alî xala duduyan de jî, pesinandina Ahmedê Xanî bi navê filozofiyê ciyê munaqesê ye. Lê, ew zanebûn û kûrbûna ku di warê medresên felsefî û bi taybetî jî di yê felsefa Îslamî de bi Ahmedê Xanî re heye, wê munaqesê û pêşdehatina wî ya bi hostatî ya li ser pirsên felsefî û tesewwufî; li ser pirsên Xweda, alem, afirandina alemê an hebûna ezêlî û ebedî, dunya maddî û ya manewî, ruh û qalib, cennet û cehennemê; li ser insan, cin û melekên, li ser qeza, qeder, îrada kullî û ya cuzî, li ser heyata dunyawî û axretî, ya dînî, dunya zahîr û ya batî, murîdî, murşîdî, mer-tebe û derecên sulûkê, gîhaştina bal bi Xwedê û fenafillahiyê, li ser evîna heqîqî, ya mecazî, ya îlahî û gelek warên din, rexnekirinên wî yê hin medreseyên felsefî û h.w.d, meriv digihîne wê netîcê ku bi hêsayî bêje ku Ahmedê Xanî mutefekkîrekî payebilind e felsefî û tesewwufî ye. Di felsefa Îslamê de, di zanyariya Qur'anê de, di warê hedîs û sunnetên Hz. Muhammed û jiyana eshabê û tabî'ên wî, yê dîtir û tevayiya jiyana ehlê sunne de, di tarîxa jiyana xelîfe, îmam û ewliyan de, zanîn, hostatî, mîrxasî û serbestiya wî -ya ku ji vî zanyariya kûr tê-, di dema xwenê-zîkkirina ber bi van meselan de wî dike wekî teyrekî baz.

Bi taybetî gava em bînin bîra

Bîr û baweriyên Ahmedê Xanî yên felsefî û tesewwufî

xwe ku Ahmedê Xanî ev pirsên dînî, felsefî û tesewwufî bi zimanê Kurdî munaqesê kirine, di eserên xwe yê Kurdî yê hêja de ew neqîşandine û hûnandine, em ê çêtir tê bigihîjin ku di dîroka rewşên bîrî û bi taybetî ya felsefî ya civaka Kurd de xwedan çî qas cihekî giring e.

Berhemên Ahmedê Xanî yê ku fikrên wî yê dînî, felsefî û tesewwufî li ber meriv çêtir zelal dikin zêdetir her sê eserên wî ne ku em ê niha binav bikin; berî hemiyên helbet şahesera wî; Mem û Zîn tê. Pişt re heke di van waran de meriv Eqîda Îmanê û Nûbara Piçûkan jî hesab neke, meriv nikare bigihîje encameka zelaltir û temamtir. Esas Eqîda Îmanê, hema hema ji serî heta binî bersîvek e li hemberî bawerîya Mutezîlê, ku em ê pişt re firetir li ser vî aliyê wê rawestin. Helbet hin şîrên wî jî hene ku di wan de munaqeseyên li ser wan pirsgrêkên jorîn tên kirin.

Di hemî van pirsên felsefî û tesewwufî de, eşkere ye ku Ahmedê Xanî li ser xeta bîr û baweriyên îslamî yê ehlê sunne ye. Ew bi hemî awayî li ser xeta Qur'anê, hedîsên pêxember, tefsîr û rêçûnên xeta ku bi navê ehlê sunne tê naskirin dimeşe. Ahmedê Xanî, bi vî awayî dadikeve meydana munaqeseya afirîner û alema afirandî û wiha dibêje: Xwedê yek e, bê hevrê û heval e. Ji dayîkbûn an çêbûn, mirin, wendabûn ji bo wî nîne, ji ezel de ew heye, heta ebed de her hebe. Tu nimûne, tu nişanên ku wekî wî bin, tunene. Divê meriv çih û mekanan ji wî re hesab neke. Wî insan û hemî alem afirandine, ji bilî wî tu afirîner nînin.¹

Tişt bi delîl û "burhan" nabin "wucûb û îmkân"; yanî wacibî û mumkîniya xwe nadin îsbatkirin. "Wacib yek e ew jî Zatê Kibrîya ye, mumkin pir e cem'ê masîwa ye."

Li vir divê em pêşiyê hinekî li ser peyvên "wucûb", "îmkân", "wacib", "mumkin" û "masîwa" rawestin û pişt re vegerin ser peyvên "delîl û burhan". "Wucûb", pewîstiya, bivê nevetiya tiştêkî, an karekî ye. "Wacib" jî bi maneya xwe ya felsefî, tişt, kes an hebûneka pêwîst(bivê nevetî) e. "Wacib" di felsefa Îslamîyê de bi mahna pêwîstiya hebûna Xwedê tê îfadekirin. Xwedê "wacib" e,

bê qeyd û şert hebûna wî bivê nevetî ye. "Masîwa" bi maneya hemî tiştên ji bilî Xwedê ne, yanî Xwedê ne tê de hemî tiştên dî ne. "îmkân" nepewîstî, ne mecburiyetî ye, "mumkin" jî di vî maneyê de tişt an hebûnên ku ne bivê nevetî bin, hebin jî bibe, nebin jî, hebûn û nebûna wan di çarçewa taqetê de be, ji bo wan tê îfadekirin. Li vî derê li gorî bîr û bawerîya Îslamê çawa Xwedê "wacib" e, hemî masîwa, yanî hemî alema afirandî jî "mumkin" e.²

Gava Ahmedê Xanî dibêje: tişt bi delîl û "burhan" nabin "wucûb û îmkân"; yanî ku kî wacib e û kî û çî mumkin in, bi delîl û belgeyan nayên tesbîtkirin, ew mewqîfê xwe yê medresa felsefî (ya ku ew tê de ye) diyar dike û li hemberî medreseyeke felsefî radiweste. Di dinya Îslamê de medreseyek felsefî hebû ku jê re "Medresa Meşşâî" dihate gotin. Filozofên wekî Yaqûb ibn Îshaq El Kindî (m.873) yê Ereb, El Razî (m. 923 yan932) yê Faris, El Farabî (m. 950) yê Tirkê ji Asya Navîn û Îbn Sîna(980, Buxara -1037) yê Faris, avakerên vî medresê bûn. Bi hin reh û rişên xwe, ew medrese, Arîstotî, Platonî û bi taybetî nuhplatonîya nava Îslamê bû. Çimkî wan bingehên xwe ji Arîstotî, Platon û nuhplatonîyan wergirtibûn. Wekî tê zanîn eserên filozofên Grêkî, berê ji Grêkî hatin wergerandin ser zimanê Suryanî, ji wir jî, pişt re hatin wergerandin ser zimanê Erebî û bûn çavkanî, bingeh an jî palpiştên esasî ji hin medreseyên felsefî yê nava civaka Îslamê re. Medresa Meşşâî yek ji wan bû ku bingehên fikrên xwe ji filozofên Grêkî wergirtin û xwestin van bingehên ber bi bîr û baweriyên Îslamî ve nêzik bikin, lihevhatinekê di navbera van herdû bawerîyan de pêkbînin. Çimkî bingehê felsefa Grêkî, li ser wê yekê hatibû avakirin ku alema heyî ji tunebûnê nehatiye afirandin lê ji ezel de heye û wê her hebe. Berê, wek heyûlakê; yanî kutleyeka bêşîkl a ne zelal bû, lê Aqilê Ewwel an Quwweta Mutleq, cara pêşin şîkl da vî heyûlayê û ew xist liv û tevgerê. Helbet ev, bi bîr û bawerîya Îslamê ya li ser hebûn û avabûna dunyayê, li hev nake, filozofên Medresa Meşşâî û pişt re yê hin medresên felsefî yê dinya Îslamî yê dîn jî ku raste rast an bi wasîte, kêman zêde, di bin tesîra felsefa Grêkî de mane, xwestine di navbera bawerîya Îslamî û felsefa Grêkî de bigihîjin nuxteyeke welê ku ciyê muşterekiya herduyan be.

Helbet ev behs behseka gellek fireh e û li vî derê bi dîr û dirêjayî em nikarin li ser vî behsê rawestin. Em ê vegerin nav hudûdên behsa xwe ya ku bi fikrê n. Ahmedê Xanî ve girêdayî ne. Wan filozofên dînyayê ku me navên wan li jorê anîn û pişt re hinên din jî,



Tirba Ehmedê Xanî

(ji arşîva Roja Nû)

wekî filozof muhawela wan ew bû ku felsefê esas bigirin û bawerîya dînî li gorî wê şîrovekin. Lê beşek ji alimên Îlmê Kelamê, bi eksê vî, bawerîya dînî esas girtine û delîlên felsefî ji bona vî baweriyê bikar anîne.³ Vî metoda ku filozof pê radibin metoda anîna delîlên mantiqî ne ku pê hebûna Xwedê, mesela peydabûn û hebûna alemê şîrovekin û bi vî awayî xwe nêzî Xwedê bikin. Ji vî metodê re metoda "el burhan" dihate gotin. A Ahmedê Xanî, gava dibêje: "Tişt bi delîl û burhan" nabin "wucûb û îmkân"; yanî wacibî û mumkîniya xwe nadin îsbatkirin", li hemberî metoda wan filozofan mewqîfê xwe diyar dike û ciyê xwe jî di nav ehlên Îlmê Kelamê de bi taybetî jî meriv dikare bêje ku di nava Medresa Eş'ariye de nişan dike. Li gorî Ahmedê Xanî, hebûn, yekbûn û afirîneriya Xwedê ne bi delîl û nişanan lê bi baweriyê dikare bê dîtîn. Ev dîtina dînê Îslamê ya xeta ehlê sunne ye ku pişt re hin ehlên tesewwufê jî ew mesele bi vî awayî şîrovekirine û gotine ku mirov ne bi çavên serî lê bi çavê dilî dikare hebûn, yekbûn û afirîneriya Xwedê bibîne û nezikî wî bibe.

Ahmedê Xanî wiha didomîne: Xweda afirînerê erd, asîman, cumle insan û cinan e. Wî dinya,

melek, hemî seyareyên (gezegenên) di fezayê de afirandin. Şîklê ku wî daye alemê jî, lihevhatîrîn şîkl e, di ciyê xwe de ye, ne zêde û beradayî ye. Xwedê, neh tebeqeyên asîmanan yê bi seyare û stêrkan dagirtî, stêrkên ronahî, birîqokî û yê reş û tarî, heft seyareyên mezin, şeş çîhet; yanî rast, çep, pêş, paş, ser û bin, çar enasîrên⁴ ku alema maddî ji wan hatine çêkirin; yanî av û ax û hewa û agir, hersê mewalîdên (yanî afirandiyên) ku bi xwe pir diwelidînin (yanî ji xwe dertînin yan jî ji wan dikare bê derxistin) yanî ax, asîman û kilîta deriyên erd û asîmanan, lewha mehfüz⁵, qelem⁶, erş⁷ û stêrkên rawestiyayî, heywan, hêşinayî, maden û erd; ev hemî ji tunebûnê afirandine, ne ku berî afirandina wî wekî "heyûla" alem hebûye, na alem ji tunebûnê ji alî Xwedê hatiye afirandin.⁸ Li vî derê jî Ahmedê Xanî li hemberî wan filozofan radiweste ku dibêjin alem wekî heyûla ji ezel de hebû, bes Xwedê wekî mîmarekî şîkl da wê alemê û ew çerxa liviyana wê zivîrand. Li gorî Ahmedê Xanî, Xweda ne avaker, lê afirînerê (xaliqê) alemê ye, alem jî hatiye afirandin (xuluqandin) ne ezêlî ye û ne jî ebedî ye.

Alem, insan, tiştên diyar, hemî "mumkin" û "masîwa" yê ku hene, hebûn, jiyân û tevger û tevdira wan bi Xwedê ye. Ew e ku feyz û fermanê dide baxê afirandî. Bi emrê wî yê



Cizîra Botan û Mem û Zîn
(Çavkani: Abdulkarîm Yusuf, Hunerê Tabloyên Şerefnamê, Weşanên Jina Nîz)

ku got "kun"⁹ yanî "bibe", du alem peyda bûn. Armanca Xwedê ji vê afirandinê însan bû. Însan bi xwe alemek ji van herduyan e ku bi emrê "kun" hema bû (fe kane). Însan, rastiyeke bêşik e ku hem fermana Xwedê ye hem jî yê ku Xwedê afirandiye. Li gorî alemê, afirandina însan her çî buyereka piçûk dixuyê jî di eslê xwe de mexsed û maneya vê afirandinê gellek kûr e. Di vê afirandinê de hemî tiştên diyar û yên sirrî, hemî serkeftin û kil û kêmasî diyar in. Însan bi xwe hem tarîti ye hem jî ronahî ye, her wekî ku Hz. Adem jî Xwedê hem nêzik e, hem jî dûr.

Di alemê de çî hene, hemî tabîê însana ne. Ev felekên muezem, melekên birûmet, ev dinyaya mezin a gerok, ev erd tevî her çar enasîrên xwe, ew hemî tiştên ku ji van enasîran peyda dibin, ev nîmet û tiştên nefîs, ev xurek û lixwekirin, ev qas tiştên xwestî û hinde daxwaz, evên dilbijiyayî û evandî, ev heywan û maden û hêşînahî, meqsed û mirad; hemî jî bo însanan li kar in, ji bo wan berheman didin. Xwedê, ev nîzama xweş û ronak ji bo însanan tertîb kiriye.¹⁰

Xwedê alema afirandî hem jî bo xwe kiriye perde hem jî kiriye nîşana hebûna xwe. Wî xwest ku hebûn û rindiya wî derkeve meydanê, wê xezîneya veşartî eşkere bibe û hebûna afirîner jî yên afirandî diyar bibe.¹¹ Lê

ji ber ku nedibû ku bes jê re ayîneyek hebe, diviya bê nivîsandin û tescîl bibe, berî her tiştî ewî qelem afirand, piştî jî ruh û aqilê ewwel (ê ku "hêza fahmkirinê û rêgihîştinê ye ku di dema afirandinê de bi mirov re tê afirandin û mirov digel wê tê dinyayê"¹²)

Ev hersê tişt, yanî qelem, ruh û aqilê ewwel, ew tişt in ku berî hemî tiştan hatine afirandin. Her çendî jî her yekê ji wan re jimarek hebe jî divê mirov wan wekî sê tiştên ji hev cuda hesab neke; ew tim bi hev re ne, wek tişteki bi hev ve ne, yekbûyî ne.¹³

Berî her tiştî, ji rindiya ebedî, yanî jî Xwedê ronahiyekê çirûsk da û bû maneya Muhemmed. Bi emrê wî Xwedayê ku hay ji hemî tiştên nedîtî heye, ev ronahî bû çavkaniya feyza alema nedîtî. Ruh ji maneya pêxember çêbûn her wekî ku şekir ji nebatê çêdibe. Mahneya pêxemberî, çî bextiyar, çî jî bêyom û gunehkar, bû eslê esîl ê hemî jîndaran. Hemîyan jî wê xuyabûnê şax avêtine û hemî bi wê şad bûne.

Hêja ne erd û ne jî asîman hebû, ew serwerê hemî pêxemberan bû. Felek jî bo wî hatin afirandin, ew secdeya melekên ku ji bo Adem Pêxemberî hat kirin, esas jî bo wî bû. Weqta ku ew rehmeta hemî alemê bû, hê Hz. Adem di nav av û heriyê de bû. Ew wekî pencereyekê bû ku meriv tê re rindiya Xwedê didît û her wiha ew wekî buhur, best an pirekê bû di navbera Xwedê

û hemî alema afirandî de.¹⁴

Li gorî Ahmedê Xanî, Xwedê ew ronahî ye ku di sipehîtiya ruyê dildaran de ye û ew agir e ku di dilê aşiqê jar de ye. Ew çirayek e ku ne ji cinsê ronahî û agir e, rojek e ku bi ronahiya xwe hatiye perdekirin. Ew, defîneya nav sirrên alemê ye û xezîneya ku ji navê mirov eşkera dibê.¹⁵ Bi tevayî çî pêşîn û çî paşîn, însan hemî çî mu'mîn û çî kafir jî Xwedê ra bi wî awayî bûne xuyangê ku ew di wan de veşiriye. Bêyî rindiya Xwedê hebûna wan nîne û ne ji ronahiya wî be ew xuya nabin. Hikmet ew e ku ew hem veşartî ye hem jî eşkera ye. Qudret ew e ku ew hem wenda ye hem jî hazir e. Her çî jî wî re cî û mekan nînin jî, ew bi wî awayî di wan de bicîh bûye ku xwedêgiravî hemî cismek in; laşek in, ew jî ruh e yan jî hemî bajarek in ew jî tê de xanek e.¹⁶

Îrada kullî û ya cuzî

Di mesela îrada Îlahî de Ahmedê Xanî di Mem û Zînê de bi wê baweriyê derdikeve pêş ku hemî tişt û hemî buyer bi îrada Xwedê pêk tên. Xwedê, Şerîn li Perwîzî kir şekir û ji çavên Ferhadî hêstirên xwînî anîn. Wî, Leyla li serê Qeyîs kir bela, bi îrada wî Ramin li ber Weysî çimiyâ. Bes ew dizane ku ji bo çî Yûsufî nîşanî Zuleyxayê da û Wamiq bi çî awayî gîhande Ezrayê. Wî şêxê ku ji xwe ra pêncî hec hilbijartibûn li pey keça kufarî dîn kir. Wî, sorgul ji stîrî peyda kirin û bilbil bi hezar qatî dîn kir. Ronahî dan şemalan û pilpilkên perwane bi ronahiya wan şemalan sohtin. Tişt li hemberî hev, li dijî hev û newekhev çêkirin ku wan bide berhev.¹⁷ Welhasil her tişt bi destê Xwedê ye:

Tûtî bi xwe ma şekir dirêjin

Herçî dibihên ewî dibêjin

(Papaxan ma qet ji ber xwe ve diaxivin, çî dibihîzin wê tekrar dikin.)

Xwedê şahê meqsûd û miradê dilan e, lê kesê ku bixwaze ew bi xwe wî gumreh dike, jî rê derdixe û dibe hîlakê (tedullu men teşa)¹⁸.

Her kesê ku wî divê bibe delaletê, piyên wî bi zulf û xalan qeyd û bend dike. Her kesê ku wî bîne ser riya rast, jê re bibe palpişt û alîkar, hema wî dibe wî meqamê diyar ê bilind û eger xizmetkarek be jî wî dike xudanxizmetkar.¹⁹

Di mesela îrada îlahî û îrada yên afirandî de, yanî îrada kullî²⁰ û îrada cuzî²¹ de, Ahmedê Xanî di Mem û Zînê de hinde pêş de diçe ku hema hema bi her awayî xwe dispêre îrada kullî. Di vê babetê de mînaka wî ya herî bi cesaret û ya pêşdeçûyî ew mîsal e ku muhaseba wê vekê

dike ku ji bo çî Xwedê bê sûc û gunehkarî, Şeytanî jî ber dergehê xwe diqewirîne:

Xwedê, hê ku Adem Pêxemberî jî wî re secde neanîbû, ew kir qiblegeh û merivê ku divê jê rê secde bê kirin. Wî Îblîsê feqîr ê bêcîneyet ku ew qas alikariya Xwedê gîhaştibûyê, ji bo ku Xwedê taqet dabûyê her rojê bi hezaran zikir û taet dikir. Çima ku wî jî bilî Xwedê jî kesî ra secde nebîr, Xwedê ew jî ber dergehê xwe qewirand, qehra Xwedayî ew kir mehkûmê agirê ebedî.

Loma jî kesî hay ji hikmeta Xwedayî nîne, yên ku ilim û îrfan telebkirin jî, yên sahibê fehîm û rêgihîştinê jî dawîya dawîn gotin ku "Ya Rebbî! Me tu neniyaşî."²²

Di Mem û Zînê de, di beşê berî ye dîmahîkê de, ku bi tevayî li ser tesewwuf û terîqet û sulûk û îrsadê ye, Ahmedê Xanî disa li ser pîrsa îrada kullî û îrada cuzî radiweste, lê li vê derê bi zelalî îrada cuzî jî tîne pêş. Wiha dibêje Ahmedê Xanî: Jîrêderketin an jî qebûlbûna ber bi lutfê Îlahî, bi fazîletê yan jî bi zêdeçûn û şaşçûnê nabin. Yên ku her roj îbadetê jî Xwedê re dikin bi riyaekê diçin hîlakê û îsyankar bi duayekê jî gunehên xwe pak dibin. Alem esas wekî xiyalê zill(xeyala siyê)²³ e, riya rast û ya şaş bi xwe bi destê Afrîner e. Ew e ku dêmena xiyalê tîne û dixê perdeya jîrêderçûnê. Lê wî, cuzî îxtiyarî (îrada cuzî)²⁴ daye me, nefsa me ye ku bi hîle û dek û dolab e.²⁵

Di Eqîda Îmanê de jî Ahmedê Xanî li ser mesela îrada kullî û îrada cuzî radiweste, herçî di vir de jî dibêje ku îrada kullî qadirê û fermanderê hemî karan e û Xwedê çî teqdîr bike eger xerab û eger qenc, nabe ku mesûl bê ditin û muheqqeq sebeb û hikmetek di vê de heye jî, zelaltir dide diyarkirin ku Xwedê muxtariyetek jî daye mirovan. Li gorî Ahmedê Xanî, eger Xwedê bêguneh ceza bide me, helbet sebeb ew e ku dixwaze me terbiye bike, bîne ser edebê. Rewayê wî ye, wî heq heye ku meşaqetê bide afirandiyar. Eger ku ew zulmê jî bike, jê nayê pîrsîn ku çima, çimkî hemî alem û yên afirandî milkên wî ne, ew di milkê xwe de teserrufê dike. Her çî tiştê ku ji bo wî bikêrhatî ye li me ferz e ku em wî bicîh bînin, lê li ser wî ne ferz e ku ya ji bo me bixêr bicîh bîne. Egerçî ew bi xêr û şerran îrade dike jî, lê ne razî ye ku fê'la xerab pêşde bê. Bende, di kirina fê'la xwe de xwedan muxtariyet in, xwedan îradeyeka cuzî ne.²⁶

Di berhemên Ahmedê Xanî de dualîzm

Gava Xwedê alem; jî tiştên heyi yên ser ruyê erdê heta bigihîje însanan, jî tuneyîyê afirandî û jî nuh ve ava kir, hemî tişt li gorî sifet, kar û bikêrhatinê wan

cuda anîn wucûdê. Tiştên heyi hemî li gorî hev dan diyarkirin; tiştên zid li gorî zidbûna hevdu bi hev dan eşkerekirin. Ev erd û asîman, stêr û seyyare, milk û melek, ronahî û tarîti, kufr û îman, cennet û cehennem, sar û germ, ter û hişk, mîr û parsek, dewlemend û feqîr, ax û hewa, agir û av, şev û roj, sî û tav, cudabûn û xwe gîhandina hev, şahî û xem, mirin û jîyan, şahî û şîn hemî zidê hev hatine avakirin.

Însan jî bi wî awayî hatine afirandin ku, hin wekî ronahiyê ne, hin wekî agir in, hin helîm in, hin jî sert û dijwar in. Ev kesên sadîq, rast û xêrxwaz, ev kesên xêrnexwaz, xirab û rûreş, ev ehlên ezaban û cehennemê, ev ên layiqê cennetê û sewaban hemî ziddê hev in. Hikmeta vê lihemberîhevî ew e ku eger newekhevî, cudatî û pîrrengî nebîn, jî hev ferqkirin û nasîna tiştan mumkin nabe. Xwedê hemî tişt cuda û ziddê hev afirandine ku em wan nasbikin.²⁷

Li gorî Ahmedê Xanî, afirandina tiştên li dijî hevdu û hebûna wan bi hev re, ji bal Xwedê ve pêwîst hatine dîtîn, divê em jî redda hebûna ziddan a bi hev re red nekin. Çimkî roja ku wî evîn da evîndaran, hingê wî rik û kîn da yên hemberî evîndaran. Xwedayî ev tişt ji tuneyîyê anîn hebûnê, çimkî ew pêwîstê hevdu ne, bê hev nabin. Çimkî evîndar sorgul in ew ji bo wan stîrî ne, ew xezîne ne yên din ji bo wan mar in. Gul bi serê stîriyan û xezîne jî bi maran tên parastin.²⁸

Pîrsa "ruh" û "beden"ê

Ahmedê Xanî li ser pîrsa ruh û bedenê jî rawestiyaye. Ew di Mem û Zînê de dibêje ku ruh ji maneya Pêxember Hz. Muhemmedî çêbûne, her wekî ku şekir ji nebatê (pincarê şekirî û qamişê şekirî) çêdibe.²⁹ Laş, ji alema dinyayî; ya maddî hatine çêkirin, lê ruh ji alema manewî ya Xwedayî hatine. Ruh û cesed, bi emrê Xwedê, bêyî ku bi dilê wan be, bi zorê bi hev re hatine yekkirin. Bedena ku ji alema maddî ya dinyayî hatiye, rûmetkefî ye, lê ruh ê ku ji alema manewî peyda bûye, çirûskdana rindiyê û spehîtiyê ye.³⁰

Ahmedê Xanî, di warê tîkiliya ruh û bedenê de, li ser pîrsên ci-guhaztinê; "tenasux"³¹ û "hulûl"³² jî rawestiyaye, wekî mutfekkîrekî ehlê sunne, her çend mu'cize û tecelliya ruh qebûl kiriyê jî, qebûl nekiriye ku ew dikare were wê manê ku meriv bibêje ruh hebûneke gerrok e, çewa miravî (ordek) di dema avjeniyê de xwe ji ciyekî noqî avê dike di bin avê re diçe û li ciyekî din derdikeve ser avê, ruh jî ji



bedenekê derdikeve, dikeve bedeneke dinê. Yan jî li gorî Qur'anê û hedîsên qudsî jî Ahmedê Xanî qebûl dike ku Xwedê ev alem afirand ku hemî mumkinat û masiwa hem bibin xuyangeha wî; nişana hebûna wî, hem jî perde û veşargeha wî, lê ew "hulûl"ê yanî teccesumkirina Xwedê di her tiştê afirandî de red dike. Teccesumkirina Xwedê bi wê manê ye ku Xwedê dikeve cismê kes û tiştan û bi wî awayî dîyar dibe. Di Eqîda Îmanê de dinivîse ku "tenasux" û "hulûl" ne mumkin in, loma jî yekbûna Xwedê bi cîsman re qebûl meke.³³

Di Mem û Zînê de jî Ahmedê Xanî baweriya xwe, bi zelalî li ser vê pirsê diyar dike. Gava Dayîn, Sîtî û sed xizmetkar, pêkve diçin zîndana ku Mem tê de ye, pêşiyê pirsê ji zîndanî yên hevalên Memê dikin ku gelo halê wî çawa ye. Kesên ku li gel Memê di zîndanê de girtî ne, wiha dibêjin:

Me dît ku ji alî dîwêr tîrêjekê ber bi serê Memê veda û ji serê Memê jî şewqek derket. Yek weka rojê û ya din weka hîvê bû, yan jî yek wekî zêr û ya din wekî zîvî bû. Ew herdu tîrêj ku gîhaştin hev, tavilê di nav hev de wînda bûn. Gava ku bi wê gihîştinê re ronahî ji hev girtin û bi eksa ronahiya hev xurt bûn, welê rohnî bûn ku zîndan li me kirin meydana gulşenê. Bi vî awayî Mem ji xwe ve çû û xwîna dilê wî bi der bû.³⁴

Li vê derê Ahmedê Xanî bi xwe derdikeve pêşiya xwendevanê Mem û Zînê û li ser vê mucîzê dîtina xwe pêşkêş dike:

Ey ew kesê ku çavê dilê wî vebûye! Tu tecellîya ruh înkâr nekî û fikir nekî ku ev hulûl (yanî mucsesembûna Xwedê di cismekî de) e, yan jî cîguhaztina ruhî ji bedenekê bo bedeneke din e. Her wiha tu zen nekî ku ev çîrok e, peyveka bêbingeh û pûç û vala ye. Xewna tu dibîni, bi vî awayî ye. Ew jî awayek ji dîtîne ye lê natemam e.³⁵

Ahmedê Xanî, li hemberî baweriya Mutezîleyê

Eqîda Îmanê ya Ahmedê Xanî ji bilî wan pirs û pirsgerêkên felsefî û tesewwufî yên ku me berê bahs kirin her wiha, bi naveroka xwe alîgirê ehlê sunne ye li hemberî medresa Mutezîle.

Mutezîle, medreseyeka felsefî ye ku di çarçewa Îslamê de di sedsala 8'an de ava buye. Ji fikrên Wasil bîn 'Etayî derketiye. Vê medresê, di çarçewa Îslamê de xwe sipartiye aqliyet û ilmîyetê. Mutezîle, ji alî mezhebên sunnî wekî mezhebêkî batil û jîrêder-

ketî tê qebûl kirin. Fikrên Mutezîleyan ên ku ji alî ehlê sunne ve tên redkirin dikarin di çarçewa pênc-şes esasan de bîn hejmartin. Ahmedê Xanî, di Eqîda Îmanê de li gel hin fikrên din cewaba van fikrên Mutezîleyan jî daye. Hin fikrên Mutezîleyan û bersîvên Ahmedê Xanî ev in:

Yek ji fikra Mutezîleyan ew e ku dibêje însan bi xwe, bi îrada xwe ya serbest kirinê xwe hildibijêre. Ew ne girêdayî bi îrada Xwedê, bi îfadeyeka din ne girêdayî bi qederê ve ye. Heke ne welê bûya divê ji ber karê(fê'la) xwe berpirsiyar nehataya dîtî. Piştî ku ji alî Xwedê ve tê cezakirin, mehna vê ew e ku wî hemî karên xwe bi îrada xwe kirine. Heke na, cezayê Xwedê, wê ne li gora mezinayî û edaleta Xwedê bûya.³⁶

Ev îddîa, li dijî bîr û baweriya Îslamê û bi eşkereyî li dijî Qur'anê ye. Çimkî bawerpêanîna bi qeza û qederê, bingehêkî esasî yê dînê Îslamê ye. Ahmedê Xanî jî bi vî awayî bersîva vê îddîayê dide: Bi hemî xêr û şerran Xwedê îrade dike, lê ew bi kirina fê'la şerr ne razî ye. Însan di kirina karê xwe de xwedan muxtariyet e, îradeyeka wî ya cuzî heye. Xweda ji ber îradekirina xwe, ne berpirsiyar e.³⁷

Li hemberî fikra Mutezîleyan a ku dibêje ger fî'lên însanan bi îrada Xwedê bin wê gavê dayîna ceza yan mukafatan ji alî Xwedê ve wê bêdaletî be, Ahmedê Xanî bi wî awayî radibe ku dibêje eger ew bêguneh ceza bide me, hikmet ew e ku ew dixwaze terbiye û edebekê bide me. Loma jî rewya ye ew meşaqetê bide xelkê. Ji ber qehr û xezêba xwe jî Xweda nikare berpirsiyar bê dîtî, çimkî, hetta eger zulmê jî bike divê ku em bizanin ew di mulkê xwe de teserrûfê dike, heqê wî ye ku wî çî bivê di milkê xwe de bike, kes nikare bêje ku "çima".³⁸

Xaleka din jî di fikrên Mutezîleyan de ew e, ku dibêjin; sîfetên Xwedê yên jê cuda nînin. Sîfet ji zatî cuda û bi serê xwe ne. Loma jî qebûl kirina sîfetan di zatê Xwedê de, yan jî zêdekirina wan li zatê Xwedê, tê wê maneyê ku mirov gellek xwedayan qebûl dike. Li gorî ehlê sunne, Mutezîleyî bi vî fikra xwe jî rasterast li dijî Qur'anê derdikevin, çimkî li gorî kalamên Xwedê bi xwe, erê zat û sîfet wekî hev in lê sîfetên Xwedê hene. Di vir de ferqa navbera Mutezîle û ehlê sunne ev e: li gorî ehlê sunne, Xwedê her tiştî dizane çimkî xusûsiyeta wî ya zanebûnê heye. Yan jî Xwedê her tiştî dibîne çimkî xusûsiyeta wî ya dîtîne heye. Lê li gorî Mutezîleyan Xwedê her tiştî dizane lê ne ku sîfetê wî yê zanebûnê

heye û her tiştî dibîne, ne ku sîfetê wî yê dîtîne heye, Heke mirovî got Xweda, mahna xwe her tişt. Îdî ne lazim e ku meriv sîfetan lê zêde bike.³⁹

Ahmedê Xanî, jî di vî babetê de fikra xwe bi vî awayî pêşkêş dike: Sîfetên seb'e ji bo Xwedê heft in: heyat, zanîn, şîyan (qudret), vîyan (îrade), kelam, bihîstin û dîtî. Wekî zatê hemî sîfetan ew, ezêlî ne; bê destpêk in. Ev sîfet ne zat bi xwe ne, ne jî ji zatî cuda ne.⁴⁰

Fikra Mutezîleyan yek jê jî few e ku dibêjin di navbera mu'mînî û kafiriyê de mer-tebeyek din jî heye ku ew jî fasiqî ye. Kesên ku gunehên mezin kirine ne kafir û ne jî mu'mîn in, lê fasiq in. Heke berî mirina xwe tobe bikin dibin mu'mîn û heke tobe nekin dibin kafir. Mutezîleyî jî vî derecê re dibêjin dereca navîn. Ehlê sunne li dijî vî baweriyê derdikeve.⁴¹ Ahmedê Xanî wiha dibêje: Musulman bi qetî û zînayê çu car kafir nabin û ebediyen di cehennemê de namînin.⁴² Yanî yên musulman ji ber van gunehên xwe yên mezin erê wê herin cehennemê, lê wekî kafiran ebediyen di cehennemê de namînin.

Prensîbekî din ê Mutezîleyan ew e ku ji bo Xwedê wacib e ku kesên gunehkar ceza bike û yên xwedan xêr jî xelat bike. Efû û bexşandin bes dikare di warê heq û huqûqê Xwedê bi xwe de were meydane. Yan na, heke bê gotin ku bende (qûl) di fê'lên xwe de ji bal Xwedê ve dikarin bîn bexşandin, ev, tê wê maneyê ku Xwedê di karê xwe de bêdalet e. Fikreka ne ber bi aqil ve ye ku mirov bêje ku Xwedê dikare wan kesan bibexşîne ku bi eksê emr û fermana wî kirine.⁴³ Ahmedê Xanî li hemberî vî fikra mutezîleyan radiweste û dibêje: Em kesên îsyankar ên ku me bêmriya Xwedê kiriye divê em zû tobe bikin ku em bîn bexşandin. Eger muessesa tobekirin û bexşandinê nebûna, wê guneh jî nebûna.⁴⁴

Mutezîleyî dibêjin ku, piştî qiyametê li wê dunyayê Xweda bi çav wê neyê dîtî.⁴⁵ Ahmedê Xanî, cewaba vî jî bi vî awayî dide: Çawa ku di şeveka sayî de heyva temam a çardeşevî ji meriv xweş tê dîtî bi wî awayî musulman dê Xwedê bi çavan bibînin.⁴⁶

Li nik Ahmedê Xanî Tesewwuf

Eser û belgeyên ku li ser jiyana û berhemên Ahmedê Xanî heta niha gîhaştine destê me, wê îmkane nadin me ku em karibin bibêjin ka gelo Ahmedê Xanî, qet ketiye jiyana xilwet û terîqetê û jiyaneke tesewwufî jiyaye an na. Lê ew,

di eserên xwe de di gellek ciyan de hem li ser tesewwufê, li ser softî, sulûk û murşîdiyê radiweste, hem jî di warê jiyana maddî û manewî û nêzikbûna ber bi Xwedê de, di warê rûmetbilindî, xêrnexwazî an jî rêderketinê de mutesewwufiya xwe jî derdixe meydane. Mem û Zîn ji aliyekî de beşekî wê⁴⁷ seranser li ser tesewwufê ye, ji aliyê din ve jî gellek beşên wê di mesela afirîner û jiyane de bi berpêçûnê tesewwufî dagirtî ne. Di Nûbara Piçûkan de hin beytên wî hene ku muhîm in ji bo bîr û baweriyên wî yên derbarê tesewwuf, softî û murşîdiyê. Her wiha şî'rên wî jî hene ku cih didin van pirsgerêkan.

Loma jî ihtîmala mezin ew e ku Ahmedê Xanî jiyana tesewwufî jiyaye û bûye xwedan terîqet. Li gorî qenaeta me ihtîmala herî mezin ew e ku Ahmedê Xanî di liqek ji wan liqên terîqeta Nexşîbendiyê yên pirtir nêzîkî û adabên ehlê sunne de bûye beşdar. Yek ji sedemên ku me digihînin vî qenatê ew e ku bîr û baweriyên Ahmedê Xanî tu caran (di meselên tesewwufî de jî) ji çarçewa ehlê sunne dernakevin. Ya din jî ew e ku divê em bibîrbînin ku ji ber şerê li hemberî Sefewîyan û ji ber qedexekirina hin medrese, mezheb û eqîdên dûrî mezhebên ehlê sunne ji alî Şexulîslam Ebû Suûd di sedsala 16'an de, terîqeta Nexşîbendî li nav Kurdan pirtir di rewacê de bû.

Yên ku meriv karibe agahdarî li ser jiyana tesewwufî û ya terîqetan a sedsala 17'an û bi taybetî jî ya dema Ahmedê Xanî ji wan werbigire dîroknişîvîs û gerokên Osmanî yên wê demê û piştî wê demê ne. Martin van Bruinessen di vî warî de navên Ewliya Çelebî, Katib Çelebî, Naîma, Uşaqîzade û Peçewî dide.⁴⁸ Yê bi firehî li ser jiyana tesewwufî a vî sedsalê rawestiyaye û navê terîqetan û ciyên tekyayên wan daye, Ewliya Çelebî ye. Seyahetnameya wî gellek aliyên tarî yên jiyana rojane ya dema wî ronî dike. Ewliya li tevayîya Kurdistanê; hem li nav wan navçeyên ku di bin desthilat û kontrola Îranê de bûn, hem jî li wan beşên ku di bin destê Împaratoriya Osmanî de bûn, geriyaye. Her bajarê ku çûyîyê, serî li tekye û mekanên terîqetên wê jî daye. Di Seyahetnamê de agahdariyên li ser tekye û zewiyên terîqetên softîyê cihekî giring û berfireh digrin.

Li gorî Martin van Bruinessen, agahdariyên ku Ewliya Çelebî li ser herêmên navîn û ên rojhilatê Tirkîye, Sûriyê, Îraq û rojavayê Îranê dide, eşkere dike ku di nav van herêman de li şes bajaran hebûn û xurtbûna Nexşîbendîyê diyar

dike. Martin van Bruinessen dinivîse ku hejmareka berbiçav a nifûsa wan bajaran Kurd bûn. Li bajarên ne-Kurd ên herêmê, Ewliya, navê terîqetên dîtîr aniye, lê qet behsa Nexşîbendîyê nekiriye. Helbet ev, nayê wê mahneyê ku ev terîqet hîç li wan bajarên din nebûn. Lê belê welê diyar e ku saxlemtir û rasttir dibe heke meriv bigihîje wê encamê ku ev terîqet li Kurdistanê ji hemû deverên din zêdetir naskirî û li ber çavan bûye.⁴⁹ Her wiha ev wê encamê jî dide ku terîqeta herî xurt a sedsala 17'an li Kurdistanê Nexşîbendîyê bûye.

Li gorî nexşeya(xerîta) ku Martin van Bruinessen li ber agahdariyên Ewliya Çelebî kêşaye, bajarên Kurdistanê û tekyeyên terîqetên ku li wan bajara ne, ev in: Diyarbekir; Nexşîbandî û hin terîqetên din ên biçûk, Cizîr; Nexşîbendî, Bedlîs; Nexşîbendî, Qadirî û hin terîqetên biçûk yên dîtîr, Wan; Nexşîbendî, Urmiye; Nexşîbendî, Meletiyê; Nexşîbendî, Qadirî, Bektaşî û hin terîqetên biçûk ên din.⁵⁰

Sedemekî din ê ku me digihîne qenaeta ku Ahmedê Xanî endamekî terîqeta Nexşîbendiyê ye, ew e ku ji ber zulma Sefewîyan û şerê Kurdan ê li hemberî wan, jiyana ehlê sunne û terîqetên ber bi vî ve hema hema bûn xusûsiyeten taybetî yên "millî" ên Kurdan û sembola liberxwedana wan a li hemberî Îraniyan. Esas meriv dikare bibêje ku Ahmedê Xanî bi vî xusûsiyeta xwe jî semboleka civaka Kurdan a wê demê ye.

Piştî vî muhawela agahdarî û şirovekirina li ser terîqetdariya Ahmedê Xanî, me divê em vegezin ser bîr û baweriyên wî yên tesewwufî.

Di beşên berê de jî me îşaret kir ku Ahmedê Xanî, Xwedê wek afirînerê yekta û bê heval û hemta dibîne ku hemî alema maddî û manewî afirandine û ev hem kirine xuyangeha xwe hem jî perdeya veşargeha xwe. Pirs ku hemî afirandî xuyangeha Xwedayê afirîner in, di tarîxa tesewwufê de ji roja derketina wê ya meydane û hetta îro bûye pirsêka esasî. Ev tefsîr, hema hema ji bal tevayîya mutesewwufan ve hatiye kirin û gellek şairan, şî'rên xwe bi vî dîtîne xemilandine; evîndarên xwe bi wî awayî teswir kirine ku goya, li wan dinîhêrin, rindî û ronahiya Xwedê tê de dibînin, heta hinekan bi vî tefsîrê evîndarên xwe danîne cihekî welê bilind ku secde ji wan re birine yan jî ew wekî kabeya xwe qebûl kirine. Tefsîreka bi vî awayî, gellek



caran di evîna navbera Mem û Zînê de, di malikên Mem û Zînê de ji aliyê Ahmedê Xanî ve jî tê eşkerekirin.

Her wekî ku di wî beşî de ku gava Mem di zîndanê de dimire û Zîn tê ser wî, ev yek bi hunermendiyeke bilind tê teswîrkirin: Zînê bang kir gote wî: "Qum ya ceseden nefextu fihî".⁵¹ Tîrêja peyva devê wê şepalê, berê xwe da serê dûyê mûmikê (yanî serê dûyê Memê mirî). Wî dûyî çirûsk ji tîrêjê ragirt, wê çirûskê ku qendîla qefesê dagirt, ew xilwetiyê di zikir da, vejîya, bi ruh ket û bi niyeta tewafkirinê rabû ser xwe. Berî her tiştî wî bi ava Zemzemê destnimêja xwe teze kir. Li meqam (qesd ji vê meqamê Hz. Îbrahîm e li Kabê) li ciyê nimêjê rawestiya. Ji bo maçikirinê enî gîhand cihê maçikirinê (qesd teşbîha bi Heceru'l Eswed e). Tewafek du kirin li dora Beytê (ango Kabê) Perwaneyê (minminîka ku li dora ronahiya lembe yan findê difire, dizîvire) perîkên xwe gîhandin donê findê (Li vir perwane Mem e û find jî Zîn e). Gava findê per li perwaneyê disotin, wan çend gotin ji hev re gotin. Perwanê got "tu xweş rêber î". Findê got "Tu jî dostekî hêja yî". Perwanê got: "Tu rênîşander î". Findê got "Tu yî ye ku jîyanê dide min". Perwaneyê got "Tu dilroniker î". Findê got "Tu sîneyan disojî". Perwanê got "Tu çaresaz î". Findê got "Tu dilgeşker î". Perwanê got "Tu padîşah î". Findê got "Tu qiblegah î". Perwanê got "Tu horiya Xwedê yî". Findê got "Tu ronahiya Xwedê yî".⁵²

Ev tefsîr di tarîxê de gîhaştîyê dereceyeke welê ku hin mutesewwuf (ên wekî Hel-lacê Mensûrî) gotine "Ene'l-Heq" Yanî, qesd kirine ku Xwedê bi her awayî di wan de teccesum kiriye û gava li xwe dinêrin, Xwedê di xwe de dibînin. Ahmedê Xanî di mutesewwifîya xwe de însanekî wiha ye ku ji mana eşkere ya Qur'anê û berpêçûna ehlê sunne derneketiye, loma jî ew li hemberî wê yekê derdikeve ku hin mutesewwif hinde pêşde diçin û dibêjin "Ene'l-Heq" Wî, bîr û baweriyên xwe yên di vî warî de di şîreka xwe de jî diyar kirine:

Ez çûme derê derê min dîtî ku Rûhullah

Têkda di musewver bûn hetta vinnihâlîn da


Wan cumle "en'l-Heq" got, min "Wahidê Mutleq" got

Saqî bixwe ez girtim camek meyê noşîn da

Meynoşî û serxweş bûm, fil-halî muşewweş bûm

Ez çar û neh û şeş bûm, min tekê bi balîn da

Çar û neh û şeş, hin sembo-



lên tesewwufa Îslamê ne ku maneyên wan ev in:

çar: bingehê avayî û hebûna hemî afirandiyên maddî, ku berê dihat bawerkirin ku yên afirandî ji çar tiştan pêk tên: ax, agir, av û hewa.

neh: Li gor Îslamê kainat ji neh tebeqan pêk hatiye.

şeş: Cardin li gor tesewwufa Îslamê afirandî, yanî hemî tiştên ku hatine xulqkirin xudanê şeş terefa ne. Ser, binî, pêşî, paşî, rast û çep.

Li gorî vê, meriv dikare şîrê bi vî awayî şîroveke: Ez çûm tebeqa pêxember û ewliyan wî ciyê ku Rûhullah yanî Hz. Isa lê. Wan hemuyan gotin "Ene'l-Heq" yanî ez "Xwedame", min "Wahidê mutleq" got, yanî min got ku "Xwedame" e". Saqiyê ez girtim, qedehê şerab (mecazî ye) bi min da vexwarin. Meynoşî û serxweş bûm, piçekî şik ket dilê min jî ku ez bêjim "Ene'l-Heq". Lê min bala xwe dayê ku ez çar û neh û şeş im; yanî ez mexlûqek im ku ji çar tiştan; ax, av, agir û bayê pêk hatime, şeş terefên min hene, di nav kainateka neh tebeq de me, yanî ez însan im ne Xwedame. Wê gavê min piştî xwe rast kir, ez bi ser hişê xwe ve hatim, min şukur ji rebê xwe re kir.

Her wekî dîsa me di beh-seka berê de destnîşan kir, li gorî Ahmedê Xanî, hemî kar û biryarên Xwedayê teala bi hikmetan dagirtî ne. Ne mumkin e ku meriv bi her awayî Xwedê û hikmetên wî; mana kar û barên wî nas bike. Di civarê de du tebeqe însan hene, hin ji tebeqa am in ku piraniya wan nezan in, nefsa xwe ji bo xwe nizanin, xwe nasnakî, negihîştî, chmeq û xav in,

yan jî terkedinyayî, sofî an feqî ne. Hemî jî cahil, nexwendî û sefil in, bê murşîd, rehber û rênîşander in.⁵³

Ew Xwedayê ku nîşanên hikmetên xwe perde kirine, ew xezînen hikmetan bê sir, bi eşkereyî li herkesî parvenekirine. Wî ev sîrr nedane kesên amî yên ji rêza basît, bi taybetî sîrrê van hikmetan daye kesên dost û yarên xwe, yên ku xas in. Ew sir ji bo ku li cem herkesî ne eşkere ne, loma jî meriv dikare bibêje ku li cem Xwedê hin kes bêpar û dîr in, hin jî nêzik û dost in.⁵⁴

Ahmedê Xanî, vê alema afirandî wekî aşekî û însanan jî wekî dexlên (dane-yên) vî aşî dibîne. Binê erdê jî ji vî aşî ra ew çal e ku arvanê hêrayî dikevê. Ew dane misêwa, bi dorê ji devê çewêl dirijin, perçe dibin, tîrê hêran, hûr dibin ji nuh ve dîsa tîrê hevîrkirin. Ew laşên sexte yên ku bikêrî agir tîrê hindî ku êş û azarê dikêşin bi sewiya herî pîs û nepak jî razî dibin. Tîrê dereceyek welê ku ne mirî ne, ne jî zindî, her wekî ku hatîye gotin "la yemûtû, yehya"⁵⁵

Bes ew daneya (qesd însan e) xas a hêja û tebi'etpak, yanî ruhê karqenc û giranbuha, ku cotkar bi taybetî hilîne û wê daneyê biçîne, ew dane hetta nerizê, zil nade; hêşîn nabe û qenc û pak nabe. Gava hêşîn bû û simbil da, dê wê bikutin ku bikin xurek. Aşê devî û çeqçeqa zimanan, ava devî û kevirên diranan hindî wê dikutin û di hêrin, hindî ku wê di bajarê laşî de digêrin, heta ku wekî arvanî ew hûr dikin. Piştî hinde zehmetiyan wê bê ber teserrufa hêzan. Geh hêza kêşanê dê wê ber bi hundurî ve bikişîne, geh hêza ragir dê wê biguvêşe û biêşîne. Geh dê hêza hezimê were wê bihelisîne,

carna hêza dafdanê dê wê rawestîne. Tendûra mîdeyê dê wê bipêje, herçi tiştê ku xerab e, dê jê birêje, tiştê ku pak û nazik e dê berjor bidin û her çiyê tîr û hişk e dê berjêr bidin. Paşê beşê pak û nazik wê ji hev perçe bikin, parvekin û belav bikin. Ew xurekpêjê germayîya tebîî, jêkderînerê ku tiştan ji hev dertîne, dê wan li endamên laşî parveke û bi vî awayî hemî war û der ava bibin. Dîza cegerê û dilê şûşeyîn wê vê rohnayîya têkilhev dawerivînin. Bi kurtî van dilopên şeraba jîyanê ku wekî şerbeta şekirê nebatê hatin dawerivandin, hêja piştî diyarbûna van karên mezin bi kêrî alema zikan (alema butûnan, yanî alema veşartî, alema hundurî) tîrê. Di wê alemê de geh noqî deryaya avê dibin, geh jî sorengîn dibin wekî rengê xwînê. Piştî dimeyên ji bo têkilbûn û pêkhatinê, bi rêk û pêkî forma xwe digirin. Gava ku wekî şeraba sor a tîrê pêkhat, hê wê wextê dibe ekswegirê, ekslixwegirê tîrêja canî. A ew can, maka an ruhê nebatan (şînbûyîyan) e.⁵⁶

Ev rîya dîr û dirêj û bi eza û cefa ya ku Ahmedê Xanî ji bo daneya dexlî berpêş dîke esas rîya cefa. xilwet, zikir û silûkê, rîya nefstenikkirinê, ya devjêberdana malê dinyayê ye, rîya pakkirina laş û ruhî ye, bi kurtî rîya tesewwuf û terîqetê ye ku însanan nêzî Xwedê dîke.

Ahmedê Xanî, dîsa rîya terîqetê û ya nêzîkbûna ber bi Xwedê, bi macereyeka dendi-ka xurmê bi vî awayî teswîr dîke:

Ew cewhera ku êksê dide ronahiya canî, heta ku di zikî de (yanî di alema veşartî da) dimîne hêdeng e, xwarina wê xwîn e. Weqta ku ji zeviya veşartî ew sebzeya ter derket û xwe nîşan da, wê sebzeyê, piştî bûyînê, dê dem bi dem bi terbiyekirinê av bidin. Heke baran ne ji feyza Xwedê lê bi-bare ew dane dibe darxurmeyeka bêber. Lê heke baran ji feyza Xwedê lê bike, ew dar kesk dibe ji belg û beran. Ew dar ku bû dareka geş bi meyweyên xwe yên xweş, serxweş digere. Ew meywe gava gîhaşt û kemilî, dibe mezhera tîrêja rindiyê. Eger layiqê rûmetdana Emîr be û layiqê huzûra Xwedayê xwedîşiyen (qadir) be, dê wê hilgîrin ji bo diyarî, bê wasite bibin wê huzûra banî (jor). Heke çû, li wir dibe ya evandî, navê wê li wir dibe ya cezbegirtî. Ev darxurmeyên wiha, geş in, pir bi şax û gulî ne, lê ne gellek in, kê m peyda dibin.

Lê eger meywe wiha li ber hewayê ma û nebû layiqê huzûra Xwedê, ew dê biçê kergeya (mahsera, guvaşgeha) cefayê.

Lê eger meywe wiha li ber hewayê ma û nebû layiqê huzûra Xwedê, ew dê biçê kergeya (mahsera, guvaşgeha) cefayê.

Lazim e hînkariyê bibîne bê hînkirin û terbiya bikêrhatinê hilîne. Geh divê bi taveroya şerê bipije, geh jî bi taveheyva xweparastina ji gunehan bisoje. Gava pijiya, gîhaşt û kemilî û gava ji guliyê dara xwe weriya erdê, heta ji berzetiya qurîyê nekeve û negihîje axa nizmî û piçûkiyê ew nabe rêwiye rêkê (terîqetê) û wê nabin wê kergeya rastîn. Bi vî awayî dest bi dest bi rê ve û mertebe mertebe bi wê ve, li kergeyê, ew meywe wê tîrê xwe derban bixwe û ew pariyê xweş wê bibe şerbet. Ew şerbet eger şerî an jî tîrê tahl e, heta bi destê pîrê meyxur di denê mezin de hilnekele ne tamam e, hîn xam e. Gava di wî denê mezin de kel bi serket û ji wê derê derket, ji pîrbûna sifetan (têkilhevî û hebûna tortuyên tê de) wê xwenîşandanan ragire û bipêçe. Bi kurtî ji germayîya rindiyê, ku bi hêza berzetiye peyda bû, cewher bi tevayî tune bibe wekî nefîca sebeban; kar tê de bêkîrin, di germayîya wan diyarbûnan, wan tiştên sotinê û yên taqetdanê de, wê toz û gemarê jê dawêşînin û wê hilm û buxarê jê hilkeşînin. Piştî vê yekê, ku pak û xwerû bibe, hê ji nuh ve diçe meqamê tecrîdê (tenêbûnê). Cewher gava ji wan pirtikên tê de veder bû, careka dîn datînin hundurê potayê. Ew pota herçi cihêki tengber û asê ye, lê dilan wekî deşteka fireh geş dîke. Heta ku sor û al e, ew hev-rengê surahî û qedehê ye. Hê nebûye şeraba xwerû ya devgirtî û muhîrkirî, hê neçûye negihîştîye wî meqamê malûm. Heta ku wê hebûnek ji alî xwe ve hebe, ji bal Xwedê ve tu diyarbûn lê peyda nabin. Bêyî meşrebeya wefayê ya şahiyê, ew şerab, naçe civata vexwarinê ya Îlahî. Heta ku bi tunebûnek mutleq tune nebe, ew wê jiyana ebedî ya bi heq nabîne. Tunebûn, ji bo wê jiyana ebedî ye, ebedîti, ji bo wê tunebûn e. Lê ne bi gîhaştin û yekbûnê, ne jî bi jiyekbûn û cudabûnê ew, bi vî rengî digihîje miradê xwe û ancax bi vî awayî ew dibe mirîdekî gîhaştî.⁵⁷

Ahmedê Xanî, ji bo xweparastina ji rîya şaş, pakkûna dilî û nêzîkbûna ber bi Xwedê ve, rê û rehberiyê, yanî terîqet û murîdî û murşîdiyê pêwîst dibîne. Ew, rexne li amîyan digre ku ew cahil, nezan û sefil in; bê murşîd, rehber û rênîşander in.⁵⁸ Dîsa ew di maceraya daneya xurmê de ku wê digihîne hetta bibe şeraba sor a zelal û berraq, israr dîke ku hetta bi destê pîrê meyxwer (yanî murşîdê ku eşqa Îlahî vexwariye û alema veşartî hemî li ber çavê wî diyar bûye) ew hilnekele, tamam nabe nagihîje û nakemile.⁵⁹



Ahmedê Xanî, Memê însane-
nekî welê nîşan dide ku bi
evîndariyeka nedîtî dibe evîndarê
Zînê, lê gîhaştina wî û Zî-
nê mumkin nabe, di ser de bê-
bextî lê tê kirin û bi bêdaletî
dikeve zîndanê; eş û azarên ne-
dîtî dibîne, tevî wê jî xwe ji riya
heq û edaletê, ji xwesipartina
Xwedê nade alî, çileyên dikêşe
û dawîya dawîn digihîje mer-
teba murşîdî û fenabûnê:

Bi kurtayî, qewimî ew gotina
"bimirin berî ku hûn bimirin".⁶⁰ Pakkirina nefse kemilî
û safikirina dilî rast geriya, mi-
rêka dilî hat cilakirin, nefse û
dil û can bi hev hatin safikirin.
Ew îbadetkirê di kûrayiya çalê
da (qesd Memê) hê sala xwe
temam nekiribû, belkî hê çilê
xwe jî danegirtibû, gumana di
dilê wî de guherî bû baweriyek
tekûz, ronahî di dilê wî de di-
yar bû, sîr li ber wî kişîf bûn.
Ayîneya dilî wiha hat biriqan-
din, awa û şikil bi maneyê wi-
ha hatin guherîn ku, ew laşê
wî yê heykelî nê li pey daxwa-
zeka mecazî, bû leystikgeha
evîneka rastîn. Ew hemî tiştên
afirandî; hemî mumkin û masî-
wa hatin ber çavên wî, hemî li
ber wî bûn dîmenek. Ew dar û
ber û heywan û insan, ev ma-
den û ev nebat her tiştê ku wî
bi dilê xwe lê nihêrt her çiyê
ku ew bi xeyala xwe lê geriya,
her yek li ba wî dişibiya Zîne-
kê, ji her yekê yeqînek diyar
dibû. Meriv digot qey ew di
resedxanê de rûniştiye û ew
çala ku tê de ye, jê re bûye dū-
rebîn.⁶¹

Ahmedê Xanî, Memê murşî-
dekî wisa nîşan dide ku di zînd-
danê de, li ser hemî zîndanîyan
tesîr kir û dilê wan jî safi
kir.⁶² Mem bi fenabûnek (tun-
nebûnek) wiha fena bûye ku
gîhaştîye merteba fenafillahiyê,
loma edî ne evîna Zînê û yek-
bûna bi wê re ya li ruyê erdê
dixwaze, ne jî bi tiştêkî dinyayê
yê din qayil dibe. Gava Da-
yîn, Sîrî û Zîn li zîndanê tîn ba
wî û teklîf dikin ku rabe aqilê
xwe bide serê xwe û here hu-
zûra Mîrî û Zînê jê bixwaze,
ew qet wê yekê qebûl nake û
wiha dibêje: "Ez naçim huzûra
çû mîran. Ew mîr bi xwe hîn
esîr e, ez nabim esîrê esîran. Ev
mîr û wezîriya ruyê erdê ku
mecazî ye, ev leystikên xeyalî
hemî betal in, hemî jî wê nemî-
nin. Mîrê ku mirin jê re hebe,
ew ne mîr e. Ê ku karibe ji ka-
rê xwe bê ezilkin, ew esîr e.
Em çûne huzûra mîrê mîran;
wî hakimê desthilatdar û feqî-
ran. Şahê şahî e mîr û padî-
şahan, ê ku tuhmet û gunahan
dibexşîne, yê ku mirêka rindiyê
afirandiye, tîra xwe bi zulf
û xalan diyar kiriye, fanosa
bedenê cila kiriye, tê de ji me-
ra xwe daye nîşandan. Ew, mî-
rê xwedîhikmet e, xwedîşîyan
e, ne tê ezilkin ne jî tunebûn

û guhertin jê re heye.⁶³

Tevî wê kûr û hûrbûna di
warê tesewwufê de divê meriv
bizanibe ku hin fikrên Ahmedê
Xanî jî hene ku rexne li softî û
terîqetê digrin, li gorî ilim û
xwendinê qîmeta wan kêmtir
dike û ji dêvla çûna nav terîqetê,
pêşniyar dike ku ilim bê
xwendin. Herwekî ku di Nû-
bara Pişûkan de malikeka wî
heye ku wiha dibêje.

Şêx û softî û keramet, ilm e,
xwendin, hem emel

Xilwet e hucre, terîqet e şerî
et bêxelel.⁶⁴

Heke meriv bîne bîra xwe
ku Nûbara Pişûkan di sala
1683'yan de û Mem û Zîn di
sala 1695'an de hatiye temam-
kirin, meriv dikare bibêje ku
xwenêzikkirina ber bi tesew-
wufê, di jiyana Ahmedê Xanî
de her ku çuye zêde bûye.

Ahmedê Xanî û Îmamê Xezalî

Piştî lêhûrbûnek bi vî awayî
ya li ser bîr û baweriyên
Ahmedê Xanî yê felsefî, dînî
û tesewwufî, bawerîya min ew
e ku wê ne şaş be gava meriv
bibêje ku ew bi gellek fikrên
xwe li ser riya Îmamê Xezalî⁶⁵
(1058, Tûs-1111, Tûs) çû-
ye, xwedî li fikrên wî derketi-
ye.

Îmamê Xezalî alimê pêşîn ê
ehlê sunne ye ku bi serbestî
xwe bera nava deryaya dîn,
felsefe û tesewwufê daye, bi
zanyariyêke kûr li hemberî fi-
lozof û medreseyan dijî ehlê
sunne rawestiyaye. Ew filozo-
fan dîke sê beş: 1- dehrîyûn
(materyalist), 2-tabîyûn (fi-
lozofên naturalîst) û 3- îlahîy-
yûn. Ew, grûba yekê kafir qe-
bûl dîke, ji ber ku afirînerê
(xaliqê) alemê înkâr dikin. Li
gorî wî filozofên grûba duduyan,
her çiqas afirînerê alemê
îsbat dikin jî ji ber ku bawerî-
ya xwe bi roja qiyametê û veji-
yanê naynin û hesab û kitabî
înkâr dikin, ew jî zindîq in û di
nava kufre de ne. Îmamê Xezalî
esas berê hucûmên xwe di-
de îlahîyûnan ku terefdarên
felsefa Grêkî ne, an jî bingehên
xwe jî wê felsefê wergirtine.
Ew, hem li ser Arîsto hem jî li
ser Farabî û Îbn Sîna radiweste
û wan jî kafir dihesibîne, çimkî
li gorî wî di bîr û baweriyên
wan de hin xusûsiyet hene ku
divê wekî baweriyên bid'etî
yan jî kufirî bîn dîtin.

Hê di sedsala dehan de, li
nava civakên dinya Îslamiyetê,
di medresan de ilim hatibû du-
beşkirin û bi vî awayî dihat
xwendin. Gelekî piştî, nivîs-
karê Faris, El Xwarzemî di ki-
têba xwe ya bi navê "Mefatih
el Ulûm" (Kilîten Ilman) de ev
dubeşkirin bi vî awayî cîbicî
kiriye:

Di beşê yekê de; 1- fiqih, 2-

kêlam, 3- nehew, 4-xetatî, 5- il-
mê belax, 6- tarîx.

Beşê duduyan jî ku reh û rî-
şên xwe ji kultura Grêkî û
Hindî werdigirt ji van qis-
man pêk dihat: 1- Felsefe; bi fîzî-
kî û metafîzîkiya xwe, 2- mentîq,
3- Tib, 4- riyaziya, 5- mûsiqe, 6-
mekanîk û 8- kîmya.

Xezalî, di nav van de ji kela-
mê piçekî xwe dîr dîkir, bi wê
baweriyê ku ev ilim, xwe li ser
iddîa û delîlên şikpeydaker ava
dike. Wekî me berê jî behs
kir, wî, rexne li felsefê jî girt.
Ew yê pêşîn e ku li hemberî fi-
lozofan bi wî awayî radiweste
ku mirov bi riya aqil û mentî-
qê; anîna delîl û belgeyên li go-
rî van, nagihîje rastiya habûna
Xwedê. Yê ku mirovî bigihîne
rastiya Xwedê, bawerî ye, ve-
bûna çavê dilê mirovî ye. Wî
qîmetek da riyaziya û tîbbê û
di munaqeseyên xwe de, ji il-
mê mentîqê fêde girt.

Rexneyên wî yê ku li fi-
lozofan dihatin kirin, di bîst xal-
an de dabeş bûbûn. Meriv di-
kare van hemî xalan di binê sê
beşên esasî de berhev bike: 1-
Filozofan ezeliyet û ebediyeta
alemê qebûl kirine. Ev yek, li
dijî Îslamiyetê ye. 2- Heke me-
riv iddîa bike ku Xwedê tiştên
giştî û tevayî dizane lê yê per-
çe û piçûk nizane, ev jî kufir e.
3- Înkara heşra bedenê, tê wê
mahnê ku meriv ceza û moka-
fat tenê ji bo ruhan qebûl dîke,
ev jî ne li gorî şerîetê ye. Ji bilî
van, Îmamê Xezalî li dijî ba-
weriyên Mutezileyîyan jî ra-
westiyaye ku sifetên Xwedê înk-
ar dikin.

Xezalî, bawerîya xwe bi
tesewwufê jî aniye, jiya-
neka mutesewwufî ya
kûr û dîr û dirêj jiyaye, wekî
mutesewwufekî ehlê terîqetê gel-
lek tişt kirine, gotine û nivîsîne.
Îmamê Xezalî alimê pêşîn e ku
xwestiyê tesewwufê bi riya exla-
qî (moral) bi felsefê re li hev bî-
ne. Ew dibêje: "Softî ew e ku
meriv nêzî Xwedê bibe". Xezalî
filozofê yekta ye ku hem jî alî
medresê hem jî alî xaneqê(tek-
yê) ve hatiye qebûl kirin.

Lê divê em bizanibin ku wî,
ev softîya ku di eserên xwe de
behs kiriye her gav di jiyana
xwe de nemeşandiye. Bîr û ba-
weriyên wî yê felsefî, ew jî
"îlhamên mistîk" vekêşayî hiş-
tîne. Tiştêkî din ê girîng jî ew e
ku Xezalî her çendî tecrubên
dînî yê sofîyan û metodn wan
ên zewqê qebûl dîke jî bi her
awayî beşdarî fikrên wan na-
be. Ew rexne li wan kesan di-
gire ku di nava wecda tecruba
dînî de tîn xapandin û digihî-
jin hukmên şaş. Ew dibêje ku
"Ew sofîyên ku dibêjin em gî-
haştîne Xwedê û em bi Xwedê
re bûne yek, li ser şaşiyê ne."

Gava em fikrên Ahmedê
Xanî yê dînî, felsefî û tesew-
wufî bibîr binin, muştêrekiya

wî û ya Îmamê Xezalî di gellek
waran de baş xwiya dibe.

Muştêrekiya wan, helbet ne
tenê di warê bîr û baweriyên de
ye. Jiyana wan û dem û dewra-
na ku ew tê de jiyane jî gellekî
dişubhin hev. Em bibîr binin
ku Îmamê Xezalî jî alî mezhe-
bî ve wekî Ahmedê Xanî li ser
eqîda Îmamê Şafîî ye. Dewra-
na ku ew tê de jiyaye, perçe-
bûn û têkilhevî, di navbera xe-
lîfe, sultan û xanedanên civa-
kên Îslamî de zêde bûne. Di ji-
yana tebeqên civakê de bêstîq-
rarî, nerazîbûn û dijarî peyda
bûye. Ev dewr her wiha, ew
dewr e ku êrîş û şerrên Xaçpe-
restan li ser musulmanan hene.
Bêtiyaqîya navbera emîrên ci-
vakên musulman ew xemgîn û
aciz kiriye. Encama van hemî-
yan welê kiriye ku Xezalî pirtir
parêzeriya ehlê sunne bike û
dijayetiya medrese û tevgerên
li dervayî wê, pê re tûjtir û kûr-
tir be.

Dewra Ahmedê Xanî jî dew-
rek welê ye ku, lbêstîqrarî,
zulm û zorê li herêmê xwe
xurt kiriye, mîrên Kurdan bi
hev re bêtiyaqî in, êrîş û tadeyi-
yên dewletên mezin ên wekî
Îranî û Osmanîyan li ser civa-
kên herêmê zêde ne, tebeqên
civakê jî halê xwe ne razî ne. Ji
alî medeniyetî, kulturî, fikrî û
siyasî ve herêma Rojhilatê Na-
vîn paşde dimîne, li gorî wî,
dejenerasyon, îmanzeifî û qel-
sîyê di exlaq û manewiyatê de
destpê kiriye. Fikrên Ahmedê
Xanî yê felsefî, dînî, millî, si-
yasî û tesewwufî di bin van
şertan de şikil giritine, bistiya-
ne û gîhaştîne heddê kemilîna
xwe.⁶⁶

1 Xuda yek e bê hevê û bê heval
Ne me'ûlî ye ne mirin ne zewal
Ne esl û ne fesl, ne da û ne bab
Heyyîn û bîna wî nabit hîsâb
Ji bo wî çu nîne çîhat û mekan
Ne manend misl û ne hemtanîşan
Mekanan mebine ji bo wî rewa
Nihayet 'el' 'erş qed estewa
Li wî ranebîrîne weqt û zeman
Ne sal û ne mah ne hîyn û ne an
Ebed dê hebitin ezel her heye
Di dinya û 'uqbê Xudayê me ye
Ewî afirandin em û cumle xelq
Nehin xeyrê wî qet çu xaliq bi heq
(Ahmedê Xanî, Eqîda Imanê, ji Yû-
suf Ziyaeddîn Paşa El Xalidî, El Hedî-
ye'l-Hemîdiye Fî '1 Luxe'l Kurdiye,
Der Saadet[Istanbul], Şirketi Mürette-
biye Matbaasi, 1310, r. 294.)

Di Mem û Zînê de jî, Ahmedê Xanî
gava berê xwe dide Xwedê bi vî awayî
dibêje:

Ey wahidê bêşerîk ê yekta
Wey wacibê bênezîr û hemta
Ey Baqiyê bêzewal û daîm
Wey hadiyê bêfena yê qaîm
Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Wergêrê
tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emin
Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala,
1995, r.130)

2 Eşya bi hesab delîl û burhan
Nabin çu meger wucûb û îmkan
Wacib yek e, Zatê Kibriya ye
Mumkin pir e, hemî masîwa ye.
Ehmedê Xanî, Mem û Zîn, Wergêrê
tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emin
Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala,
1995, r.130)

144

³Ulken, Hilmi Ziya; Islam Felsefesi,
Ülken Yayınları, Üçüncü baskı, 1983
İstanbul, r. 41 û dewama wê, qismê li
ser "Meşşai Okulu"

Her wiha binêre Nordberg, Micha-
el; Profetens Folk, Tiden, Kristianstad
1989, Swêdî r. 323-342

⁴Nezeriya li ser wê yekê ku dibêje
tiştî ji çar unsur(elementan) pêk hati-
ne. Ev nezeriya, cara pêşîn ji alî filozo-
fê Sîcîlyayî; Empedokles(492-432) ve
hatiye pêşberkirin. Empedokles filozo-
fekî ser bi felsefa Parmenidesê tê naski-
rin.

"Peyva element(unsur) mîna goti-
nek sereke ne ya Parmenides e, wî bi
awakî taybetî ev bi kar neaniye. Lê wî
jî av, hewa û agir wek sê elementên
hîmdar an wek sê maddeyên zayîdar
pêşkêş kirine; ku ev hê gelek pêş wî,
yek bi yek bi wê rola xwe ya diyarkirî,
ji aliyê filosofên İyoniyayê ve hatibûn
diyar kirin. Lê Empedokles tenê axê lê
zêde dîke. Lewma ew jî ji ber wê çendê
mîna filosofekî sazkar ê Teoriya Çar
Unsurî tete zanin.

Ev Teoriya Çar Unsurî, paşê, di
wan sedsalên dawiyê de, giraniya xwe
di felsefa Îslamê de jî dide xwîyan. Li
gorî dîtinên Empedokles, ev çar mad-
deyên bingehîn, mîna meşhûma hebû-
nê (being) ya Parmenides, cewherên
wisa ne ku tu car nayên guhurîn."
Düzgün, Mustafa; "Empedokles", Nû-
dem -kovara hunerî, edebî û çandî,
Swêd/Järfälla No:13, 1995, r. 79

⁵Kitêba ku li hemberî hemû awe
guhertinan hatiye parastin. Kitêbeka
mezin a ku Xwedê hemû bûyerên kaî-
natê yê heta qiyametê tê de tesbît ki-
rine. Ev lewhê mehfüz, bingehê
Qur'anê ye, û Qur'an beşekî piçûk ê
wê lewhê ye ku bi Erebi hatiye şîyan-
din. Di ayeta 27'an a sûreyê Qur'anê
de yê bi navê Kehf, wiha tê gotinê:
"Yên ku ji kitêba Xwedê ji bo te hati-
ne şîyandin wan bixwîne." Di ayeta
39'an a sûreyê Ra'dê de jî wiha tê go-
tin: "Xweda kê bixwaze tune dîke (ki-
têba esasî, ummu'l kitab) li nik wî
ye". Di ayeta 4'an a Kehfê de Xweda
wiha dibêje: "Em dizanin ku erd dê çî
kêm bikin, li nik me kitêbek heye ku
ev hemû tê de nivîsandî û parastî ne."
Di ayeta 22'yan a sûreyê Hedîdê de tê
gotin ku: "Çi li ser ruyê erdê be, çî jî
di nefsa we de tu musîbet nayê serê
we ku di wê Kitêbê de nehatibe nivîsîn."
Buharî jî wê hedîsa jêrin ji Abdullah
Ibn Abbasî vediguhêze: "Pêxemberê
me bi vî awayî fermo kir: Muheqqeq ku
Xwedayî qencî û xerabî nivîsîn û di
lewha mehfüz de teqdîr kir." İmran jî
dide zanin ku pexember Hz. Muhem-
medî wiha gotiye: "Xweda hebû, çu
tiştê din nebû, erşê wî li ser avê bu,
piştî hemû tişt li gorî rêzê di lewha
mehfüz de nivîsî, erd û asîman afirand-
in." (Hançerlioglu, Orhan; İslam
İnançları Sözlüğü, Remzî Kitabevi, İst-
anbul, 1984, r. 285-286)

⁶Wê qelesa ku pê li ser lewha meh-
füz hatiye nivîsîn. Ayeta 4'an a sûreyê
'Eleqê wiha dibêje: "Bixwîne. Rebbê
te yê bi qelemê hîn dîke û bi insanên
nezan dide zanin, bi kerema xwe dere-
ceyek welê ye ku kes neşê xwe bigihî-
nê." Taberî jî di kitêba xwe de ku na-
vê wê Tefsîr e, xwe dispêre hedîsên Pê-
xemberî û wiha dinivîse: Ev qelem yek-
ta tîrêjî e ku dirêjaviya wê jî erdê he-
ta bi asîmanan e. Hemû buyerên heta
roja qiyametê nivîsîne. (Hançerlioglu,
Orhan; İslam İnançları Sözlüğü, Rem-
zî Kitabevi, İstanbul, 1984, r. 228-
229)

⁷Qatê asîmanan ê heftan an ê ne-
han. Di Qur'anê de ew wekî meqamê
Xwedê tê bikaranîn. Di ayeta 54'an a
sûreyê A'rafê de wiha tê gotin: "Mu



heqeq ku rebbe we ew Ellah e ku asîman û erd di şes rojan de afirandin, piştê ji li ser erşî hukumran bû." (Hançerlioglu, Orhan; Islam İnançları Sözlüğü, Remzî Kitabevi, İstanbul, 1984, r. 26)

8Ey Xaliqê erd û asîmanan Wey faliqê cumle ins û cinan Milk û melek û felek bi carek bilcumle te çekirin teberek Subhaneke kulle ma xeleqte Ehsente fe keyfe ma feleqte Herçî ku te çekir, ey nîkûkar her yek di hecdê xwe de sezawar Ev neh sedefêd-i pîrmîrari durrêd-i sefid, şefaf û tarî Heftêd-i misalê durrê xeltan her şes çîhet û çîhar-i erkan hersê weledêd-i pîrmewalid xebra û sema digel meqalid lewh û qelem û sewabit û erş heywan û nebat û maden û fers zahîr kirin ev qeder senayî peyda kirin ev qeder bedayî her yek ji edem kirin te peyda İbda-i kirin te bê heyûla Ahmedê Xani di Eqîda İmanê de ji li ser mesela "heyûla"yê radiweste û wiha dibêje:

"Heyûla" çu nîne edim e edim Qewî kafir e û dibêjî qedim (Ahmedê Xani, Eqîda İmanê, ji Yûsuf Ziyaeddîn Paşa El Xalidî, El Hediye'l-Hemîdiye Fi'l-Luxe'l-Kurdiye, Der Saadet[İstanbul], Şirketi Mürettebiye Matbaasi, 1310, r. 294.)

9Ev peyv îşaretek e ber bi ayeta Qur'anê ve ya mealen dibêje ku: "Wî(yanî Xwedê) dema tiştêk bivê, fermana wî tenê ew e ku jê re bêje; 'bibe' ew jî hema dibê." (Bozarslan, M. Emin, ji Ehmedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emin Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r.123)

10Ev alem û ademî û meşhûd ev mumkin û masîwayê mewcûd hemîyan bi te ye midare û debr feyyazê riyazê xelq û we'l-emr Emrê te bi lefzê "kun" du alem mewcûd-i kirin, xerez çî? Adem Adem bi xwe yek jî herduyan e Yek herf e ji emrê "kun" fe kane Ew herfe heqîqeta muheqqeq Hem emr e bi qudreta te, hem xelq

Herfa ku me gotî, neqşê hûr e Lê meqsed û maneya wê kûr e Zahir te eger numa ye suxra batin ew e neqşê xame kubra Mewcûd e di wê, şehadet û xeyb Meşhûd e di wê, sîyadet û eyb İnsan bi xwe hem zelam e hem nûr Adem ji te hem qerîb e hem dûr Hindî wekû cînsê alemî ne ew tabîc newê ademî ne Ev renge felek hemî muezzem ev çende melek hemî mukerrem ev karegeha ezîm û dewwar Ev baregeha bedî û seyyar ev çende zemîn digel enasir ev renge erez digel cewahir ev çende he nî met û nefais ev renge-he me'kel û melabis ev çende he muddea û metlûb ev renge he muştêha û mehbûb heywan û meadîn û nebatat metlûb û meqasîd û muradat bil cumle ji bo me ra li kar in fil cumle ji bo me ber di bar in Heqqen ku te xweş nîzam û rewneq tertîb-i kirin ji bo me elheq Ehmedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emin Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r.122-126.

11Ev peyv îşaret in bi aliyê hedîseka Xwedayî ve ku Xwedê te de wiha gotiye: "Ez xezîneyeka veşîrî bûm; min xwest ku ez bêm naskîrin; min mirov afirandin da ku min nas bikin." Yanî "min bi afirandiyên min nas bikin; afirandiyên min bibînin û bi rîya wan min nas bikin; tiştên ku min afirandîne bibînin, li wan binêrin û ji hebûna wan hebûna min fam bikin û bi vî

awayî min binasin." Bozarslan, M. Emin, ji Ehmedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emin Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r. 147

12Bozarslan, M. Emin, ji Ehmedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emin Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r.147

13Wî wacibê mumkinat-i burqê Mumkin wî ji bo xwe kirine metle Yanî ewî vê bibit mubherhen husna wî biderkevit ji mekmen gancîne cewherî bibit fahş sabit bibitîn ji neqşî neqqaş Lê sen'etê wî Hakimê dana neqşê wî Qadirê tuwana nedibû ku bibit ewî rusûmek Laiq ewî dê hebit ruqûmek Herçî wekû bûne bêreqem bû Lew ewwel "ma xeleq" qelem bû Ev ewwel û-rûh û aqlê ewwel her sê ne, bi ewwelî muewwel Emma meke wan ji hev tu tefrîq Ev renge ewan bigêre tewfîq: Bê"şey'ekî wahid in bi carek Tadad û teedud û îtibarek"

Ehmedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emin Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r.146

14Ewwel birîqî ji husnê sermed nûrek, bûye maneya Muhemmed Ew nûr-i bi emrê Alim'ul-xeyb bû menşec feyzê alem'ul-xeyb Erwah-i ji maneya Peyember çêbûn, mesela nebat û şeker Bû eslê esilê cumle nefsan Nefsa sueda û nefse nehsan Hem'yan ji wê ditine teferu' Hem'yan bi wê girtine temettu' Hêja ne zemîn ne ew sema bû Ew serwerê cumle enbiya bû Xelqa felekan ji bo wî ra bû Secda melekan ji bo wî ra bû Ew rehmetê cumle alemîn bû Adem di meyanê ma' û tîn bû Pêxemberê cem'ê cuz' û kul bû Adem bi xwe hêj-i av û gil bû Ew pencereya cemalet Barî şemsa feleka dilêd-i tarî gava kete sûretê cîhanî Pêxemberê axirr uz' zamanî Wî berxê mumkinat û Wacib wî padîşahê li şiklê hacib

Ehmedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emin Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r.146-148

15Nûr î tu di husnê ruyê dildar Nar î tu di qelbê aşîqê zar Şem' î, ne jî çîsmê nûr î nar î Şems î, jî eyan tu perdedar î Gene î tu di nêv tilîsmê alem Kenz î tu eyan jî ismê adem

16Filcumle, çî ewwel û çî axir Elqîsse, çî mu'mîn û çî kafîr her yek ji te ra bûne mezher ew renge di wan tu bûyî muzmer Bê husnê te nîne wan wucûdek Bê nûrê te nîne wan numûdek Hikmet ew e batin î û zahir Qudret ew e xaib î û hazîr Nînin te teheyruz û temekkun Emma we di wan dikî tewettun goya hemî cîsmek in tu can î goya hemî şehrek in, tu xan î Ehmedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emin Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r.134

17Şîrin te kire şekîr li Perwîz Ferhad-i jî rengê eşkê xûnrîz Leyla te kire bela li Qeyisî Ramîn bi te ram-i bû li Weysî Yûsuf te çira numa Zuleyxa? Wamiq te kusa gîhande Ezra? Şêxê we, ku pence hec bijarî dîn kir te ji bo keça kufarî..... Sorgul te kirin ji xarî peyda bilbil te kirin hezarî şeyda Ronahî te da serê şemalan perwane kirin bi şewqê talan

..... Aya ne te çekirin muqabil her yek te bi hev kirin muadil? Ehmedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emin Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r.138

18Ev gotin îşaret e bal bi ayeteka Qur'anê ve ku li gor wê di zemanê xwe de Mûsa Pêxember dibêje: Xwedayo, ji bo çî tu dixwazî me bibî hîlakê, çîma ku kêmaqlînî me karin kirine.. Temam fitna te ye tu bi fitna xwe kesê ku dixwazî jî rê derdixî û kesê ku te bivê tu rê şanî didiyê, tu yê berz û dostê me, li me bibuhure û rehme bi me bike, tu çêtîrîn lêbuhêr î." Binêre Hejar Mukriyanî, tîbinî, Mem û Zîn, Ahmedî Xani, Amadekirdin û perawênzîsînî Hejar, Institut Kurde de Paris, Paris, 1989 r. 9

Her wiha binêre:Bozarslan, M. Emin, ji Ehmedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emin Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r. 141, nota 49'an)

19 Meqsûd û miradê dil tu şa yî Emma tu "tedillu men teşa" yî Herçî te divê bibî delalê pabend-i dikî bi zulf û xalê Her çî ku tu bînî ser hîdayet vê ra bigirî, bikî înyet hazîr wî dibî meqamê malûm ger xadim e, wî digêrî mexdûm Ehmedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emin Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r.140

20Îrada Xwedayî. Ji vê re îrada ilahî û îrada rebbanî jî tê gotin. Bawerîanîna bi vê îrada ilahî yanî bawerîanîna bi qeza û qederê ku çî bibê bi îrada Xwedê ye şertek e jî pênc şertên İslamê. Li gorî mezhebê Cebriyye ku di sedsala 8'an de hat damezirandin, wekî perîkekî li ber bayê, insan li ber îrada Xwedê ne û pê ve girêdayî ne. Medresa Mutezile jî bi eksê vê îddîa dike ku insan di kar û kirinên xwe de bi temamî serbest in û Xweda tu tedarxulê bi karê insanî nake.

21Wê îrada ku Xwedê bi dest insan ve berdaye. Xwedê her tiştî dizane, her tiştî pêk tîne; qenciye jî, xerabiye jî ew pêk tîne, û jî berê de dizane ji ku kî wê xerabiye û kî qenciye bike, lê ew tedarxulî wan nake û wan di hîlbijartina vî an wî karî de serbest dihêle. A ev serbesthiştin, îradeya cuz'î ye. Ji vê re cuz'ê îxtiyarî jî tê gotin.

22Bê secde, te ey Cenabê Mabûd Adem kire qiblegah û mescûd

..... İblîsê feqîr e bêcînayet hindî te hebû digel înyet her rojê dikir hezar îtaet lewra ku te da wî îstîfaet Wî secde nekîr li xeyrê Mabûd Gerra te, jî ber derê xwe merdûd Wî secde nebîr li pêşê exyar Qehra te kire muxelledunnar Elqîsse, jî hikmeta te agah ferdek me nedî, tebarekellah. İrfan telebêd-i sahibîdrak derheqê te gotî "ma erefnak" Ehmedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emin Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r.142

Di beşê kuştîna Bekirê fitnebaz de ji alî Tacdînî ve, gava Zîn di heqê Bekirî de li gel Mîr û Tacdînî diaxive, ji wan dixwaze ku di heqê Bekirî de înadê nekî, wî bibexşînin û bizanibin ku hebûn û kar û barên wî yên fitne û fesadiyê bi îrada İlahî ne û helbet hikmetek tê de heye. Zîn wiha dibêje: J'ewwel ve eger çî wî cefa kir axir bi me ra ewî wefa kir Zahir wî eger muxalefet kir batin bi me ra muwafeqet kir Ger ew nebûya di nêv me hail îşqa me dibû betal û zail

Wî gerçî ji bo xwe ra xirab kir der heqqê me wî qewî sewab kir Ew bû sebebê heqîqeta me Daxil geriya terîqeta me Ew jî di rîya me de şehîd e Tehqîq-i bikin ku ew saîd e Ehmedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emin Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r.626

23 xiyalê zill: Leystikeka wek sînemayê bûye. Ji perçeyên çermên devan yan jî ji perçeyên kaxidê req ê wek qartonan ayînen mirovan hatine çekirin û li ser perdeyeka ronikîrî hatine nîşandan û ji aliyê leystikvanan ve bi hin benikan hatine livandin; lê belê leystikvan bi xwe ji temaşekaran ne xuya nê. Leystikvan li gora tevgerên ayînan(şiklan) û li gora babet ji devên ayînan peyivîne. Bi vî awayî jî temaşekaran ra wisa xiyal çêbûye ku ew ayîn bi xwe hem dilivin hem jî dipeyivin.... Bi Tirkî jê ra tîgotin "Karagöz" (Binêre:Bozarslan, ji Ehmedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emin Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r. 563, nota 623'an)

24cuz'ê îxtiyarî: Para hîlbijartinê, îmkana terçîhkirinê ya ku Xwedê daye insanan ji bo ku karibin kar an tiştên qenc an xirab ji bo xwe hîlbijêrin. Ji vê re îrada cuz'î jî tê gotin.

25Lewra ku xirabî û qebûlî nînin bi fezail û fuzûlî Abid bi riyayekê helak in Asî bi duayekê di pak in Alem ku wekî xiyalê zill e Sanî' bi xwe hadî û mudill e ew tînite menzera xiyalê Ew tîxite perdeya delalê Lê daye me cuz'ê îxtiyarî Nefsa me bi lîp û hîlekari Ehmedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emin Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r.560-562

26Eger bêguneh me muezzeb biket Ji wî ra heye me mueddeb biket Rewa ye biket ew li xelqê meşaq Bi qehra xwe tekelluf "ma la yut-laq" Eger kî bi zilmê tekellif diket Di milkê xwe da ew teserruf diket Li me ferz e her çî ji bo wî bi kêr Ne ferz e li wî ya ji bo me bixêr İradet diket ew bi xêr û şeran Riza nîne emma bi fê'la şeran. Bizan bende muxtarê fê'la xwe ye Ne Xaliq ne mecbûrê fê'la xwe ye (Ahmedê Xani, Eqîda İmanê, ji Yûsuf Ziyaeddîn Paşa El Xalidî, El Hediye'l-Hemîdiye Fi'l-Luxe'l-Kurdiye, Der Saadet[İstanbul], Şirketi Mürettebiye Matbaasi, 1310, r. 295.)

27Gava ji edem Xwedê kir îcad ev kevn û mekan ji nû ve binyad mecmû'ê mukawenatê alem hetta ve xulase new'ê adem eşya bi hesab sîfat û ef'al îfane wucûdê muxtelîf hal Mewcûd-i kirin bi hev mu cyyen ezdad-i kirin bi zid mubeyyen. Ev erd û sema, betî' û dair Ev milk û melek, muqim û sair Ev nûr û zelay û kufur û îman Ev xuld û seqer, bihişt û nîran Ev barid û h'arr û retb û yabis Ev mîr û geda, xenî û bais Ev ax û hewa û agir û av Ev leyl û nehar û sî û sîtav Ev hîcr û wîsal û şahî û xem Ev mewt û heyat û sûr û matem Hin nûr-i misal û hin wekî nar Hindek di helîm û hin di dijwar Van sadiq û rast û xêrewhawan Van qemsî û xwar û rûsiyahan Van chîlê cehennem û ezaban Van laiqê cennet û sewaban Nabînî ku pêk ve cumle zid in Hikmet çî ye bo çî pêk ve nidd in? Lewra ku nebit eger tîxaluf temyiz-i muhal e, hem tearuf

Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emin Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r. 372-374

28Lewra ku Xwedanê îns û canan wî xaliqê erd û asîmanan roja ewî hubbê da hebîban hingê ewî buxdê da reqîban Mewcûd-i kirin dema ji madûm em pêkve di lazim in û melzûm Em sorgul in, ew ji bo me xar e Em genc in û ew ji bo me mar e Gul hîfz-i dibin bi nûkê xaran Gencîne xwedan dibin bi maran Ehmedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emin Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r.624-626

29Erwah-i ji maneya Peyember çêbûn, mesela nebat û şeker.

30Eşbah-i muressem in ji nasût Erwah-i muwessem in ji lahût Ew rûh û cesed bi cebr û îkrah tezwîc-i bûyîn bi emrê Ellah Nasûti egerçî rengsefal e lahûti jî pertewa cemal e.

31Cîguhaztîna ruhî. Hin bawerî he ne ku li gorî wan ruh ji bedenekê dertê diçe bedeneke din û bi vî awayî hetta û heca çîh diguhêze û bedenên zindî dike. Ev bawerî, di gelek dînen kevn û nûh ên wekî Zerdestî, Hindûî û Bûdîstî, Êzîdîti û di hin mezheb û medresên nav دنیا İslamê de heye. Di nav qismek ji Alewiyan, Ehlê Heq û gellek mezheb û terîqetên din de jî ên wekî Karmatî, Kamîlî, Mensûriyye, Mufaddele, Sebe'iyye û Rawendiye ev bawerî hîye. Hançerlioglu, Orhan; Islam İnançları Sözlüğü, Remzî Kitabevi, İstanbul, 1984, r. 639)

32Di zimanê tesewwufê de ew e ku Xweda di cîsmê hemû afirandîyan de xwe diyar dike. Hin terîqet hene ku vê baweriyê bi wî awayî pêşde dibin ku xwedêgiravî Xweda di hemû insanan de diyar dibe. Terîqetên ku di vê baweriyê de ne ji wan re Hulûliye tê gotin. Sebe'iyye, Cenahîyye, Xetabiyye, Numeyriyye, Xulmaniyye, Hallaciye û h.w. d. ji van terîqetan e. Hançerlioglu, Orhan; Islam İnançları Sözlüğü, Remzî Kitabevi, İstanbul, 1984, r. 167)Hin terîqetên terefdarên Hz. Alî bi wî awayî pêşde çûne ku gotine, Xwedê di bedena Hz Alî de diyar bû ye û carna jî gotine ku bi vî awayî jî Hz. Alî di rojê de recessum kirîye, loma jî bûne perestarên Hz. Alî û rojê û ji wan re sejde kirine, ew wekî Xweda qebûl kirine.

33Betal e tenasux muhal e hulûl meke îtrîhadu du tiştan qebûl (Ahmedê Xani, Eqîda İmanê, ji Yûsuf Ziyaeddîn Paşa El Xalidî, El Hediye'l-Hemîdiye Fi'l-Luxe'l-Kurdiye, Der Saadet[İstanbul], Şirketi Mürettebiye Matbaasi, 1310, r. 294.)

34 Xelqê ku digel Memê grîftar gotin ku: "Me di ji sethê dîwar berqek bieceb Memê bi ser ket şewqek ji serê Memê bi derket Yek şubhetê rojê, yek heyvî bû yek şubhetê zêr, yek jî zîv bû Ew şems û qemer ku mutessil bûn derhal-i bi yek ve muzmehil bûn Gava we ku pêkve muqtebis bûn ew herdu bi dew'ê mun'ekis bûn ew reng gerîyan munîr û rewşen zîndan li me kir'ne sehnê gulşen Mem jî bi vî rengî bîxêber bû xwîna dilê wî bi der ve der bû" Ehmedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emin Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r.600



35 Ey dîdeê dil nebûyî meftûh
Inkar-i nekî tecellîya rûh
da fikir-i nekî ku ev hulûl e
yan nexs e, xurûc e yan duxûl e
da zen nebîrî ku ev mesal e
ya qewlê zeif e ya betal e
Xewna tu dibînî, ev meqam e
şey'ek ji şuhûde, natemam e

36 Hançerlioglu Orhan, İslam İnançları Sözlüğü, Remzi Kitabevi, İstanbul, 1984, rûpel:376
Her wiha binêre; Nyberg, H. S. İslam Ansiklopedisi, c. 8, Milli Eğitim Basımevi, İstanbul, 1979, r. Ehedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emîn Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r.750-764

37 İradet diket ew bi xêr û şeran
Riza nîne emma bi fê'la şeran
Bizan bende muxtarê fê'la xwe ye
Ne xaliq ne mecbûrê fê'la xwe ye
(Ahmedê Xani, Eqîda İmanê, ji Yûsuf Ziyaeddîn Paşa El Xalidî, El Hediye'l-Hemîdiye Fî'l-Luxe'l Kurdiye, Der Saadet[İstanbul], Şirketi Mürettebiye Matbaasi, 1310, r. 294-296

38 Eger bê gûneh me muezzeb biket
Ji wî ra heye me muedeb biket
Rewa ye biket ew li xelqê meşaq
Bi qehra xwe tekellîf "ma la yetlaq"
Eger kî bi zilmê tekellîf diket
Di milkê xwe da ew teserruf diket

39 Hançerlioglu Orhan, İslam İnançları Sözlüğü, Remzi Kitabevi, İstanbul, 1984 bi zimanê Tirki, rûpel:376
Her wiha binêre; Nyberg, H. S. İslam Ansiklopedisi, c. 8, Milli Eğitim Basımevi, İstanbul, 1979, r. 750-764

40 Sifatêd-i seb'e ji bo Zulcellal
Bizan heft in ey arîfê pirkemal
"Heyat" û "zanîn", "qudret",
"vîn", "kelam"
"Bihîstin" digel "dîtin"ê bû temam
Qedîm in wekî zatê cumle sîfat
Ne 'eynê di zatî ne, ne xeyrê zat
(Ahmedê Xani, Eqîda İmanê, ji Yûsuf Ziyaeddîn Paşa El Xalidî, El Hediye'l-Hemîdiye Fî'l-Luxe'l Kurdiye, Der Saadet[İstanbul], Şirketi Mürettebiye Matbaasi, 1310, r. 294.)

41 Hançerlioglu Orhan, İslam İnançları Sözlüğü, Remzi Kitabevi, İstanbul, 1984 bi zimanê Tirki, rûpel:376 Her wiha binêre; Nyberg, H. S. İslam Ansiklopedisi, c. 8, Milli Eğitim Basımevi, İstanbul, 1979, r. 750-764

42 Musulman bi qetl û zînyê çu çar
Ne kafir dibin ne muxelid di nar
Ahmedê Xani, Eqîda İmanê, ji Yûsuf Ziyaeddîn Paşa El Xalidî, El Hediye'l-Hemîdiye Fî'l-Luxe'l Kurdiye, Der Saadet[İstanbul], Şirketi Mürettebiye Matbaasi, 1310, r. 294.)

43 Hançerlioglu Orhan, İslam İnançları Sözlüğü, Remzi Kitabevi, İstanbul, 1984 bi zimanê Tirki, rûpel:376
Her wiha binêre; Nyberg, H. S. İslam Ansiklopedisi, c. 8, Milli Eğitim Basımevi, İstanbul, 1979, r. 750-764

44 Ji mu'asiyan lazim e tobe zû
Gûneh nîne; tobe nebîtin li dû
Ahmedê Xani, Eqîda İmanê, ji Yûsuf Ziyaeddîn Paşa El Xalidî, El Hediye'l-Hemîdiye Fî'l-Luxe'l Kurdiye, Der Saadet[İstanbul], Şirketi Mürettebiye Matbaasi, 1310, r. 294.)

45 Hançerlioglu Orhan, İslam İnançları Sözlüğü, Remzi Kitabevi, İstanbul, 1984 bi zimanê Tirki, rûpel:376

46 Xwedê de bibînin musulman bi çav
Wekî sahi bibîtin heyva teyav
Ahmedê Xani, Eqîda İmanê, ji Yûsuf Ziyaeddîn Paşa El Xalidî, El Hediye'l-Hemîdiye Fî'l-Luxe'l Kurdiye, Der Saadet[İstanbul], Şirketi Mürettebiye Matbaasi, 1310, r. 294.)

47 Di Mem û Zînê de beşê pêncî û nehan ku sernivîsa wê bi vî awayî ye: Beyanê meratib û medaricê sulûk û wustûlê illelah e û merasimê fenayê filah û beqayê billah e. (Bnêre:Bozarslan, M. Emîn, ji Ehedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emîn Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r. 664

48 Bruinessen, Martin van; "Terîqetî Nexşbendî le Kurdistanî Sedeyî 17'hem da", wergêra Hesenê Qazî, Gizing, jimare 5, Payizî 1373-1994, Hudiksvall, r. 20

49 Bruinessen, Martin van; "Terîqetî Nexşbendî le Kurdistanî Sedeyî 17'hem da", wergêra Hesenê Qazî, Gizing, jimare 5, Payizî 1373-1994, Hudiksvall, r. 20

50 Bruinessen, Martin van; "Terîqetî Nexşbendî le Kurdistanî Sedeyî 17'hem da", wergêra Hesenê Qazî, Gizing, jimare 5, Payizî 1373-1994, Hudiksvall, r. 20

51 Mahna vê "Rabe ey laşê ku min puf kirê" Ev ayeteka Qur'anê ye, ku li ser behsa wê yekê ye ku Hz. İsa pufî laşê insanekî mirî kir û got ku "rabe ey laşê ku min puf kirê" û ji nuh ve ruh kete laşî û ew insanê mirî ji nuh ve vejîya.

52 Zîne gote wî, bedîhî:
"Qum ya ceseden nefextu fihî"
Şewqa xeberê devê şepalê
ber bûye serê dîyê şemalê
Wî dîyî qebes ji şewqê ragirt
Qendîlê qefes qebes ku dagirt
ew xelwetiye di itîkafê
rabûve bi niyeta tewafê
Ewwel ewî kir bi sidq-i der dem
tecdîdê wudû' bi abê Zemzem
Westa li muselle û meqamê
Wî cebhe gîhande îstîlamê
Tewafek-du kirin li dorê Beytê
Perwaneê per gîhande zeytê
Gava wekû per li wî disotin
wan çend-i kelm-i pêkve gotin
Perwaneê go: "Tu xweş delil î"
Şem'ê wehe go: "Tu xweş xelî î"
Perwaneê go: "Tu rehnuma yî"
Şem'ê wehe go: "Tu canfeza yî"
Perwaneê go: "Tu dilfirûz î"
Şem'ê wehe go: "Tu sînesûz î"
Perwaneê go: "Tu çaresaz î"
Şem'ê wehe go: "Tu dilnewaz î"
Perwaneê go: "Tu padîşah î"
Şem'ê wehe go: "Tu qiblegah î"
Perwaneê go: "Tu hûrê Zat î"
Şem'ê wehe go: "Tu nûrê Zat î"
Ahmedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emîn Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r. 606

53 Lê ekserê amiyân nezan in
nefsa xwe ji bo xwe ra nizanin
nabalix û ebleh û sefih in
ya zahid û sofî û feqîh in
ew cahil û ummî û sefil in
bê murşid û rehber û delil in
Ahmedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emîn Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r.662

54 Lê perdekeşê rumûzê hikmet
bê sir nekir ew kunûzê qismet
Tewzî nekir li amê nasan
mexsûs ewî da nedîm û nasan
Ew sir wî nekir ji bo me malûm
Hin mehrem in û hinek mehrûm
Ahmedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emîn Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala,

1995, r.654

55 Ev îşaret e ber bi ayeteka Qur'anê ve ku Xwedê tê de behsa cehenemiyân kiriye û ji bo wan gotiye "ew tê de ne dimire û ne ji dijî" Binêre:Bozarslan, ji Ehedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emîn Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r. 669, nota 601'an

56 Dexlê li vî aşî, ademî ne
Metmûrê erdê, ardelîn e
Ew dane bi nobet û tewalî
daîm dirîjin ji dev çewalî
Herçî rijîya dibit mucezza
jêkra dibit û dibit muherra
Texmîr-i dikin ji nû ve tekrar
ew qalibê qelp e qebillunnar
Ew çend-i dikêşin ew siyaset
razî ne bi merteba necaset
Filcumle ne murd û ne ehya
bermucibê "la yemûtu, yehya"
İlla ku nefîs û paketînet
yanî ku nufûsê nikesîret
dehqan b i xusûsiyet hilînit
wê daneyê xasseten biçînit
Herda nerizit, helak-i nabit
narîsket û qenc-i pak-i nabit
Wexta resîya bûye xûşe
wê de biqutin jiboyê tûşe
Aşê dev û çeqçeqa zebanan
ava dehen û berê dîdanan
ew çend ewê deq didin, dihêrin
ew çend di şehre ten digêrin
ew çend diqutin wê ew emeldar
hetta we ku hûr dibit wekî ar
Hasil, ku ji paşê wan cefayan
dê bête tresrûfa quwayan
Geh cazîbe, batîni ve kêşit
Geh masîke, big'vêşit, biêşit
Dem hazîme bêt, ewê biket kezîm
Tenûrê meîde wê bipêjîr
herçî ku xirab e jê birêjîr
Tes'îd-i bikin, heçî letîf e
Tenzil-i bikin, heçî kesîf e
Paşê ji wê, eltefî cuda kîn
temyiz-i bikin, ji hev bela kîn
Tebxaxê herareta xerizî
Sebbax û mumeyyizê temîzî
tewzî'î biket li cîsm û e'zan
mamûr-i bibin cîhat û erkan
Dîza ceger û dilê zuccacî
teqtîr-i bikin meya mîzacî
Hasil, ereqa meya heyatê
teqtîr-i ku bu wekî nebatê
hêja ji zuhûrê van şuûnan
bû qabilê alema butûnan
Geh xûte dixut di behrê maî
Rengîn dibîtin demek dîmaî
Dem eqde dibit ji boyê terkîb
teswîr-i dibit bi nezm û tertîb
Terkiîb-i ku bû, misalê mercan
bi eksepezirê pertewa can
Ew can çîye? Muxceya nebatê
Ewmuhce ye menşea heyatê
Ahmedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emîn Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r. 666-670

57 Hindî weku sakîne butûn e
xamûş e, xwarîna wê xûn e
Weqtê ku ji mezreê xefayê
ew sezbeê ter biket numayê
wê sezbeê dem bi dem bi xûnê
dê av-i bidîjî ji paşê bûnê
Baran ne ji feyzê bit mededkar
ew dane dibîte nexlê bêbar
Serserbz-i dibit ji berg û baran
ger lê biwerit ji feyzê, baran
Ew sezbe ku bû nîhalê serkeş
serxweş gerîya ji meyweê xweş
Ew meywe dema gîha kemalê
bû mezherê pertewa cemalê
Ger laiqê îzzeta Emîr e
wê'r derxurê hezreta Qedîr e
wê hildîgîrin ji bo diyarî
bê wasite wê dibin diyarî
Fîlhal-i ku çû, dibîte mehbûb
Navê wê li wê dibîte meczûb
Ew nexline waffîr-ur- furû' in
Lê zêde di nadîru'l wuqû' in
Wê'r mayî wisan li ber hewayê
ew de çite masera cefayê
Lazim ew e perwerîş bibînit
terbiyyewtê derxurîş hilînit
geh puxte bi afitabê şer'ê
ger suxte bi mahîtabê wer'ê

Gava pijîya, gîha kemalê
Weqtê rijîya ji ser nîhalê
hetta nekevîtiye ji ewcê îzzet
hetta negihîte xakê zîllet
ew nabîte salikê terîqî
wê nabîne masera heqîqî
Ev renge he, dest bi dest, bi rê ve
û mertebe mertebe bi wê ve
ew meywe bixut kemalê derbet
ew luqmeê xweş bibîte şerbet
Ew şerbet eger şîrîn e, xam e
wê'r tehl e û tirş e, natemam e
hetta ne bi destê pîrê meyxwer
ew hilkelitîn di xummê ekber
Gava ku di wê ve kel bi ser ket
Weqtê ji xummê mezin bi derket
yanî ku ji kesreta sîfatan
ew tey biketin tecellîyatan
Elqîsse, ji germiya cemalê
hasil ku bi şewketa celalê
cewher ku temam-i muzmehil bit
teşbîhê erez ku munfeil bit
germiyyetê wan tecellîyatan
wan muhriq û wan muqewwiyatan
tenzil-i bikin ji wê, xubarê
tes'îd bikin ji wê, buxarê
Xalis ku bibit ji paşê tes'îd
hêja diçîre meqamê tecrid
Cewher ji erez ku bû mucerred
datînin bûteyê, muceddêd
Ew bûte eger çî tengena ye
sehrayê fîna wê dilguşa ye
hemrengê surahî û peyal e
Hindî wekû sor e ya ne al e
hêja nebûye rehîqê mextûm
hêja neûye meqamê malûm
Hindî ji xwe wê hebit wucûdek
ninin ji xwedê ewê numûdek
Bê meşrebeê wefayê şahî
ew naçite meşreba İlahî
Fanî nebitin fenayê mutleq
nabînitin ew beqayê bîl Heq
Fanî'î ji bo wê ra beqa ye
Baqî'î ji bo wê ra fena ye
Emma ne bi ittîsal û îlhaq
Belkî ne bi înfîsal û itlaq
Ew renge diket miradî hasil
Anca dibîte mirîdê wasil
Ahmedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emîn Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r. 670-676

58 ew cahil û ummî û sefil in
bêmurşid û rehber û delil in
Ahmedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emîn Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r.662

59 Ew şerbet eger şîrîn e, xam e
wê'r tahl e û tirş e, natemam e
hetta ne bi destê pîrê meyxwer
ew hilkelitîn di xummê ekber.
Ahmedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emîn Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r.674

60 Ev peyv, hedîseka Hz Mûhemmed e, ku gotiye "bimirin berî ku hûn bimirin". Yanî berî ku hûn bi rastî bimirin nefsa xwe bikujin.

61 Hasil qewimî meqamê "mûtû"
bermucibê "qehle en temûtû"
Tezkiyyeê nefse bû mukemmel
Tesfiyyeê qelbî bû muhessel
Ayîneê ruhî bû mucella
Nefs û dil û can bi hev museffa
Ew mu'tekîfê di xewrê çalê
hêja negihîştî dewrê salê
belkî ne çil û ne erbeinek
zenna di dilê wî bû yeqînek
Meşhûd-i bûyin li qelbî enwar
Meşhûf-i bûyin li ber wî esrar
Ayîneê dil we bû museyqel
Sûret we bi maneyê mubeddell
ew heykelê metleba mecazî
bû mel'ebê tîflê îşqebazî
Ew mumkin û masîwa seraser
filcumle ji bo wî bûne menzer
Ev dar û ber û dewab û insan
ev maden û ev nebat û heywan
herçî ku bi dil wî lê nezer kir
herçî bi xeyal wî lê guzer kir
her yek dînuma ji bo wî Zînek
meşhûd-i ji her yekê yeqînek
Goya bi xwe ew resednişînek bû
ew çal-i ji bo wî dîrebîn bû

Ehedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emîn Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r.528-530

62 Wî murşidî qenc li wan nezer kir
qelbê wî di qelbê wan eser kir
Hemxelwetiya Memê girîftar
bû perduşayê yar û exyar.

63 Ez naçime hezreta çu mîran
Ez nabime bendeê esîran
Ew mîr û wezîriya mecazî
Ew şu'bede û xiyalebazî
bilcumle betal û bêbeqa ne
bêaqîbet in, hemî fena ne
Mîrê ku mirîn hebit, ne mîr e
Mazûlî hebit, ew yê esîr e
Em çûne huzurê mîrê mîran
wî hakimê hakim û feqîran
Şahînehê mîr û padîşahan
Bexşendê tuhmeta gunahan
ê çêkirî neynika cemalê
tîra xwe numa bi zulf û xalê
fanosê beden kirî mutella
tê da ji me ra kirî tecella
Ew Mîrê Hekîm e, Zulcelal e
bêezl û texeyyur û zewal e
Ahmedê Xani, Mem û Zîn, Wergêrê tîpên Latîni û Kurdiya xwerû M. Emîn Bozarslan, Weşanxana Deng, Uppsala, 1995, r.610-612

64 Ahmedê Xani, Nûbar, werger ji tîpên Erebi: Z. Kaya, Weşanên Roja Nû, stockholm, 1986, r. 20

65 İmamê Xezalî, yekî Faris bû. di ala 1058'an de li rojhilatê İranê, li bajarê Tûsê hat dinyayê. Navê wî yê te-vayî, Ebû Hamîd Muhemmed bin Muhemmed el Xezalî ye. Piştî xwendinê û xwegîhandina ilmên felsefî û dînî, sala 1091'ê hat vexwendin ku li Medresa Nîzamiyyeê bibe dersdar (muderris). Ev medrese ji bal wezîr Nîzamu'l Mulk, li Bexdadê hatibû avakirin. Li wê medreseê bi pirrayî, dersên wî ji berhemên Farabî û İbn Sîna bûn. Di dema dersdariya xwe de piştî demekê ket nava buhraneka ruhî, şikdariyek lê peyda bû û dev ji dersdariyê berda, dest bi jiyaneke sofîti kir. Piştî demekê bi ser xwe ve hat, lê dest bi dersdariyê nekir, çû Şamê, du salan li wir ma. Piştî çû Qudsê û ji wir ji çû Mekeyê. Di vê dema xwe ya rêwîti û xerîbiyê de jiyaneke tecridkirî ya bi zikr û sofîyane borand. Piştî re vejeriya Bexdadê, li wir her çendî qasî demekê cardin bû dersdar jî, ev yek pir nemeşîya, viyana wî ya ber bi jiyaneke sofîtiyê ew kêşa bajarê wî Tûsê. Qasî deh salan, li bajarê xwe di înzîwayê de jiya, piştî re qesda ku dinya xera bûye, îmana xelkê zeif bûye û ku ne caiz e di demeke wiha de tekeve nava xilwet û înzîwayê, careka din dest bi dersdariyê kir(1105). Lê piştî demeka kurt cardin vejeriya Tûsê, li rex mala xwe xaneqeyek(tekyayek, zewiyeyek) ava kir û nişan da ku jiyaneke bi îrşad, telkîn, îbadet û zikrî di ser her tiştî re digire. Xezalî, di sala 1111'an de li bajarê xwe Tûsê mir.(Ûlken, Hilmi Ziya, İslam Felsefesi, Ûlken Yayınları, 3. baskı, İstanbul, 1983 r.120-131 û 239-24. Kufralı, Kasım, İslam Ansiklopedisi, cilt.4, Milli Eğitim basımevi, İstanbul, 1977 r. 748-760. Nordberg, Michael, Profetens Folk, Tiden, Kristiansstad, 1989 r. 150-152, 337-339 û 355-356.)

66 Ji bo wan agahdîriyên li ser İmamê Xezalî, ji eserên ku navên wan di nota berê de derbas bûn hatiye îstîfadekirin.



Prof. Îzedîn Mistefa Resûl

"Dewrê Xanî dewra zêrîn e"



Îzedîn Mistefa Resûl

Ev fikra ku Xanî ji bo me daniye me nikaribûye em ji wî pêşdetir herin. Loma jî Xanî ne tenê bi gotina xwe bi şîrên xwe do ji bo Kurdistan mezin bû îro jî dîtina wî fikrên wî hîn zindî ne. Diviyabû ku bibûna tiştêkî tarîxî em ji wan tiştan derbas bubûna.

Min her cara ku bahsa Xanî dikir, min weha dest pê dikir. Mem û Zîn destaneke resen a taybetî ya Kurd e û li her aliyê Kurdistanê tê gotin.

Rojhilatnas û folklorasên me gelek varyantên vê destanê kom kirine. Çi dema bahsa Mem û Zînê dibe navê Ehmedê Xanî, şairê Kurd e mezin û rêberê biraweriyê Kurdîyê li gel wê tê. Di sala 1150 (Hicrî) de destana Kurdî çiyê xwe di nav rêza destanên rojhilatê de girtiye. Min digot qey edî tiştê ku di derheqê Mem û Zîn de bê gotin nemaye. Lê dema firsendê tê pêş dibînim ku hîn gotinên min ên di vî warî de mane û divê bêne gotin. Dema bahsa Mem û Zînê dibe hertim tiştên nû li ba min û li ba kesên din jî hene. Tiştêkî seydayê Qanatê Kurdo tê bîra min. Di munaqeseyan de bahsa têza doktora ya li ser Xanî bû. Digot li ba Rûsa Pûşkînolojî heye, li ba Îngilîz Shekspîrolojî heye. Divê em jî tiştêkî weha ji bo Ehmedê Xanî bikin ku ev destpêk be. Wê demê min bawer nedikir. Gelek kesan bawer nedikir. Me digot kitêbek li ser wî hatiye nivîsîn û xelas bûye. Lê bawer bikin hîn jî ez derbarê Ehmedê Xanî de tiştên taze dibînim û dibihîzim.

Ronesans û Xanî

Munaqeseyek li cem Ozbekan hebû gelo Ronesans li Rojhilat dibe yan na?

Meqaleyek Baragins li ser wî heye, gelo dibe li rojhilat ronesans hebe. Wek Rojhilat ne mirov bin, tarîxa wan tunebe. Ozbekiya bahsa Elişêr Newayî dikir ku Lisani Teyr nivîsiye û Ferîdûnê Ertar Mentiqî Teyr nivîsiye ku tesîra wan li ser Feqiyê Teyranê me gelek heye. Wan Elişêr Newayî kirine numûneyê ronesansa Ozbekan li Rojhilatê. Lê ku em li Xanî binêrin ew bi temamî numûneyê ronesansa Kurdî ye.

Ronesans çî ye? Dibê himê wê hebe. Himê wê ev tiştên kevn ku ji bo me mane, wek Şerefxanê Bitlîsî û Şerefname be yan Seyehatnameya Ewliya Çelebî be. Em dibînin di sedsala 16 û 17'an de li Kurdistanê tiştêkî hebûye ku meriv bibêje şaristaniyetî ku destpêkirina berhema sermiyandariyê ye. Tiştê ku em li ba Ewliya Çelebî dibînin bi dîtina Marksîst du nîşanên sermiyandariyê hene.

1-Manîfaktora ku gelek mirov di bin banekê de bixebitin.

2- kombûna sermiyan e.

Ev hem li aliyê Bitlîsê hem li aliyê Cizîrê meriv li ba Şerefxanê Bitlîsî û Ewliya Çelebî dibîne. Ev tiştên ilmî û zanistî, ew mizgeftên ku li Kurdistanê hebûne ku Şerefxan ji bo me dide xuyakirin. Ewliya Çelebî jî bi xwe dîtîye ku çiqas kitêb li Bitlîsê hatine şewitandin. Tu nusxeyên wan nemane, tenê navê wan ji bo me mane. Ev jî nîşan dide ku bizaveke ilmî wê demê li Kurdistanê hebûye. Ew mîrnîşinên ku Şerefxan bahs dîke û ew fikrê Kurdîyê ku Xanî dida me, destpêka ronesansê ye li ba Kurdistan.

Dema meriv di derbarê ronesansa Îtalî de dixwîne pîrsa ewil ew e ku behsa hevgerîna û yek-

girtina millet li nav hemû mirovên ronesansa Îtalî heye.

Li ba Xanî jî her ew e rewşa komelayetî, aborî û şaristaniyê. Ji bo wî çûye ber bi dewleta yekgirtî. Meseleya mezin li ba Îtalyan mesela ziman bû. Zimanê nû ku berê edebiyat pê nehatiye nivîsîn. Rast e berê Xanî me edebiyat hebûye. Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Elî Herîrî berî Xanî ne. Lê Xanî bingehêk ji bo me danîye. Li aliyê Kurdîyê fesiha li aliyê Kurdîyê tevlihev. Wî bixwe gotîye "Botî, Mehmedî, Silivî hin lehin, hinek ji zêr û zivî."

Yanî hemû lehçeyên Kurdî têkilhev kiriye. Zimanê me ji dewra Xanî heta nuha paşde çûba bawer bikin dê zimanê me yê yekgirtî hebûya.

Ev tişt yekem e ku dişibe Îtalyayê. Dûre nivîsîna Mem û Zîn ji bo çî ye? Xanî bixwe cardin kilît daye dest me. Yekem bi Kurdî nivîsiye. Ev fikir li ba nivîskarên ronesansê hebûye.

Kurmanciye sîf e bêguman e zêr nîne bibên "spide mane" sîfirê me ye sor e, aşîkar e Ziv nîne bibên ku kême eyar e

Sîfir yanê paqir (zeng) e me ne ziv e ne zêr e ku here cem paşayan. Sîfir e kaxizeke me dua li ser nînsand û duaya me qebûl bû. Yanê huner tede niye ji bo ku bi Kurdî nivîsiye. Dibêje zêr nîne ku here her bajarî, li ba me şehrewa ye. Şehrewa li ba me pareyek e li her mîrîtiyekê de hebûye lê tenê li wê mîrîtiyê derbas bûye. Wek nuha li hin welatan kûpon hene ku li welatên din naçin. Dibêje e me şehrewa ye. Lê ku paşayê me hebe nexdek bi sîkeya ezîz e. Yanê paşayê me hebe dibe bi sîkke. Dibe bi sîkke ku li her derê diçe.

Ji bo xelkê hatiye nivîsîn ne ji bo paşayan ku paşayê me tune ye û mîr jî guh nedaye. Jî mîrê Cizîrê re dibêje. "Mîrê ku bi nav Mîrze ye" dibêje nezer nedaye me. Mumkun e wê demê destpêk bûye û li cem xelkê qebûl nebûye ku bi Kurdî bête nivîsîn.

Wê demê şert nebûne ku edebî û şîr bi Kurdî bête nivîsîn. Heta yên Kurdî zanîbûne jî bi Erebî û Farişî nivîsîne. 2-3 sebeb hene ku ji bo çî Mem û Zîn bi Kurdî nivîsiye.

Kurmanciye sîf e bêguman e Kurmancî im û kûhî û kenarî

Kurmanciye sîf e bêguman e Kurmancî im û kûhî û kenarî Van çend xeberêd-i Kurdewarî Îmze bikin bi husnê eltaf Îsxa bikin ew bi sem'ê insaf

Van çend xeberêd-i Kurdewarî Îmze bikin bi husnê eltaf Îsxa bikin ew bi sem'ê insaf

Yanê xelk nebêjin ku Kurd nîzane, tenê kitêba wan tune ye. Kitêb çî ye?

Kitêb li cem Xanî destan e. Destan, ne dîwana şîr. Ku şîr be berê dîwana Melayê Cizîrî hebûye. Xanî Elî Herîrî û Feqiyê Teyran jî baş naskirîye.

Ji ber ku ew dibêje; Eger paşayê me jî hebûya, xwedê bidya layiqê tacek.

Ger dê hebûya me padişahêk layîk bidya Xwedê tacek tayîn bibûya ji bo wî textek zahîr vedibû ji bo me bextek

Rast e destana Homeros û Îlyada û Mahabandîya Hindî û gelek destan di tarîxa edebiyatê de hene. Destanên ku li cem me, li Rojhilatê belav bûne destanê Farişî heta heddekî Tirkî ne. Wek Şahname, Leyl û Mecnûn û Şêrîn û Xusrew bûne. Xwiyaye di dema Xanî de destan gelek belav bûne. Li cem me Feqiyê Teyran Şêxê Senan a wî heye, Qewla Hespê Reş a wî heye. Heta hinek dibêjin Dimdim jî ya wî ye. Feqiyê Teyran bêtir milî ye folklor e, ne hevqasî kûr e. Ew felsefê û fikrê ku li cem Xanî heye li cem Teyran tune ye. Kitêba Xanî hemû awayên tesewufî tede heye. Ew yê berê xwe wek kitêb nabîne. Kurd divê kitêba wan hebe.

Heta Fuzûlî jî berê Xanî ye. Heta Xanî navê Camî û Nîzamî tîne. Navê Fuzûlî neaniye; lê dema meriv Leyl û Mecnûn û Mem û Zîn dide berhev dibîne ku gelek aliyên wan ên muşterek hene. Heta hin ciyan de nîv dêr jî Fuzûlî wergirtiye. Lê ev kûriya tesewuf ku li cem Xanî heye li gelek aliyên ne li cem Fuzûlî ne jî li cem Nîzamî heye.

Sebeba yekem ew bû ku xelk nebêjin Kurd bê marifet in bê kitêb in. Ehlî nezer nebêjin ku Kurd eşq ji xwe nekirin armanc. Ehlî nezer ehlî fikr e, tesewuf e. Eşq tabî eşqa heqîqî û mecazî heye. Eşqa heqîqî li ba sofiya Xwedan e. Mecazî ehlê dinyayê ye. Xwestiyê bibêje ku li cem Kurdistan eşqa heqîqî û mecazî hebûye. Ren-

ge bibêjin Leyl û menûn li Erebiştanê çêbûye, lê Kurdistan jî wek Xaney Qubadê çîroka wê nivîsiye. Nîzamî ku ew jî bi eslê xwe Kurd e ev çîrokê nivîsiye. Şêrîn û Xusrew li Kurdistan e. Eserên wan li Bêstûn e, lê çîrok li ba Farişî, Tacik û Ozbekan heye. Lê Mem û Zîn sîf Kurdî ye. Çîrokê eslê xwe Kurdî ye. Tirba Mem û Zîn li Cizîrê ye. Bi baweriyê min Mem û Zîn li Cizîra Botan jiyane.

Şerha xemê dil bikim efsane Zînê û Memê bikim behane

Kesê bê agah be çîroka eşqê dixwîne. Kesê agahdar be dibîne ku çî ye. Ev îşareta Quranê ye, ev îşareta hadîs e, gotinekî Mutezeli ye, gotinekî Hellac e, ev hemû li nav Mem û Zîn tînin dîtî. Lê hemû bi şairane derxistiye. Ev jî şerha hemû dilê wî ye. Şairê din hene ku çûne nav tesewufê. Wek Mewlewî, Mehwi û ez nabêjim ew filozof in, ez dibêjim mamosteyê felsefê ne. Bernameyek wan a felsefî heye û li ser wê çûne.

Çi Mewlewî, çî Mehwi jî aliyê terîqet Neqşibendî ne, ji aliyê eqîde eshebî ne. Lê Xanî tevlihev e. Loma jî ez dibêjim filozof e. Ev munaqesê li ba me gelek çêbûye. Hîn dibêjin filozof e û hîn jî dibêjin ne filozof e.

Li ba Kurdistan eyb e ku Kurd filozofê wan hebe. Filozof ew e ku fikrê wî heye.

Ew sê salên ku Mem û Zîn nivîsiye, bi dîtina min 3 sal in. Munaqeseyek hebû digotin salek an sê sal in. Bawer nakim dîtîna wî di sê salan de ewqas hatibin guherîn. Lê wext teknîka çîrok e. Destpêkê de wek...dest pê dike, pêşde diçe wek çîroka îro girê dide. Dûre avahiya destana wî mestir dibe, aloztir dibe û têkeltir dibe. Dawiyê tede ser tesewufê wek tesewuf meqewat û ehwalê wî heye, digihîje mesele fenafillah ku Mem û Zîn fenafillah dîke, ew şexsiyeta Mem û Zîn ku meriv baş binêre eserên misilmanîyê ye. Hîn dibêjin ji Leyl û Mecnûn wergirtiye. Na şexsiyeta Kurdî Mem û Zîn bixwe heye. Tesîra Hellac jî di nav şexsiyeta Mem de heye.



Hellac û li riya eqîde û bawerîyê de xwe kuştin û şexsiyeta mutese-wufekî jin Rebîa ku wê ji ezab dîtiye.

Wî şexsiyeta Mem û Zîn ji gelek kitêbên îslamî derxistiye. Her weha sofî, sofîyê min ne tenê sofîyê mezin Xudanî terîqeta tesewuf e. Li cem sofîya divê her sofîyek şêxê wî hebe. Şêxê wî nebe dibêjin xuseylî "Men lem yekûn lehû şeyxon îmamêhû şeytan" kesê ku şêxê wî nebe îmamê wî şeytan e. Yanê ne misilman e. Baş e Xanî çi dike? Xanî rast e hin tiştên wî hene ku li Neqşibendiya çûye, e Melayê Cizîrî jî, be-

riya ku Neqşibendî wek terîqet li Kurdistanê hebe, her çend neqşibendî li Buxarayê hebûye. Hin tiştên wan li Neqşibendiya diçe. Lê wek terîqet bi temamî Neqşibendî beriya ku Mewlana Xalid aniye, li Kurdistanê nebûye. Lê şêxê wî kî ye?

Şêxê we ku ez bi dil mirîd im ew rûh û rewan ez qedîd im

Her çend-i li ba we navî Mem bû lê padişahêkî elîhîmem bû

Şêxê ku ez ji dil mirîdê wî me ew rûh e.

Di Mem û Zîn de 20 aletên muzîkê hene û navê wan diyar dike. Lê îro ji wan tenê def û zîrne mane. Muzîka ku di wê demê de hebû îro nîne. Ji aliyê din gelek meqamên muzîkê hene ku îro nînin. Rehawî û Se-

ma du meqamên muzîkê ne.

Ahmedê Xanî di Mem û Zîn de behsa dermanan, zêr û zîv, sîleh û çekên wê demê û tewirên xwarinê jî dike.

Di sedsala 17'an de tiştê ku ew bahs dike û Ewliya Çelebî û Şerefnamê bahs dike li Kurdistanê rewşekî ilmî hebûye. Ev ilim bi wasiteya mizgeftan hatiye belavkirin. Feodal û mîran qedr û qîmeta ilm zanîbûne. Mesela wê demê nifûsa bajarê Silêmaniyê 5 hezar bûye û 400 feqî lê hebûne. Wê demê li gelek bajarên Kurdistanê mizgeft hebûne û feqî bûne wasiteya belavkirina ilm û îrfanê.

Ahmedê Xanî behsa felekê (astrolojî) dike. Xanî bahs dike ku çawa dinê li dora rojê digere. Wê demê misilman zêde li hember vî tiştî derneketine lê fileh û dêr li hember vî yekê bûn.

Bi rastî li ba Xanî her tişt hebûye. Çi mewzûyek û ilmek nîne ku li cem wî nebe. Zanistîya ku di dema wî de hebûye hemû di Mem û Zîn de heye û hunera mezin ew e ku ew wek şîr nivîsandiyê û jê aciz nebûye. Naveroka wê jî Kurdayetî ye, evîn, bîr û felsefe ye. Wî folklor bi şîrê taze û şaristanî ve girê daye.

Şîra Kurdî ne şîra gundîtiyê ye, e bajarvaniyê ye û ev li ba Xanî eşkeretir e. Ev jî ji bo dijmin bersiveke ku ew dibêjin tenê folklor me heye. Dewrê Xanî dewra zêrîn e.

Şairekî wek Xanî bextewer nîne û wek wî jî mazlûm niye. Bextewerî ji navê wî tê. Nav û dengê wî li hemû Kurdistanê belav bûye.

Di Mem û Zîn de 2665 beyt hene ji wan 125 beyt behsa Kurdayetiyê dikin. Sêsed sal tesîra wê di nav miletekî de hebe ev pirr muhîm e.

* Ev gotar di 8.10.1995'an de di semînera Stokholmê de hatibû pêşkêşkirin. Semîner jî alî Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê hatibû amedekirin.

Çarîna Ehmedê Xanî

Ev helbesta xwarê çarîna(rubaî) zanayê mezin ê Kurd, Ehmedê Xanî ye ku bi çar zimanan hatiye nivîsîn: Kurdî, Farisî, Erebî û Tirkî. *

Fate Umrî fî hewak ya hebîbî kullî hal
Ah û nalem hemdemem şod der firaqet mah û sal
Ger benim kanım dilersen çokdan olmuşdur helal
Dîn û ebter bûm ji eşqê min nema eql û kemal

Ente fikrî fî fuadî ente rû'hî fî'l-cesed
Leşkerê xemhayê to molkê dilem wêranî kerd
Dade geldim aşk elinden isterim senden meded
Wan Tetaran birne yexma eql û dîn û milk û mal

Tale 'xemmî zade hemmî şa'e sîrrî fî'l Mela
Tesneyê camê visal em çon şehîdê Kerbela
Yoksa sen diwane oldun nice halim ey dîla
Ya ji nû ve îşweyek da min hebîba çavxezal


Bûtte hicranen hebîbî leste mînnî 'alimen
Her dem ez derdî firaqet xafilî ez halê men
Can û dilden arzi kıldım halimi canana ben
Erzûhala min tu xafil qet nepîrsî 'erzê hal

Hel lena min nî'metî wesl el-hebîbî min nessîb
Oftadem ber deret bîçare sergerdanê xerîb
Derdimiz çok lek senden ona yok hiçbir tabib
Ey tebîbê min dewayê derdê Xanî ber wîsal(1)

(1) Rîwayetek hatiye Huseynê Kerbela. Min hunreweka (şî'reka) dîtir a Xanî dîtiye, diwahiya wê ev e:

"ger nedanem rûzî mehşern ku dibînim dilberê
Dê çî lê kem Cînetê pê wer bikem xagusterî"

*Abdulreqîb Yûsuf, Şairên Kalsîk ên Kurd, Weşanên Jîna Nû, 1988, Uppsala-Sweden.



Tirba El-medîni (Tirbîna Roja Nû)





Jiyan û berhemên Ehmedê Xanî

(1650-1707)



Foto: Arif Zerevan

Prof. Joyce Blau

Ev gotar di 27. 5. 1995'an de, di Konferansa Ehmedê Xanî de, li Stockholmê hatibû pêşkêşkirin. Konferansa Ehmedê Xanî, ji alî Komeleya Nivîskarên Kurd Li Swêdê, Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê û ABF'ê ve hatibû amadekirin.

Nivîs ji kovara "Çira" hej. 3 hatiye wergirtin.

Berî her tiştî ez dixwazim ji we re bêjim, ji ber ku ez di nav we de me, ez gelekî bextiyar im. Ji ber ku ez dawetî ve civînê kirime ez sipasî Komeleya Nivîskarên Kurd Li Swêdê, herweha sipasî Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê û Federasyona Perwerdekariya Karkeran a Swêdê (ABF) dikim.

Gava ku hevalê min Malmîsanij ji min xwast da ku ez bêm û derheqê *Mem û Zînê* de bipeyivim, min ji xwe pirs kir: Gelo ji wan hemî tiştên ku derheqê şahesera şa'irê Kurd Ehmedê Xanî, *Mem û Zînê* de ji alî bisporên Kurd ên mîna Mehmet Emîn Bozarslan, Ferhad Shakely [Ferhad şakelî], 'Elaeddîn Siccadî, 'Izzeddîn Mistefa Resûl, Hejar, Perwîz Cihanî û gelekên din hatine gotin yan jî hatine nivîsandin û weşandin zêdetir ez dikarim çî ji we re bibêjim.

Di axaftina xwe de, ez dê giranîyê bidim ser çend babetên ku hîn jî kêr yan jî şaş tî zanîn: jiyana şa'ir, şertên nivîsandina *Mem û Zînê* û teknîka menzûmî ya vî berhemî ku xwediyê xwe kiriye nemir, mîna Fîrdewsî li ba Farisan yan jî Homeros li ba Yûnaniyan.

Ehmed Xanî kî ye? Ez ditirsim ku carna ji navê wî pê ve derheqê wî de

tişt nayên zanîn. Dîsa jî bi meziniya xwe ew, hemî şa'irên din ên klasîk li paş xwe dihêle, ji ber ku ew hem westayê destan û şî'ra lîrîk, hem jî yê fikr û şîklê ye. Ew sofiyek, filozofek bû ku rewşa merivan fêm dikir û xwe mîna wan hîs dikir.

Em nizanin ka berhemê Ehmedê Xanî, piştî mirina wî bi temamî mayan na. Wisa xuya dike ku hunermendiya wî ya destanî serkeftîtir bûye ji berhemên wî yê lîrîk ên ku belkî jê tenê çend perçe mane.

Berhemê bingehîn e şa'ir, *Mem û Zîn* -a ku îsal em sêsedsalîya wê pîroz dikin- menzûmeke dirêj e ku ji 2655 beytan pêk tê, ji alî wêneriya şa'irane û sehneyên lîrîkî ve dewlemend e û teknîkeke şa'irane ya ku ji zû de pêkhatibû diyar dike, [herweha] kamiliya *terîmên* (te'bîrên) ku bi awakî vekirî hebûna *derbasbûyî* ya edebî eşkere dikin, nîşan dide.


Ehmedê Xanî herweha nivîskarê ferhengeke 'Erebî-Kurdî ya bi navê *Nûbar* (*Nûbuhar*, yan jî *Nûbuhara Biçûkan*) e ku jibo zarkên Kurd hatîye amadekirin da ku ew hînî 'Erebî bibin. Me'navên 950 pey-

vikên 'Erebî, bi Kurdî hatine nivîsîn. Ev ferheng bi awakî bi qafiye ye û li gor babetan ji 14 beşan pêk tê; di tarîxa ferhengnasiya (leksikografiya) Kurdî de wek ferhenga yekem tê hesibandin.¹ Herweha Ehmedê Xanî *'Eqîda Îmanê* ya ku ji 73 beytan pêk tê û xezelên bi Kurdî, Tirkî, Farisî jî nivîsîne.

Jibo ku bispor edebiyata Kurdî keş bikin, diviya heta nivê sedsalê XIX'an bihata sekinîn. Wê demê Kurdnasî di destpêka xwe de bû û fikrê serdest ew bû ku Kurd gelekî bînivîs in û nikarin edebiyatekê biafirînin.

Lêkolînerê Rûs, V. Dittel -yek ji kesên pêşîn e ku behsa edebiyata Kurdî kiriye- ji ber keşfkirina hebûna edebiyateke Kurdî ya dewlemend a orîjînal matmayîna xwe nivîsî: "Min hîç nedîpa ku zimanê 'eşîrên Kurdan e ku ji alî rojhelatnasan ewende kêr tê nasîkirin, bikanibe li kêleka edebiyata devkî edebiyateke nivîskî ya ewende dewlemend derxe". Lê wî domand: "Kurd xwedî edebiyat in, piçek orîjînal, piçek ji çavkaniyên Farisî".²

Piştî deh salan (di 1858'an de), Kurdnasekî din e Rûs, Piotr Lerch (1828-1884) tişteki din digot: "Kurdan edebiyata xwe ya taybetî neafirandine, ji ber ku ew di yekbûn û bîdestxistina serbixwebûna xwe de bi ser neketine. Digel viya jî xwedî giyanekê jîndar û bimeraq in, ji wan bextê hinekan dest da ku hînî kultura gelên cîran 'Ereb, Faris û Tirk bibin. Yê dawîn di pêşketina întellektuelên Kurdan de alîkar bûne..."³



Jibo birêkûpêkkirina lêkolîna edebiyata Kurdî ya nivîskî ya Dema Navîn, qedrê herî mezin bi zanayê bi 'eslê xwe Polonî, dîplomatê meqambilind, bisporê ronak, berhevkarê (kolleksiyonê) bêwestan e destnivîsên Kurdî, Alexandre D. Jaba (1801-1894, li Îzmîrê mir) re careke din diyar bû.

Rûsyaya çarî, bo firehkirina desthilatdariya xwe li Qafkasyayê, ji qelsketin û paşdeçûyina Împeratoriya Osmanî û Îranî îstifade kir. Leşkerên (orduyên) Rûsyaya bi 'asiyên Kurd re, bi parêzkarên sînorên van Împeratoriyan re ku pîr bi kêrî Rûsyaya hatin, têkilî danîn û Akademiya Çarî ya Zanistan a St. Petersburgê bû yekemîn merkeza Kurdnasiyê ya dinyayê.

Dema ku Alexandre Jaba di 1848'an de bû konsulê Rûsyaya yê Erzeromê, Akademisyen B. Dorn pêşniyar kir da ku ew jibo hînbûna *Kurmancî* ji konsuliya xwe ya li welatê Kurdan îstifade bike. Ji wê rojê şûn de, A. Jaba hemî wextê xwe yê vala jibo hînbûn û berhevkirina materyalên li ser ziman, edebiyat û tarîxa gelê Kurd terxan kir; wî dê ev karê xwe heta dawîya jiyana xwe bidomanda.

A. Jaba dest pê kir bi zanayên Kurd re têkilî danî, ku herî bijarteyê wan Mehmûd Efendî Bayezîdî gelek alîkariya wî kir. Mehmûd Efendî êdî merivekî pîr, nêzî şêst salî bû. Di 1797'an de li Bayezîdê ji diya xwe bûbû, li vî bajarî dest bi xwendina xwe kiribû, paşê li Tewrêzê (Tebrîzê) dom kiribû. Qur'an, edebiyata 'Erebî, Farisî û Tirkî xwendibû. Piştî ku li seranserê Kurdistanê gerriya, vegeriya Bayezîdê, ku li wir medreseyek îdare dikir. Dema ku mîrîtiya Kurdî ya Bayezîdê têk çû, Mela Mehmûd li Erzeromê bi cî bû, ku li wir karê "xo'a" tî dikir. Wê demê di nav 'alimên welêt de gelek qedrê wî hebû. Mela Mehmûd, jibo A. Jaba mamostayekî bêhempa, jibo berhevkirina destnivîsan hevkarêkî jêhatî bû, kopîst (mustensix) û wergêrê wî bû. Ew herweha nivîskarê lêkolînen girîng jî bû, mîna: *'Adat û Rûsû matnameyê Ekradiyye* û wergera *Kurmancî* ya *şerefnameya Mîr şeref Xanê Bedlîsî*.⁴

Alexandre Jaba encamên lêgerîna xwe yê li ser ziman û şaristanîyeta Kurdan bi awakî rêkûpêk ji Akademiya Çarî ya Zanistan a St. Petersburgê re şandin. Wî bi hevkarîya Mehmûd Efendîyê Bayezîdî kolleksiyoneke yekta ya ji 57 perçeyan pêkhatî berhev kir. Ev kolleksiyona ku di 1868'an de gihaye Kutubxaneyê Giştî ya Çarî ya St. Petersburgê, bi pirranî ji berhemên şa'irên Kurd ên Dema



Navîn, wek yê Feqiyê Teyran, Melayê Batê, Melayê Cizîrî û şahkarê şî'ra Kurdî *Mem û Zînê*⁵ pêk tê. Di nav vê kolleksiyonê de herweha destnivîsên yekta yê şa'ir Xarîs Bitlîsî, Selîm ibn Silêman (Ûsib û Zelîxe, sedsala XVI'an), Remedanî, Murad Xan Bitlîsî û hwd. hene. Ev xezîna rastikên (rastîn) a jibo lêger û bisporên edebiyata Kurdî, demeke dirêj hatibû jibîrkirin; bes di destpêka salên 1960'î de ji alî lêkolînera Ukraynayî Margaret B. Rudenko⁶ -ku paşê çend heb ji van tekstan weşandin-⁷ ve hat keşfkirin.

Derheqê jiyana Ehmedê Xanî de çavkaniya me ya pêşîn a agahdarîyê, kurtenivîsa ku ji alî Mehmûd Efendî Bayezîdî hatiye nivîsîn e û Alexandre Jaba ew [kurtenivîs] di kitêba *Recueil de notices et récits kourdes, servant à la connaissance de la langue, de la littérature et des tribus du Kourdistan* -ku bi emrê Akademiya Çarî ya Zanistan di 1860'î de li St. Petersburgê hat çapkirin- de weşandiye. Li wir em dixwînin: "... Eslê wî [Ehmedê Xanî] jî jî tayîfeya Hekariyan ji 'eşîreta Xaniyan e. Bixu hatiye Bazîdê di tarîxa hezarî da tewettun kiriyê. Di zimanê Kurmancî da Mem û Zîn nav kitêbek 'aşiq me'sûqan gotiye û kitêbek luxetê jî bi Kurmancî û 'Erebî gotiye, navê [wê] Nûbihar e û zarûkê di Kurdistanê hemû di piştî Qur'anê dixûnin û zehf jî xezeliyat û eş'aran û beyt bi zimanê Kurmancî gotiye û di zimanê 'Erebî û Farişî û Tirkî [de] jî dîsan xezeliyat û eş'aran û ebyat zehf gotiye û di 'ulûmê funûnan [de] jî qewî mahir û sahib'irfan e û ji şu'erayêd Kurdistanê hemûyan jî meşhûr û fayiq e belkî ji hemî şu'eran meqbûl û memdûh e û di hezar û şêst û sê da jî merhûm bûye û di nêv Bazîdê da mizgevtêk jî bi navê xu bîna kirîye û bi xu jî li kinarê mizgevtê medfûn e we ellahû e'lem."

Ev belgeya kurt gelek girîng e, çunkî tarîxa giştî ya Kurdan a sedsala XVII û XVIII'an hîn jî baş nayê naskirin û ev jî xebata tarîxa edebiyata Kurdî zehmet dike.

Sedsala XVI'an, di tarîxa herêmê de guherîneke rastikên nîşan dabû. Di destpêka vê sedsalê de şah Îsmailê Sefewî, ne tenê hakimê Îrana Rojavayê, herweha yê Ermenistanê, Mezopotamyayê û yê Bexdadê bû. Jibo ku ji Sultan-Xelîfeyê Osmanî yê Sunnî -ku li Îstebolê dima- re serî netewîne, şîrtî wek dîne nû yê Dewleta Sefewî qebûl kir. Mezinbûna Dewleta Sefewî ber bi rojava, piştî şerrê Çaldîranê (1514) yê navdar, bi temami hatibû sekinandin. Di wî şerrî de, mîrên Kurdan hemberî Sefewiyan bi awakî qet'î piştgiriya Sultanê Osmanî, Selîm kirin. Wê demê perçeyê herî mezin ê Kurdistanê di bin bandûra Osmanîyan de bû.

Kurdistan bû ciyê şerrên bêdawî yê navbeyna împetoriyên Îranê û Osmanîyan û Kurd ligor peymanan ku bi Sultan Selîm re çekiribûn, beşdarî van şerran bûn. Bajarên Kurdan ku dê bikaribûna bibin kakilê dewleteke

Kurdî, hatibûn wêran- kirin û hejmara Kurdan kêmbû.

Di dema Ehmedê Xanî de, Kurdistan a ku şerefeddîn Xan di dawiya sedsala XVI'an de wek hejmareke mîrîtiyên Kurd ên otonom behs dike, jiber şerrên berdewam piçûk bûbû û bi taybetî nufûsa Kurdan bi xisarên mezin kêmbû. Di vê periyodê de edebiyatek pêş de diçe ku tê de, di awayê teswîrkirina bûyerên jiyana rojane û karakterên kesên de, di hewla îfadekirina rastiya tarîxî ya konkret de, meyla îfadekirina rastîyê xwe nîşan dide.

Di vê rewşê de şa'ir Ehmedê Xanî *Mem û Zîn*, destana romanesk (mîna roman) a ku tê de çarenûsa giştî ya gelê Kurd ciyê xwe ji drameke şexsî ya qehremanan re dihêle, nivîsî. Çîroka xembar a Mem û Zîn a dotmîr bûye semboleke millî û îfadeyên welatperwerî tê de gelek in.

Bo ku sedema nivîsandina vê kitêbê diyar bike em gotinê ji Ehmedê Xanî re dihêlin:⁸

- 235 Xanî ji kemalê bêkewalî
Meydanê kemalê dît xalî
236 Ye'nî ne ji qabil û feqîrî
Belkî bi te'essub û 'eşîrî
237 Hasil ji 'inad eger ji bêdad
Ev bid'et kir xilafê mu'tad

Çi ye ev bid'et, ev "karê nû, yan jî gunehkarî"? Ev, bijartina nivîsandina bi Kurmancî ye. Heta wê demê, li Anadoluyê, li Îranê û hetta li ciyên dût ên mîna Hindistanê,⁹ zimanê Farişî yê ku bi sedsalan e pêkhatibû, bûbû wasiteya edebiyateke hêzdar û aleta ragihandinê; ne tenê di hemî çîhana Îranî de herweha di beşekî mezin ê Asyayê de. Farişî roleke dilîst ku mîna rola 'Erebî di nav gelên Misilman de di sedsalên pêşîn ên hicrî de yan jî rola Frensî li Awrûpayê di sedsala XVIII'an de bû. Şa'ir û nivîskarên ku ji sinifên serdest dihatin bi Farişî dinivîsandin. Hekîm Îdrîsê Bedlîsî yê Kurd (mirina wî: 926/1520) *Heşt Beheşt* a ku cara pêşîn behsa sultanên pêşîn ên Osmanî dike bi Farişî nivîsî. Herweha, hakimê mîrîtiya Kurdî ya Bedlîsê, Mîr şeref Xan ibn şemseddîn Bedlîsî (1543-1604) di dawiya sedsala XVI'an de şerefname yan "Tarîxê Mofesselê Kordestan" ku îro jî derheqê tarîxa Dema Navîn a Kurdan de çavkaniya bingehîn e, bi Farişî nivîsî.

Nivîsîna bi Kurdî bê zehmetî nebû. Şa'ir dibêje:

- 355 Ez pêlewer im ne gewherî me
Xodreste me ez, ne perwerî me
356 Kurmanc im û kohî û kinarî
Van çend xeberêd Kurdewarî



Konferansa Ehmedê Xanî ji milê çepê ber bi rastê Hesên Ghazi, M. V. Bruinessen, Malmisanîj, Prof. Joyce Blau û Mûrad Cûwan

- 357 Ymza bikin ew bi husnê eltaf
Esxa bibin ew bi sem'ê insaf
Ew şîrove dike:
238 Safî şemirand vexwar durdî
Manendê durrê lisanê Kurdî
239 Înaye nizam û intizamê
Kêşaye cefa jiboyê 'amê
240 Da xelqê nebêjtin ku Ekrad
Bême'rîfet in, bêesl û binyad
Lê, şa'ir gazinan dike ku Kurd xwedî padîshahekî zana ninin ku li dor wî bicivin, padîshahekî ku piştgirê 'ilm û edebiyatê bibe tune. Eger ev îmkan hebûya, wê demê:
250 Min dê 'elema kelimê mewzûn
'Alî bikira li banê gerdûn
251 Bîna ve rûhê Melayê Cizîrî
Pê hey bikira 'Elî Herîrî
252 Keyfek we bida Feqiyê Teyran
Hetta bi ebed bimaye heyran

Bi van rêzan, Ehmedê Xanî pêşiyên xwe qebûl dike. Ew lawê me'newî yê 'Elî Herîrî, Melayê Cizîrî û bi taybetî jî yê Feqiyê Teyran ê şa'ir e. Wek sê pêşiyên xwe, şa'irê me ji rîska dev ji 'adeta bicîbûyî û qanûnên edebî yê dema xwe berdanê xwe nade paş û bi Kurmancî dinivîse. Bi rastî jî şêx Ehmed Nîşanî (1570-1640) yê ku zêdetir bi navê Melayê Cizîrî hatiye naskirin û ji Cizîra Botan e -wê demê mîrê mîrîtiya Cizîra Botan 'Îmadeddîn ê hêzdar bû-, dîwaneke gelek navdar li pey xwe hiştîye ku tê de nêzî 2000 beyt hene û li medreseyên Kurdistanê timî hatiye xwendin. Ev dîwan ji qesîde (menzûmeyên yekqafîyeyî yê 15-30 beytî) û xezelan (menzûmeyên kurt ên 5-12 beytî) pêk tê, şa'ir tê de kurtî, şîrinî, melodiya uslûbê û xweşîya şîrî digerre. Ber bi dawiya sedsala X'an, sofiyan kiribûn 'adet ku di civînan xwe de xezelan bistrên. Ev, jibo sofiyan wasiteyek bû da ku xwe ji rewşa wecdê re amade bikin. Bi vî awayî xezel ji îlhama sofiyane pêk hat ku diviya roleke ewqas girîng bilîsta.

Şa'irê ku herî zêde tesîr li Ehmedê Xanî kiribû Muhemmedê Mikîsî yê bi

nasnavê Feqiyê Teyran (1590-1660) bû. Tê gotin ku, mîna Saint François d'Assise wî jî zimanê çivîkan dizanî. Dibe ew yekem şa'irê Kurd be ku hikayetên menzûm ên şîrî yê dirêj bi awayê mesnewî nivîsîne.¹⁰

Mesnewî menzûmeyek e ku her beyta wê ji du misrayan pêk tê û [her beytek] bi serê xwe ye. Wezna (*behra*) du misrayan mîna hev e û qafiye di nav du misrayan de heye. Metoda mesnewî, di edebiyata Rojavayê de mîna ya "*Canterbury Tales*" (Çîrokên Canterbury) a şa'irê Îngiliz Geoffrey Chaucer (1340-1400) e. Ev form jibo menzûmeyên destanî yê narratîv (awayê têgihandinê) yan romanesk (mîna roman) û jibo menzûmeyên hînker (dîdaktîk) ên her tewirên (jenrên) exlaqî, tarîxî, doktrîna dînî hatibû bikaranîn. Ev form gelek caran jibo fêrkirina sofiyan hatiye bikaranîn.

Hikayeta menzûm ji destpêka sedsala XI'an vir de elaqeyê mezin dîtibû. Ehmedê Xanî minnetdarê pêşengên mezin ên vê tewira (jenra) menzûm bû. Piştî ku wî bi awakî dilşikiyayî, xemsariya zihniyeta menfe'etpe-restane û çavbirçîtiya hemwelatîyên xwe dît, weha nivîsî:

- 256 Ger 'ilmê temam bidî bi pûlek
Û bifiroşî tu hikmetê bi solek
257 Kes nakete mîterê, xwe Camî
Ranagirtin kesek Nizamî

Ehmedê Xanî navê Nizamî û Camî dibêje, du şa'irên ku navdariya wan bêsînor bû û bêhejmar kesî dixwest wan teqlîd bike. Wan "medreseya Azerbaycanê" (ekola Azerbaycanê) vejand ku bingehê wê ji alî şa'irê lîrik Qetranê Tebrîzî (piştî 1072'yan mir) hatibû danîn. Qetranê Tebrîzî, ji hakimê Gence yê Kurd re xizmet kiribû. Gence, li piştqafqasyayê paytextê malbata Kurd a navdar, şeddadiyan



bû ku wan ji 951'ê heta 1075'an 124 salan li wî aliyê çemê Arasê, di herêmeke fireh de hukûm kiribû. Şaxekî din ê şeddadiyan ji 1064'an heta 1198'an li bajarê Xirîstiyânê Ermenî, Anî ya ku bi 1001 kilîseyên xwe navdar e hukûm kir. Şeddadiyan bi çalakîyên xwe yê cengdarî û aşîryane bi cîranên xwe yê Xirîstiyân re ketibûn têkiliyê: Bi Ermenî û Gurcîyan re û bi dagîrkerên din ên mîna Alan û Ūrisan re, ku ji bakurê dihatin.

Nîzamî (Celaleddîn ibn Yûsif) li Genceyê ji diya xwe buye (535/1140 - di 599/1203'an de di 63 saliya xwe de mir). Diya wî Kurd bû. Yê ku tewira (jenra) mesnewiya menzûm a bi awakî serkeftî bi destana romanesk a menzûm re lihevhatî nivîsiye ew e. *Xemseya wî* ya navdar ji pênc menzûmeyên romanesk pêk tê, ku ji wan *Xosrew û Şîrîn* çîroka evîna şahê Sasaniyan Xosrew û dildara wî şahbanûya Ermenî ye; *Leyl û Mecnûn* îlhama ji edebiyata 'Erebî ya berî Îslamê ye ku fikra Nîzamî ya li ser evîna herî pak pirr baş temsîl dike.

Ehmedê Xanî herweha behsa Camî jî dike. Camî (Nureddîn 'Ebdulrehman, di 1414'an de, li Camê, li herêma Heratê -ya ku demekê paytextê Xorasanê bû- ji diya xwe bûye û sala 1492'yan miriye), şa'irê dawîn ê Farîsî-ya dema klasîk e ku bi berhemekî xwe -ku hem di edebiyata Farîsî de hem jî di doktrîna sofîtî ya li ser bîngeha İbnî 'Erebî de dewlemend e- pirr balkêş e. Ev şa'ir, bi pêşkêşkirina tewirên (jenrên) edebî yê Farîsî li serhev, bi îlhamdanê jibo nîfşekî nû, gelek xwedîtesîr bû.

Jibo nivîsandina kitêba xwe, yek ji abîdeyên edebiyata devkî ya Kurdî -Mem û Zîn yan jî Memê Alan- ji xwe re wek bîngeh girt. Ew efsaneyê kevn e ku tê de tiştên çîrokî û xeyalî tevîhev dibin û behsa evîna pak û îlahî ya mîrê Kurdan Memî û dotmîr Zînê dike.¹¹ Bi amadekirina vî berhemî amanca Ehmedê Xanî ew bû ku berhemek Kurdî binivîse da ku bibe destpêka edebiyateke nû û li ba birayên xwe hişeke (şu'ûreke) millî peyda bike.

Ehmedê Xanî, jibo nivîsandina menzûmeya xwe dibe ku ji çîroka *Leyla û Mecnûn* a Nizamiyê Genceyî ya ku menzûmeya dirêj a ji 4000 beytan pêkhatî ye û perçeyê *Xemseya* navdar e, îlham

girtibe. Bêguman wî awayê mesnewî bijart ku pêşkêşkirina çîrokekê hêsan dikir û jibo şî'ra destanê herî munasib ew bû. Di mesnewî de her beytek ji du misrayan pêk tê, di her misrayê de bi qasî hev pê hene. Misra yekem û duyem bi hev re bi qafiye 'ne (*qafiye: 'erûz û derb*).

Wezn (*behr*) a ku Ehmedê Xanî bijartîye, ew wezn e ku Nîzamî di *Leyl û Mecnûn* a xwe de bikar aniye, yanî *hezec* e ku yek ji qalibên wezna şî'ra 'Erebî-Farîsî ye. *Hezec* qaliba wezna herî fireh e û dest dide ku şa'ir bi dehan pêyan cihê, herweha îmkânên cihê bikar bîne. Her qalîba *hezecê*, di misrayekê de herî kêr ji sê pêyan û herî zêde ji pênc pêyan pêk tê. Ev, wezneke populer, kurt, sivik, ahengdar (muzîkal) û lezkî (bilez) ye ku pirr baş li zîmanê Kurdî tê. *Hezecê museddes* (hezeca şeşî) yan jî heke meriv rasttira wê bêje *hezecê exrebê museddesê meqbûzê mehfûz* wisa pêk hatiye:

ş ş o / o ş o ş / o
ş ş //
mef : 'û: lu / mu: fâ: 'i: lun
/ fa: 'û: lun

ş ş o / o ş o ş / o
ş ş //
mef : 'û: lu me: fâ: 'i: lun /
fa: 'û: lun

Ehmedê Xanî çar problemên herî girîng formûle û pêşkêş kirine û jibo bersîvê danîne pêş edebiyata Kurdî: fonksiyonên nivîsê, rola şî'rê, têkiliyên di navbeyna zîman, edebiyat û civatê de û ya dawîn jî statuya zîman bi xwe.

Ez axaftina xwe bi çend beytên Ehmedê Xanî diqedînim:

342 Ev mêwe, eger ne abdar e Kurmancî ye ew qeder li kar e

343 Ev tifle, eger ne naze-nîn e Nûbar e qewî bi min şîrîn e

344 Ev mêwe, eger ne pirr lezîz e Ev tifle bi min qewî 'ezîz e

345 Mehbûb û libas û gûşwar e Milkê di min in, ne miste'ar e

Yê ku ji Frensî wergerandiye:
M. Malmîsanij



¹ Di nivîsandina vî berhemî de dibe ku ji ferhenga menzûm a 'Erebî-Farîsî ya Ferahî [Ebû Nesr Mes'ûd, di 1242'yan de miriye] ya bi navê Nisab el-Sibyan îlham hatibe girtin. Binêre *Mémoire de Diplôme d'Études Approfondies* ku pêşkêşî *Université de Paris III, Sorbonne Nouvelle* bûye: Ameen Ghazi, *Litterature kurde, Ahmadê Xanî (1650-1707), Texte, analyse, commentaire et traduction du glossaire "Nû bâr-â buçukân"*, Paris, 1985.² Bide ber (Cf.): *Destpêka "Aperçu sommaire de trois ans de voyage en Asie, dans le Caucase, la Perse, le Kurdistan, la Mésopotamie"*, in: *Nouvelles Annales de Voyages*, (Paris), 1849, cild 3, rr. 141-168.

³ Bide ber: *Compte-rendu des publications de la Bibliothèque Impériale*, 1868. Bide ber: M. B. Rudenko, *Literaturnaja i fol'klornyje Versii kurdkoj poemy "Yusuf i Zelixa"* (Versiyonên Edebî û Zargotinî yê Menzûmeya Kurdî "Yûsuf û Zelîxa"), ed. NAUKA, Moskova, 1986, r. 4.

⁴ Şerefeddîn, di 1596'an de şerefnameya xwe ya ku îthafî Sultan Mehmet ê Sêyem kiribû, nivîsî.

⁵ Ji alî Muhemmed Xerîb Silêman hatiye kopyakirin. Dibe ku Muhemmed Xerîb Silêman, yek ji nasnavên Mehmûd Efendî Bayezîdî be.

⁶ M. B. Rudenko, *Opisanie Kurdkix Rukopisei Leningradskix (Tewîra Destnivîsên Kurdî yê Kolleksiyona Leningradê)*, Moskova, 1961.

⁷ Ehmedê Xanî, *Mem û Zîn*, Moskova, 1962; *Feqî Teyran, Şêx Sen'an*, Moskova, 1965; *Harîs Bitlîsî, Leylî û Mecnûn*, Moskova, 1965.

⁸ Jibo menzûmeya Ehmedê Xanî me ji xwe ra kitêba M. B. Rudenko bîngeh qebûl kir: *Ahmed Xanî, Mem i Zîn, Enstituya Gelên Asyayê, Moscou*, 1962.

⁹ Bide ber: *Emîr Xosrewê Delhî [1253-1324]*.

¹⁰ Wî, berhemên xwe bi herfên "Mîm Hey" îmza kirine: *Hikayeta Şêxê Sen'anî, Qiseya Bersîyayî, Qewlê Hespê Reş*.

¹¹ Li xebatên bîngehî ên bisporê vê destanê Michael Chyet û bi taybetî jî teza wê ya çapnebûyî binêre: *And a thornbush sprang up between them: Studies on "Mem û Zîn", a Kurdish romance (volumes I and II)*, University of California, Berkeley, 1991, U. M. I. Dissertation Information Service.

¹² Xelîl hezec kiriye 6° beş.

ji Armancê

1 sal, 300 sal di ser nivîsandina şahesera Ehmedê Xanî "Mem û Zîn" ê re derbas dibe.

Ne hewce ye ku em di vê stûnê de li ser mahne û naveroka Mem û Zînê rawestînin, ji ber ku me ji bo vê dastanê hejmareke taybetî veqetand.

Em bawer in ku hûn dê hevpeyvîna bi M. Emîn Bozarslan re, gotara Mûrad Ciwan "li ser felsefe û tesawwufa Ehmedê Xanî", nivîsa Îzedîn Mistefa Resûl û Joyce Blau û dîtînen rewşenbîr û siyasetvanên Kurdan ên li ser yekîtiya neteweyî bi kêfxweşî bixwînin.

Me nivîsa Mûrad Ciwan "Mem û Zîn kengê jiyane?" û ya Joyce Blau "Jiyan û berhemên E. Xanî" ji kovara "Çira" yê (hejmar 3) wergirtin.

* * *

Di vê 300 saliyê de Kurd û bi taybetî jî Kurden mişext konferans, sêminer û panelên rengareng li dar xistin.

Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêdê û Komeleya Nivîskarên Kurd li Swêdê bi vê munasebetê di 27ê Gulanê de konferansek û di 10ê Çiriya Pêşîn de jî sêminerek amade kirin.

Herweha KOMKARê jî di 20-22'yê Çiriya Pêşîn de li Almaniyayê bi navê "Konferansa Navneteweyî ya Mem û Zîn û Ehmedê Xanî" konferansek amade kir.

10 kovar û rojnameyên Kurdan ên ku li Swêdê weşanên xwe didomînin, bi hevdû re li ser 300 saliya "Mem û Zîn"ê afîşek derxistin.

* * *

Li ser yekîtiya Kurdan jî me ji 25 rewşenbîr û siyasetvanên Kurd re nameyek şand û ev pîrsa ku li jêr hatiye nivîsandin, ji wan kir. Lê mixabin piraniya wan bersiva me nedan. Em di vê hejmarê de, nivîsên kesên ku bersiva me dane, çap dikin.

Pîrs: "Tevî ku Ehmedê Xanî berî 300 salî Mem û Zîn nivîsandiye û tê de daxwaza yekîtiya Kurdan kiriyê, di ser re 300 sal derbas bûne, hîn jî yekîtiya Kurdan pêk nehatiye. Li ser vê yekê ditîna we çî ye?"

Resmê qapaxa vê hejmarê ji aliyê Seîd Rêzanî ve hatiye çêkirin.



Mem û Zîn kengê jiyane?



Mûrad Ciwan

Gellek ji wan kesên ku li ser Mem û Zîna Ahmedê Xanî rawestiyane behsa wê yekê nekirine ku gelo evîndariya Mem û Zînê buyereke efsanewî ye an rastiyeke dîrokî ye. Herwekî ku tê zanîn ji bilî Mem û Zîna Ahmedê Xanî, destaneke din a evîna navbera Mem û Zînê heye, bi navê "Memê Alan". Ev destaneke folklorî ye û buyer û motifên dîrokî û efsanewî tê de têkilî hev dibin.

Heta Nûreddîn Zaza di Memê Alanî de koka vê destanê digihîne destaneke meşhûr a dema Împaratoriya Medan. Li ser vê yekê jî îddîa dike ku Ahmedê Xanî, Mem û Zîna xwe li ber vê destana mîtolojîk a folklorîk hûnandîye. Lê rexne li Ahmedê Xanî digre ku ji bo çî ew vê rastiye înkâr dike. Li gorî Nûreddîn Zaza, Ahmedê Xanî di Mem û Zînê de bi van malikên jêrin dide diyarkirin ku Mem û Zîn bi her awayî esera wî ye, ji tu kesî nehatiye sitendin:

Ev name eger xirab e, ger qenc
Kêşaye digel wê min dused renc
Nûbare ye, tûf e, nûresîd e
Herçendî nehî qewî guzîde
Lê min ji rezan nekîr temetu'
Manendê dîzan bikin tetebbu'

.....
Mehbûb e lîbas û goşîwar e
Milkêd min in ne muste'ar e
Elfaz û me'anî û îbarat
Înşa' û mebanî û îşarat
Mewzû' û meqasîd û hikayet
Mermûz û menaqîb û dirayet
Uslûb û sîfet û me'ne û lefz
Esla nekîrin me yek ji wan qerz
Bilcumle netaicêd fikr in
Dûşîze û nû'erûs û bîkr in

Bi baweriya me, gava di malikên jorîn de Ahmedê Xanî behsa wê yekê dike ku ev eser ji kesî nehatiye deynkirin û bi hemû awayên xwe encamên fikrên wî ne, qesda wî jê ne ew e ku bixwaze bibêje ku efsaneyekê welê tunebuye û wî ev ji ber xwe afirandîye. Na, bi 'eks, ew di Mem û Zîna xwe de êşkere diyar dike ku efsaneyekê wiha di nav miletî de he-

ye, lê ew dixwaze vê efsaneyê bi felsefe û hunermendîyêke bilindtir ji nû ve vejîne:

Sazê dilê kul bi zîr û bem bit
Sazendeyê işqê Zîn û Mem bit
Şerha xemê dil bikim fesane
Zînê û Memê bikim behane
Nexmê we ji perdeyê derînim
Zînê û Memê ji nû vejînim
Me'lûl bûyîn hebîb û 'uşşaq
Îrohe wakî tebîbê h'azaq
Derman bikim ez ewan dewa

kim

Wan bêmededan ji nû ve rakim
Derdê di dilê Memê cîgerrêş
Zîna ji derûnê dil cefakêş
Wê perdegîya 'efîf û mestûr
Wî bêgunehê ji tuhetê dûr
Meşhûr bikim bi terz û uslûb
Mumtaz bibin muhib û mehbûb
Ew renga bikim ji nû serefrâz
Da bêne temaşayê nezernaz
Dilber li Memê bikin girînê
Aşîq bikenin bi derdê Zînê
Hemderd bikin bi wan sefayê
Bêderd bikevne h'elwelayê
Xelqê ku ji sî.ze û ji dil saf
Pakîzesirîşt û ehlê însaf
Bilcumle bikin ji bo me tehsîn
Bêjin ku "Bi qencî hate tawîf."

Heta ew dide xwiyakirin ku çîrokbêjekî (rawiyekî) ev destan ji wî re gotiye û ew jî ji devê wî neqil dike:

Neqqaşê sehîfeyê hikayet
Neqqadê sebîkeyê riwayet
Kêşa bi vê terhê resm û ayîn
Lê da bi vê terzê derb û teşîn
Go: Padîşahêk zemanê sabîq
Rabû di hukumeta xwe faîq
.....

Çîroka Mem û Zînê di esera Ahmedê Xanî de bi vî awayî dest pê dike û dewam dike. Di hin derên din ên Mem û Zînê de jî behsa rawiyekî tê kirin ku xwedêgiravî çîrok ji Ahmedê Xanî re gotiye.

Bi baweriya me, gava Ahmedê Xanî îddîa dike ku wî ev eser ji kesekî deyn nekiriye qesda wî jê ew e ku wî, wekî hin şairên din ên wê demê, çîroka miletekî din, ji ber esera şairekî din negirtiye. Wê demê dihat dîtîn ku gellek şairan Leyla û Mecnûn, Yûsuf û Zuleyxa, Ferhad û Şîrîn û destanên mayîn ji ber esera şairekî din digirtin û bi navê esera xwe pêşkêş dikirin. Ahmedê Xanî bi wan malikên xwe yên ku me li jorê dan, dixwaze bêje ku min malzemeyê xav ne ji çîroka miletekî din lê ji ya miletê xwe girt ku heta niha tu kesî ew nehûnandîye, loma jî min ew ji ber tu şairî wernegirtiye, ev malzemeyê xav min bi xwe hûnandîye, bi her awayî ne-tîceya fikra min e.

Loma jî meriv nikare îddîa bike ku Ahmedê Xanî hebûna destana Mem û Zînê înkâr dike û wê dike malê xwe.

Beriya Ahmedê Xanî, Melayê Cizîrî jî di şî'reke xwe de bi



pesindayin behsa navê Mem û Zînê tîne, ku di vê meqalê de piçekî li jêr, bi wesîleyêke din em ê li ser vê şî're rawestin.

Abdulreqîb Yûsuf di esera xwe ya bi navê Hunerê Tabloyên şerefnamê de, gava li ser bîst tabloyên rengîn ên mînyaturî radiweste -ku ev tablo di kitêba destnivîs a şeref Xanê Bedlîsî ya bi navê şerefnamê de bicîhbûne-(nivîskar îddîa dike ku hem beşekî girîng e vê destnivîsê, hem jî bîst tabloyên mînyaturî ihtîmaleke mezin ji destê Mîr şeref Xan bi xwe derketine) behsa wê yekê dike ku tabloya pêncan (ku di çapa Jîna Nû ya kitêba Abdulreqîb Yûsufî de bi şaşîti wekî tabloya çaran derketiye) dêmena Cizîra Botan û ya Mem û Zînê ye. Gava meriv bala xwe dide tabloyê, meriv dibîne ku tablo ji-bo ku gellekî berî Ahmedê Xa-

nî hatiye teswîrkirin ne li gorî teswîrên kitêba Mem û Zînê ye lê li gorî varyanta gelêrî ye ku bi navê Memê Alanî hatiye naskirin¹.

Hin lêkolîner û nivîskar jî hene ku buyera evîndariya Mem û Zînê rastiyeke dîrokî dizanin û hetta tarîxa vê buyerê jî didin.

Ji van yek 'Elaeddîn Seccadî ye, yê din Abdulreqîb Yûsuf e.

'Elaeddîn Seccadî di Mêjûyî Edebî Kurdî de dinivîse ku: "Le dewrûberî 1350 mîladî da Enîr Zîyeddîn -nawêkî Kurd hebû- ke dîr nîye şwênî daniştinî le dew-ûberî Xelîcî Eskenderûne bûbêt we fermanrewayî beser hemû welatî Botan a kir-dibêt- du kiçî perîamêzî hebûwe; yekî Stî û yekî Zîn..."²

Mamoste Abdulreqîb Yûsuf, di kitêba xwe ya bi navê Dîwana Kurmancî de (ev kitêb di

1988'an de li Swêdê ji alî Weşanxana Jîna Nû bi navê şairên Klasîk ên Kurd careke din hate çapkirin) fotografekî gorrekê çap dike ku kêla wê xwiya dike. Li ser kêla gorrê reqema 854'an heye. Mamoste Abdulreqîb Yûsuf dinivîse ku ev fotografê gorra Mem û Zînê ye ku li Cizîrê li nav Medresa Mîr 'Evdalî, li jêrmînekê ye û ew reqema li ser kêlê jî tarîxa hîcrî ya mirina Mem û Zînê ye. Herçî di fotografê de ne diyar e jî Abdulreqîb Yûsuf diyar dike ku gorreke din jî li rex wê gorrê heye û li nav xelkê Cizîra Botan belav e ku ev gorr jî ya Beko ye.³





Nexwe li gorî vê tesbîte Mem û Zîn di 854'ê hicrî/1451'ê mîladî de mirine. Di nota binî ya li ser vê nivîsê de Abdulreşîb Yûsuf wiha dini-vîse:

"Ev medrese [qesd jê medresa Mîr Evdalî ye] wek ku ji navê wê tê zanîn, Mîr 'Evdal (El Enîr Ebdal) avakiriye. Lê ew mîr kî ye û di kîjan çerxê de jiyaye, baş nayê zanîn. Ew qas tenê tê zanîn ku ji çerxa 8'ê hicrî (14'ê mîladî) heta 1014'ê hicrî (1605'ê mîladî) du kes bi navê Mîr Evdal bûne mîrê Cizîrê.

Mîr 'Evdalê yekem berî sala 796'ê hicrî (1394'ê mîladî) koç kiriye. Çimkî kurê wî Mîr Îzeddîn di vê salê de mîrê Botan bûye. Herwekî di tarîxa Kurd û Kurdistan di rûpelê 161'an de û di şerefnamê de hatiye ku wî di sala 804'ê hicrî de êriş biriye ser eskerên Tîmûrleng û li dijî wan şer kiriye.

Mîr 'Evdalê duyem neviyê Mîr 'Evdalê yekem buye. Mîr 'Evdal, piştî mirina bavê xwe Mîr Îzeddîn, bi veşartî di nav eşîra Hewrex (Ewrex) de maye. Ev Mîr 'Evdal hevçaxê Mîr şemseddînê kurê Mîr şerefê kurê Mîr şemseddînê Mîrê Bedlîsê bûye. Herwekî di şerefnamê, di rûpelê 165 û 504'an de hatiye, li dorûbera sala 835'ê hicrî di navbera wî û Mîrê Bedlîsê de rûdanek qewimiye. Piştî vê em tu saloxekê ji vî mîrî nagirin. Li ba min ne dîr e ev Mîr 'Evdal, Mîr Zeydînê birayê Stiya Zîn be. Zeydîn (Zeyneddîn) jî leqeba wî be û jiyabe heta piştî Mem û Zînê û di sala 854'ê hicrî (1451'ê mîladî) de yan jî piştî vê salê ev medresa han li ser gorra wan ava kiribe. Ev gorra ku li rexê gorra Mem û Zînê ye, ger ne ya Beko be, mumkun e ya Mîr 'Evdal be."⁴

Li gorî vê, bi hindikayî sed sal ferq di navbera tarîxa 'Elaeddîn Seccadî û ya Abdulreşîb Yûsuf de heye.

Di Mem û Zînê bi xwe de, hin malik hene belkî karibin alîkariya mirovî bikin ku meriv dema jiyana Mem û Zînê û ya Mîr Zeyneddînî texmîn bike. Lê bi şertê ku meriv karibe zanibe ku ev tesbîta ku di Mem û Zînê de hatiye kirin çend ne xeyalî ye, çend nêzî rastiyê ye.

Ew malik di wê behsê de ye ku gava Beko diçe li ba Mîr Zeyneddînî fesadiya Tacdîn û Memê dike, Mîr aciz dibe, bi Beko re dixeyide ku çima li nik wî fesadiya wan dike û bi van malikên jêrîn pesnê van muhafizên xwe dide:

Mîr go:

"Qe didim eya bedexter Tacdîn û Memê bi textê qeyser? Roja wekû bûye ceng û purxas

Tacdîn û Memê du sed Qizilbaş Bilcumle bi zirx û zend û binper İnan ji me re bi şûr û şesper."

Nexwe li gorî van malikan, şerek di navbera Qizilbaş û leşkerên Mîrê Botan de çebûye û Memo û Tacdîn du sed Qizilbaş tevî zirx, zend û mertalên wan anîne, di destê wan bi xwe de jî şûr û gurz hebûne.

Gelo çend caran Mîrê Botan bi eskerên şah İsmailê Sefewî re (ku ji wan re Qizilbaş di hate gotin) şer kiriye, ew mîrê ku bi wan re şer kiriye kî ye û ev şer di kîjan tarîxê de qewimiye?

Şah İsmailê Sefewî di navbera salên 1501 û 1524'an de şahîti kiriye. Piştî ku şah İsmail di 1508'an de dewleta Aqqoyunliyan hilweşand, Mêrdîn û dorûbera wê kefte destê Sefewiyan. Ustaclû Mehemed Xanê wezîrê şah İsmail di vê tarîxê de hat Mêrdînê û birayê xwe Qerexan rêkir ser Cizîrê. Qerexanî li vê derê herçendî demeke dirêj li hemberî mîrê Cizîrê, Mîr şeref şer kir jî neşiya Cizîrê bi dest xe.

Cizîr piştî mirina Mîr şerêfî di dewra fermanrewatiya kurê wî (li gorî şerefnamê birayê wî) şah Alî de ji alî Sefewiyan hat zeftkirin. Şah İsmail baweriya xwe bi şah Alî neanî, ji dêvla wî birayê Ustaclû Mehemed Xan, Ulaş Begê anî ser fermanrewatiyê.⁵

Şerê din ew şer e ku Emîr Bedirê kurê şah Alî bi rola mezin a Îdrîsê Bedlîsî, tevî mîrên din ên Kurdan li hemberî Sefewiyan şer kir, ji bin destê Sefewiyan rizgar bûn, bi Yavuz Sultan Selîmê Osmanî re li hev kirin. Piştî vê buyerê, Cizîra Botan demeke dirêj di bin siya Împaratoriya Osmanî de wekû hukumetê serbixwe jiya.

Nexwe ku buyera Mem û Zînê di dewra şerê bi Qizilbaşan re be, herî zûtirîn di dema Mîr şerêfê kurê Mîr Bedir de yan jî di dema Mîr Bedirê kurê şah Alî de qewimiye. Ev jî piştî sala 1508'an e.

Em dizanin ku şairê mezin ê Kurd, Melayê Cizîrî jî di şî'reke xwe de bi vî awayî navê Mem û Zînê aniyê:

Mûyekî ji te nadim ez bi du sed Zîn û şêrinan

Çi dibit ger tu hesêb kî me bi Ferhad û Memê?

Li gorî ku tarîx dinivîsin, Melayê Cizîrî sala 1570'an li Cizîrê hatiye dinyayê û di sala 1640'an de miriye⁶. Heke buyera ku Ahmedê Xanî bi xwe dide rast be, nexwe bi texmîni pêncî-şest salan berî jidayikbûna Melayê Cizîrî, buyera Mem û Zînê li Cizîrê qewimiye. Helbet Melayê Cizîrî ev şî'r di 'umrekî mezin (belkî bi kêmasî di sîh-çil saliya xwe)

de hûnandiye. Bi vî awayî di navbera buyera şerên bi Sefewiyan re û hûnandina şî'rê de nêzî qirnekî derbas buye. Jibo hin lêkolîneran, demeke qasî qirnekî, dikare demeke kurt be ku evîneke wekî ya Mem û Zînê bibe evîneke efsanewî û bibe destan, lê di civakeke girtî, ya wê demê ya Kurdewarî de qirnek, bes e ku ji bo buyerek bibe efsane û mezintir bibe. Loma jî ew dema ku Ahmedê Xanî bi xwe dide, ji rastiyê ne dîr e.

Lê ev tarîx, ne li ya 'Elaeddîn Seccadî, ne jî li ya Abdulreşîb Yûsuf dike ku ew behsa tarîxa mirinekê dike ku li ser kêla gorrê nivîsandî ye.

Tiştê balkêş, ne di dema tarîxa Mîr 'Evdalê duduyan ê ku Abdulreşîb Yûsuf behs dike, ne jî di tarîxa 1350'yî de ku 'Elaeddîn Seccadî behs dike (ihtimal dema Mîr 'Evdalê yekem, yan jî ya mîrê berê wî Emîr Bedreddînê kure. Emîr İsa ye) behsa tu şerî nayê kirin.

Lê di dema mîrekî de ku navê wî Mîr Îzeddîn e, şer ligel sultanê Moxoliyan, Timûrlengî derketiye. Şerefnamê bi dirêjayî behsa vî şerî dike. Ev Mîr Îzeddîn (Em ji bir nekî ku navê mîrê ku di Mem û Zînê de behsa wî tê kirin ne Mîr Îzeddîn lê Mîr Zeyneddîn e.) kurê Mîr 'Evdalê yekem e, piştî mirina bavê xwe fermanrewatî xistiye destê xwe û di 1394'an de, 49 salan piştî tarîxa ku 'Elaeddîn Seccadî binav dike li hemberî Timûrleng şer kiriye⁷. Dibe ku di Mem û Zîna Ahmedê Xanî de eskerên Timûrleng û yên şah İsmailê Sefewî bi hev hatibin guherin. Lê divê em bibîr bînin ku ev tarîx dîrî tarîxa ser kêla gorrê ye.

Welhasil, tiştêkî diyar û bi belge di vê meselê de tune ye. Ger ew tesbîta Abdulreşîb Yûsuf a li ser kêla gorrê rast be, heta tu belgeyên din neyên dîtin agahdariya tekûztir ew e, yên din pirtir nêzî spekulasyonan in.

¹ Yûsuf, Abdulreşîb, Huncerî Tabloyên şerefnamê, Wergêr ji zaravê Sorani: Alişer, Weşanên Jîna Nû, Swêd, 1991, r.62-67 û tablo nr: 4

² Secadî, 'Elaeddîn, Mêjûyî Edebî Kurdî, Kitabfiroşî Me'arif, Serdeşt, 1361, r. 201

³ Yûsuf, Abdulreşîb, şairên Klasik ên Kurd, Weşanxana Jîna Nû, Swêd, 1988, r. 103 û rûpelên dewamê.

⁴ e.n.w.d. r: 104

⁵ Yurt Ansiklopedisi, Anadolu Yayincılık A. Ş., Ystanbul, 1982-1983, c. 8 r. 5765, madda Mardin.

⁶ Melayê Cizîrî, Diwan, Wergera Zeynelabidin Kaya û Mehemed Emîr Narozi, Weşanên Roja Nû, Stockholm, 1987, Pêşgotin r. 21

⁷ şerefnamê, şerêf Han, Tercuma M. Emin Bozarslan a bi zimanê Tirkî, Hasat Yayınları, Ystanbul, 1990, r. 141

300 serreya nuştîşê Mem û Zîn û hewnê Ehmedê Xanî

Emserr 300 serreya nuştîşê eserê erjayeyê Ehmedê Xanî Mem û Zîn-o. Bi no munasebet a emserr, xeylê cayan di kombiyayin û konferansî vîrazîyênê û fikrê Ehmedê Xanî yenê munaqeskerdiş. Ze ke yeno zanayîş nuştoto Kurd Mehmet Emîn Bozarslanî çend serrî ra ver mektûbê UNESCO'yê rê riştbi û waştbi ki UNESCO serra 1995'ine bikero serra Ehmedê Xanî. Labelê UNESCO na mesela ser o nêvindert, Kurdî na mesela rê wihêr vijay û emserr her cawo ki Kurdî te de di estê, gorey îmkanandê xwi na mesela munaqese kenê û fikrandê Ehmedê Xanî ser o vîndenê.

Zeke yeno zanayîş, Ehmedê Xanî şairêndê Kurdan o ki serrra 17'ine di ciwiyawo, eserê zey Nûbara Biçûkan, Eqîdeya İmanê û Mem û Zîn nûştê. Ehmedê Xanî 300 serran ra ver Mem û Zîn bêtifaqeya Kurdan ser o û bindestbiyayîşê inan ser o nûsto û waştto ki Kurdî yew bê, padişahêndê inan jî estbo û ê jî wihêrê dewleta xwi bê. O, Mem û Zîn di wina vano:

Ez menda hikmetê Hoday di Kurmanci dewlet da dinya di Senî mendê mehrûm Heme çirê biyê mehkûm?

Eger yewbiyayena ma estbiyayê Piya bikerdê ma inqiyadê (1) Rûm û Er: b û Ecman bi temamey Hemini do ma rê secde bikerdê Tekmil (2) kerdê ma dîn û dewlet Tehsil kerdê (3) ma ilm û hikmet

..... Werzo ma ra jî cihanpenahê (4) Peyda bibo ma rê jî padişahê Şimşêrê hunerdê ma bêro ronayîş Qedrê qelemda ma bêro zanayîş Derdê ma bivîno derman İlmê ma bivîno rewac (5) Wexto ki şair û aliman hemini eserê xwi Erebkî yan jî Fariskî nûştê, Ehmedê Xanî no eserê xwi bi zanayîş a bi ziwandê Kurdî ya nûsto û waştto ki şar bizanoki Kurdî jî wayirê kitabî ye. O wina vano:

Wa şar nêvajo ki "Kurdî Bê marîfetê bê esl û binke ye Heme miletî wayirê kitabî ye Kurmanci tenya bê hesabî ye."

300 serran ra tepiya ewro wexto ki ma ewnenê haldê xwi ra, aseno ki ma hewna caardişê hewnê Ehmedê Xanî ra bol dîrî ye. Ey, verê 300 serran vato çirê ma bê tifaq û bê dewletê, ewro ma hewna jî bê tifaq û bê dewletê. Ey vato çirê Kurdî yewbî-



nan nêgînê, ewro jî ma pê ra ciya-ciya ye û yewbiyayina ma çina. O wext mîreyanê Kurdan miyan di yewbiyayine çinêbî ewro jî partiyandê ma miyan di yewbiyayine çina û ê bol finî lyewbînan di lec kenê. No jî sebebên o ki ma Kurdî heta ewro bê dewlet û bê tifaqê. Mesela Kurdistanê Başûrî di no nezdiyê çehar serrî û nîm o ki firsetê kewto Kurdan dest ki ê bişê ci ra istifade bikerê û no qandê temamê Kurdan bibo hêvîyê. Labelê cawo ki ê parlamento û hukmatê Kurdistanî xurtêrî bikerê û halê miletî rindêrî bikerê, no serr û nîm o ê lecê yewbînan kenê û no îmkano ki esto erzenê talûkî miyan. No parçedê welatê ma di, eger itifaqê Kurdan estbiyayê hewnê Ehmedê Xanî şayê bibiyayê raşt. Hewna jî berey niyo, labelê çiyê ki benê nêverdanê ki merdim hêvî dar bo. Wexto ki 300 serreya nuştîşê Mem û Zîn di ma Kurdan miyan di fikrê Ehmedê Xanî yenê munaqeskerdene, bi hucûmdê PKK vera PDK ya, birînêda bîne gandê Kurdan miyan di abî. Kiştê ra ma vanê çirê Kurdî nêbenê yew, kiştê bîn ra jî Kurdan miyan di tanî qandê ki Kurdî nêbê yew çiyê î dest ra yeno kenê.

Zaf miletê ki 300 serre ra ver haya inan neteweyey ra çinêbî ewro wayirê dewletê, labelê ma Kurdî ki Ehmedê Xanî ye ma estbi ma hewna bê dewletê û ciyakewte ye. Lazim o ki ma Ehmedê Xanî newera biwanê û bixebitiyê ki hewnê ey bikerê raşt.

Notî:

1) inqiyad: riayet, 2) tekmil: temam, 3) tehsil kerdene: 1) xwi dest vîstene, peyda kerdene 2) musayîne, bander biyayîne, 4) cihanpenah: keso ki merdim ci ya bisitirîyo, 5) rewac: itibar

N. Elî

300 serreya "Mem û Zîn" pîroz bo!

Şerha xemê dil bikim fesane
Zînê û Memê bikim behane

شەرحا غەمێ دل بکەم فەسانە
زینێ وو مەمێ بکەم بەهانە

IN CELEBRATION OF THE TRI-CENTENNIAL JUBILEE
OF THE KURDISH NATIONAL EPIC "MAM U ZIN"

بۆ ریزگرتنی سیسەدسالە ی داستانێ نەتەواپەتیی کورد "مەم و زین"

BO PÎROZKIRINA SÊSEDSALIYA DASTANA NETEWYÎ YA KURD "MEM U ZÎN"

